ففي عهد الأيوبيين أي في نهاية القرن الثاني عشر وبداية القرن الثالث عشر تم تسليم منطقتي القصير و





جومه للأسرة المندية والتي استمرت في حكمها حتى القرن السابع عشر. ويقول ابن الشحنة في كتاب (درّ المنتخب) بأنّ قلعة باسوطة قد أصبحت خراباً بدون حماية، وقد تمت بناءها وترميمها ثانية في القرن السادس عشر حيث حكمها الغباريين حتى القرن الثامن عشر وفيما بعد حكمها آل كنج وعمر آغا حتى الربع الأول من القرن التاسع عشر. وقد بقيت آثار القلعة حتى القرن العشرين، لكنّ سكان القرية قاموا باقتلاع أحجار القلعة وبنوا بها بيوتهم.

ويُذكر في التراث الكردي شخص باسم بطال آغا (بطالي بطال) وهو من أسرة كنج قد حكم القلعة وكان نشيطاً وقوياً جداً، حيث خاض العديد من المعارك والحروب الذي قتل غدراً على يد السلطان العثماني في حلب حيث تم دفنه في حيّ سُمي فيما بعد باسمه (آغيول) أي ابن الأغا.

ويتجلى جمال قرية باسوطة في جميع الفصول الأربعة كجنة على الأرض، وكل من يذهب إلى عفرين لا بدّ أن يزور باسوطة التي تعتبر مكاناً للاصطياف والرحلات الترفيهية، حيث توجد فيها أربع مطاعم أقيمت على ضفاف النبع والتي زُيّنت بالورود والأشجار الجميلة لذا يقصدها الزوار من جميع الأصقاع لقضاء عطلتهم.

كما وتقع قلعة سمعان قرب باسوطة من جهة الشمال، لذا فالزّوار الذين يزورون قلعة سمعان يمضون بقية يومهم في مقاصف باسوطة للاستمتاع بجمال الطبيعة والجوّ اللطيف.

على عكس معظم قرى عفرين فإنّ قرية باسوطة لا تشتهر بأشجار الزيتون بل هي مشهورة بأشجار الفاكهة مثل المشمش والتفاح والخوخ واللوز، كما أنّها مشهورة برمانها التي تعتبر من أفضل أنواع الرّمان، حيث فيها حوالي عشرون ألف شجرة رمّان من كلا النوعين الحامض والحلو.

يعمل سكان باسوطة في جميع الفصول دون توقف في زراعة وجني المحاصيل، لأنها كما قلنا آنفاً غنية جداً بزراعة مختلف الأشجار.

لوحة أنتِ يا حبيبتي

أيتها الموغلة في شرايين الجسد، لم يعد في الجسد مدى للفرح والسكون، ومرآة ليلكِ أفضت إلى جمود، وشموع قصركِ العتيق آوت إلى خمود وانكسار.



جمعة الحيدر

في ليل أرخى على الكون سدوله، وجرّ على الدنيا سكونه، واختفى نجم كان يتلألأ في سماء البهجة، ليل تداعت فيه أشباح الماضي، سحبتُ كل أوراق عمري، وتناولت ورقة يومي، ونثرتُ على رسمها من مآسي الجراح كل الحروف فتطايرتْ من وهج الذكريات لأتناثر أشلاءً ممزقة في كل الأصداء، موجوع يتحامل قلمي على جمعها في كلمات، ثم تأبى الكلمات أن تُعبّر عما ينوء به الفؤاد من ألم ومعاناة ووجد ليسقط جريحاً ينزف دماً أزرقاً، كان جرحاً عميقاً أعمق من همس الوداع.

فتذكرتُ حثيث قدميك وأنت تطئين بها سكة العمر الفاني يقودها عكاز خبيث على أمل مزروع في السراب ... قدماك التي حملت ذلك الجسد البالي من رحلة العذاب العتيقة والألم المر.

في غرفتك الصغيرة، دخلت لأرى بسماتك المفعمة بحسرات الزمن منقوشة على صفحات أيامك الفانية، ولآلئ ثغرك مرصوصة على جدران الليالي .... تلك الليالي التي غنت لكل الدنيا لحن الحنان، وأنا أسعد بالمثول بين يديك أرتشف للثمالة حباً حتى العطش.

وعلى سريرك المسكون بكل عذابات ذلك الزمان النشيج، عرفت أن المرض قدر الله، وأن الله واحد أحد، وأن ذلك الجسد الذي أرهقته المسافات وأدمته أشواك الطريق عائد إلى موات ... عائد إلى موات ... تخامرني أنين آلامكِ صاخباً في دجى الليل متجاوزاً كل الآفاق الهادئة المستكينة ويبددني وجع غامر أنأى به عن كل البشر، مستسلماً لصمت رهيب أعزف عليه لحن الوداع.

لوحة أنتِ – يا حبيبتي– ارتسمت أمام ناظري، نقشتها يد رسام لا يعرف للفن أصولاً، اختلط دمع العين بمداد الرسم، ثم انحدر إلى صدى الأيام الغابرة، فتحولت إلى لوحة بالية عفتها رياح الزمن، وظللتها

شمس السنين وزخات المطر، ثم تتوق نفسي المتعبة – من جديد – إلى رؤية ذلك الصفا الجاثم أمام بيتنا وتلك الشجرة المعطرة بغرس يديك فارتطم نظري على آثار أقدامك على الصفا وشويهاتك تدور حولك.

بإصرار لذيذ ترتدين نفس العباءة السوداء، لأدرك كلمات عذبة تورق على صفحات الوجود، وأنت تجولين بين أغصان العنب والرمّان ناسجة من أوراقها عَبَراتٍ أوهن من نسج العنكبوت.

أعود يا – حبيبتي – لأبحث عن هزيع من الليل لم يجمعنا فيه اغتراب ودهشة فلا أجد، ومن الهزيع إلى الهزيع، إلى انبلاج فجر الصباح أنتِ ... أنتِ ولا أحد.

استدار عليكِ الزمن بدأ يطوى صفحات عمرك ولف أيامكِ في كف السنين ليستأذن الركب في الرحيل إلى عالم برزخي لانتظار الفزع الأكبر، لنصبح بين عشية وضحاها – يا حبيبي– وحتى ذلك اليوم الوعد. وسنظل ندور في دوامة الحياة ولا نستقر، نفتش عن بقايا إنسان وعن رفات حب، وعندما نفيق من تداعيات الشقاء واقعاً نحياه، نتجرعه بألم وحسرة.

أيتها الموغلة في شرايين الجسد، لم يعد في الجسد مدى للفرح والسكون، ومرآة ليلكِ أفضت إلى جمود، وشموع قصركِ العتيق آوت إلى خمود وانكسار، وليعم الكون صمت رهيب أكثر رهبة من المرض العضال ... من الموت ... ومن الفقد.

وفي غمرة الخيال الموجع تنساب إلى أنفي رائحة الريحان المغروس بيديك الطاهرتين، كم تمنيت لك الشفاء، ولكن ... رحمة ربي تتسع لكل شيء.



Irfan Hemdî - عرفان حمدي

Fedîla Ettî - فضيلة عطي

Roşan Alxalid - روشان الخالد

Welîd Mûrad – وليد مراد

dikin. Can ji madîyetê girîngtir e‹ ji ber ku di can de gelek xalên bedew weke: wijdan‹ hezkirin‹ hest‹ êş‹ hêvî û h.w.d. hene.

Xweşikahîya însan: Însan dema ku hezkirin hebe‹ dikare hez bike‹ dema ku hêvî hebe dikare hêvî bike‹ dema ku bawerî hebe dikare bi bawermend be‹ dema ku wekhevî hebe dikare wekhev be‹ dema ku vîn hebe dikare vîndar be û dema ku azadî hebe dikare bi azadî bijî‹ çima na? An jî çima nikare? Na ger bihizire dikare belê dikare‹ dê wê demê jîyan hebe! Bi taybet hezkirina însan wek ku serokatî dibêje: Heqîqet eşq e‹ eşq jî jîyana "Azad e" însan dema ku vê hevokê şirove bike‹ birastî jî jîyan bê eşq nabe‹ lê eşqeke çawa? Eşq ne tenê ew e ku keçek û xortek ji hev û din hez bikin‹ belê ev jî ne eşqeke kêm e. Dema ku di gavavêtina mirov de eşq tune be mirov di wê gavavêtina xwe de bi ser nakeve‹ tevî ku bigihêje dawîyê dê dîsa wekî gulên çilmisî bimîne. Eşqa rast ew jîyana rast e‹ ew jîyana ku dihêle rast însan jiyane û xweşikahîya jîyanê ye. An jî di vir de canê însan derdikeve holê û dide peyîtandin ku însan bê can nabe û can bê eşq nabe û eşq jî bê hêvî çilmisî dimîne. Birastî jî hestên însan pir cuda ne dema ku însan dibe aşiq bi tu tiştekî vala‹ qirêj û ne baş de nahizire‹ tenê di rêka heqîqeta eşqa xwe de dimeşe. Însan kar dike‹ ê ku pergalbûn di gerdûnê de da avakir însan bi xwe ye‹ gerdûn di bin destê însan de biwate bû‹ wateyîbûna jîyanê wateyîbûna însan e. Ê ku zanist pêş xistî însan e û ê ku li heqîqeta pirsa: Ez kî me? Ev gerdûn ji ku hatîye? Em çawa wisa jîyan dikin û ê ku gotî xweda heye û xweda yek e ew jî însan e!! Hêvîya însan mezin e‹ gerdûn li ser hêvîya însan rawestîyaye‹ însan hebûn e û hebûn bi xwe jî însan e ji ber ku însan bi xwe hebûna xwe di nava xwezayê de da îfadekirin û bi hêvîyê li ser lingan da seknandin. Meyzekin em mirovahî çiqas xweşik in‹ di hundirê me de hêzek‹ hêvîyek û eşqek bê hempa heye.

Nebaşîya însan: Însan bixwe xwe qirêj dike‹ gelek însan hene wateyê nadin xwezaya jiyanê‹ dixwazin her tişt tenê yê wan be‹ ji desthilatdarîyê hez dikin‹ ji ezezîtîyê hez dikin‹ hewl didin ku cewherê jîyanê berovajî bikin û dixwazin tiştekî ku navê xwe can‹ eşq an jî hêvî li ser rûyê gerdûnê nehêlin. Bi taybet jî dixwazin navê însan binpê bikin û însan bikin robot‹ ji bo ku mirovahîyê bixapînin dibêjin mirov ne xwezayî ye mirov derveyî xwezayê ye. Her awayê qirêjbûnê dimeşînin tenê ji bo vîna însan lawaz û tune bikin‹ ew însanên bê eşq in û ji azadîya bedew nefret dikin. Lê belê jîyan însanên qirêj û nexweşik naxwaze‹ vê yekê ji wan hêvî nake. Însanên ku dixwazin can‹ xwezayê‹ jîyanê‹ hezkirinê înkar bikin û dixwazin tenê bikin madîyet‹ ew însan ger ku bihizirin li dijberî wateya jîyana xwe derdikevin. Di nîyeta van însanan de tenê xerabûn‹ xwarin‹ vexwarin‹ kuştin û ferman heye.Rast e em di her hevokê de dubare dikin însan ‹lê belê însanên ne baş û xerabker. Însan sedam gengeşeya însan e.

Ji bo vê ez ji însan re dibêjim: Belê însan tu baş î‹ xweşik î‹ dirust î‹ azad î‹ wekhev î‹ vîndar î‹ bawermend î‹ jîyan î û her tim hêvîdar î ji rêka heqîqeta xwe dernekeve‹ xweşikbûyîna jîyanê biparêze ji ber ku tu jîyan û heqîqet bixwe

Serbest

Însan!!

Însanên ku dixwazin can، xwezayê، jîyanê، hezkirinê înkar bikin û dixwazin tenê bikin madîyet، ew însan ger ku bihizirin li dijberî wateya jîyana xwe derdikevin.

Fatma Sîdo

Gelo însan xweşikbûna jîyanê ye‹ yan jîyan xweşikbûna însan e?!

Însan zindîyê herî bihêz e di nava xwezayê de‹ rast e felsefe dibêje ku zindîyê herî lawaz yê li ser rûyê gerdûnê însan e‹ erê rast e di alîyê fîzîkî de însan dikare wisa bêje. Lê belê birastî jî dema ku însan di mejîyê xwe de analîz bike‹ ewqas lêkolîn bike û vê hevokê di alîyê mejî‹ hest‹ êşkişandin‹ rakirina barê giran û erkên giran ên li ser milê Însan‹ mirov dikare bibêje ku: Zindîyê herî bihêz yê li ser rûyê gerdûnê Mirov e. Rêka mirov pir cûda ye‹ di mirov de gelek tiştên baş û gelek tiştên ne baş hene‹ rêveberîya can‹ mejî û dil e‹ yanî mirov hem dikare bi xweşikahîya ku ji xwezayê wergirtî bihizire û hem jî dikare wê xwezayê qirêj bike. Weku dibêjin mirov di xwezaya xwe de paqij û dirust e‹ lê bi demê re ew xwe didin guhertin. Ji bo vê yekê çima gelek mirov bi nîyetên nepaqij dihizirin? Bedewbûna jîyanê reş dikin bi qirêjbûna xwe xweşikahîya mirovên paqij jî bi xwe re dikin tarîtîyê. Bi rastî jî dema ku peyva însan tê gotin hestekî cuda xwe li hêvî û xwezaya dinyayê dipêçe. Ji ber ku zindîyê li ser rûyê gerdûna me‹zindîyê ku herî zêde xwe li ser lingan girtî û karibû mejî û hestên dilê xwe nasbike û bi kar bîne însan e! Însan jiyan naskir‹ hestên şad û hestên xemgînîyê hîs kirin‹ bi vî rengî ji hev û du hezkirin‹ bawerî‹ girêdan‹ alîkarî‹ azadî‹ wekhevî‹ demoqratî û her tiştên ku jîyana mirov ronî dike. Însan bi hîskirina xwe ya dirust ev tiştên jîyanî ava kirin û herî zêde hîskirina dayîka xwedawend. Canê însan canekî ku mirov nikare înkar bike û bêje ku însan mîna robotan e‹ ev yek canê însan di nava xwe de dihelîne. Niha gelek feylesof hene can înkar dikin û her tiştî girêdayî madîyetê dibînin‹ lê belê‹ di vir de em nikarin madîyetê jî înkar bikin‹ lê em dikarin bibêjin ku hev û du temam

wan li mizgeftan bûn. Wan dixweşt malên xwedê bi rehên gemarî di sibeha cejnê de gemarî bikin û wan jî dixweşt bi guliyên xwe pîrozbahî û paqijîya malên xwedê biparêzin û paqij bihêlin. Wan dixweşt bi hovîtiya xwe di roja cejnê de dengê zengilên aşîtiyê vemrînin‹ lê wan jî dixweşt bi guliyên xwe aşîtiya roja cejnê biparêzin.

Dema ku jiyan radiweşte‹ dema ku aştî namîne‹ dema ku mirin‹ hovîtî‹ kuştin‹ wêrankirin‹ ezman hejandin wê demê tenê ji xwînê jiyan vedijî‹ ji mirinê jiyan peyda dibû‹ ji hovîtîyê aştî çêdibû‹ ji kuştinê aramîya ku mirovahî lê digere diçûrisî‹ ji wêranbûnê xewnên zarokan pêk dihatin û ji ezmanên bi dûman berfa azadîyê dibarîya.

Di nav kêlîyên serdema hevxwarinê de ew hebûn‹ ji gulîyên xwe jiyan dûhûnandin‹ ji dengê xwe bihar dikirin bihar û kulîk bi bêhin dikirin û ken ji zarokan re ji dengê tivinga xwe dikirin awaz lê ew şehîd diketin ...

Her tişt xweşik dibû lê ew bê gor diman ...

Îro jî Kurd bi wan nas dibin û bi wan bi nasname dibin ...

Lê dîsa jî tenê ew in û ew jî şervanên YPJ'ê ne...

Li Kobanê guliyên berxwedêr bi rengê azadiyê xemilandin û azadî kirin peyama xwe ya peyamberîyê‹ erka pêxemberan ji wan girtin û bûn pêxemberên azadîyê. Peyama xwe li Kobanê deşt bi belavkirinê kirin û ranweştîyan‹ ala azadî û serkeftinê radeştî hev dikirin û nedihiştin ew al bikeve. Bûn Viyan û bi çek û pênûsê dîrok nivîsandin‹ bûn Arîn û bi bedena xwe hovîtîya mirovahîyê kedî kirin‹ bûn Barîn û bi termê xwe‹ rûyê cîhanê yê kor bi çavkirin‹ bûn azadî û li Qada Nehîm a ku peytexta serjêkirinê bû‹ govenda azadîyê gerandin. Ji Kobanê deşt pê kirin û ranweştiyan‹ lê belê pir weştîyan‹ pir êşiyan‹ pir berxwedan‹ pir gulî li ser hev hûnandin‹ lê ranweştîyan soza peyama ku hilgirtî bi cih anî‹ bûn sozdar‹ bûn dozdar‹ bûn azadvan‹ bûn rizgarvan‹ deştmala li serê xwekirin sembola aşîtîyê ku kîjan jina kole‹ kîjan jina bindeşt‹ kîjan jina dîl ku cîhan li wan teng dibû xwe li wê deştmalê digirtin.

Li Baxozê hovên ku rojekê dixwestin wek keftaran termên wan bixwin‹ ew wan derman dikin‹ xwarinê didin wan ku ji birçîbûnê nemirin‹ zarokên ku ji tovên wan hovan hatine dinyayê hemêz dikin û didin ber kezeba xwe ya tev dilovanî‹ ew in şervanên YPJ'ê yên ku ji mirovahîyê re peyama aşîtîyê ya ku hatî windakirin dîtin û li ser vê axê belav kirin‹ ew in şervanên YPJ'ê yên ku ji Kurdan re bûn nasnameya kurdîbûnê‹ kurdîbûna ku her aştîxwaz bû û her ji bo aştîyê bûn qurbana deşthilat û diktetoran.

Ji Kobanê deşt pê kirin‹ li Reqayê govenda azadîyê gerandin û li Dêra zorê mirovahî ji hovîtîyê rizgar kirin û li Baxozê‹ belê li Baxozê dîroka nû ya ku bi guliyên berxwedêr serê hovan tewandî nivîsandin.

Ew kî ne?

Ew şervanên YPJ'ê ne.....

EW KÎ NE?

Li Kobanê guliyên berxwedêr bi rengê azadiyê xemilandin û azadî kirin peyama xwe ya peyamberîyê, erka pêxemberan ji wan girtin û bûn pêxemberên azadîyê.

Ednan Hesen

Li welatê êgir‹li cihê jidayîkbûna rojê û ji agirê ku şewata gund û sînemayan kirin cêwî‹ ji agirê ku sêdara çarçira bi çavên Helbçaya bê hêsir re kirin yek û ew tevahî li welatê êgir kirin mêvan. Dîrokeke nû pişkivî‹ bihareke nû di nav zivistana sedsala hovîtî û tarîtiyê de şîn bû û li hember şînatiya mirovahiyê ya ku windabûyî hem reng da hem jî deng da.

Li wir axaftin‹ gotin‹ hest û rewanbêjî nema û ne jî keskî dikarîbû yek ji van bigota‹ ne ji ber ku kes tune bû yan tiştê ku dibû‹ ne şayanî wê yekê bû lêêê!!!

Li wir xweda‹ xwedawend‹ pêxember û pirtûkên pîroz tev de rexnedayîna xwe didan‹ li wir dengê wijdana xwedan tune bû tenê ew hebûn‹ li wir lavên(dua) xwedawendan tune bûn tenê ew hebûn‹ li wir peyamên pêxemberan tune bûn tenê ew hebûn û li wir destûrên pirtûkên pîroz jî nebûn dîsa tenê ew hebûn.

Li wir qiyamet bû‹ li wir mirovahî dihate cezakirin li ser hovîtiya xwe‹ li wir rastiya dîroka xapînok aşkere dibû lê kes ji bilî wan tune bû‹ tu dibêjî qey tenê:

ew xwedan in
ew xwedawend in
ew pêxember in

Loma jî tenê wan rûpelên dîrokê yên qirêj yek bi yek bi guliyan diçirandin‹ tenê wan hesab ji xwedan dixwest ji ber ku xweda bê rû mabû li hember tiştê ku dibû‹ qiyamet bû‹ tofan bû‹ ji dengê ku dihat her tişt lal bû‹ kerr bû bê çav bû kes tune bû‹ tenê ew hebûn.

Ew der KOBANÊ bû‹ şeva cejnê bû bi hemî hovîtiya xwe rih gemaran êrîş dikir‹ bi hemî çekên xwe berê

û xortên gund mamostetî di dibistana gund de kirin û zimanê kurdî xistin dibistanê.

Her wiha hinek xwendekarên gund li peymangeh û zanîngehan dixwendin‹ lê belê ji ber alozîya Sûriyê xwendina xwe berdewam nekirin.

Çandinîya vî gundî avî ye‹ ku ji avê bîrên Irtîwazî yên li deşta başûr û rojava ne‹ tên avdan.

Çandinîya avî jî mîna: Pembo‹ Kuncî‹ Şewender‹ garis û baxçeyên sebze ne.

Her wiha çandinîya bejî jî li gund tê dîtin wek Genim‹ ceh‹ nok û kemûnê. Vê dawîyê çandinîya darên zeytûnê jî lê belav bû ye.

Di navîna gund re gelîyekî mezin heye. Dibêjin di kevn de lehî rabû û hinek kes û sewal tê de fetisîn.

Şênîyên gund debara jiyan xwe li ser xwedîkirina sewalan û bi taybet mih û bizinan û çandiniyê dikin.

li ser dîwarên şkeftên vî gundî hene.

Di gund de 5 şkeft hene û li başûr rojhilatê gund dikevin.

Ew şkeft xwedî dirûveke endezeyî ne ku ji alîyê form û teşeyên wê ve dişibin avahîyên nîştecihîyê ango şiqeyên avahiyan.

Yek ji wan şkeftan sê ode û salonek heye. Ji ber kevnarîya wan pêwîtî bi şandeyên şûnwarnasîyê hene heta ku emrê wan were diyarkirin.

Serokê eşîreya Kîtkan an jî Besrawî‹ xwedîyê gundên derdora wî bû. Ji ber vê yekê li gundê demekê nişte cih bû.

Koka Şênîyên gund vedigere eşîreya Kîtkan. Ew eşîre bi wêrekî û mêrxasîya xwe dihat naskirin.

Gundê bîr-reş ji alîyê hunerê ve balkêş e. Êdî di her malbatekê de hunermend an jî helbeştvan û muzîkvanek heye.

Ji ber hebûna kesayetên hunerwer di gund de gelek komên hunerî hene wek koma Botan‹ Cegerxwîn û Yekîtî...

Ji nava huner û hunermendên gund du nav di warê hunerê de vebiriqîn ew jî bi navên Perîşanî kurd û Ismaîl Sadiq tên naskirin.

Gelek kasîtên wan ên stranbêjîyê hene. Lê zêde ku zêdetirî 100 kesî gund çi keç dibin û çi jî xort dibin dikarin bistrên‹ muzîknas in û danser in.

Beriya alozîya Sûriyê piranîya şênîyên gund koçberî Heleb û Minbicê bûn û li wir bi rengekî domdar bi cî bûn. Di karê bazirganîyê de xebitîn û bi taybet li Minbicê. Li Minbicê xaneyên wan ên bazirganîya madeyên çandiniyê bi hejmareke baş hebûn.

Her wiha li Helebê xwedîyê kargehên çêkirina madeyên avahîgirtinê wek Blok bûn.

Ji sala 1998'an ve li gund dibistaneke seretayî heye. Zarokên gund xwendina xwe li wê dibistanê dikin.

Di demên dawîn de hejmarek ji keç

Gundê Bîr-Reş



Şerîf Mihemed– Welîd Bekir

Koka vî gundî vedigere dîrokeke demdirêj ku hê şopên nişteciheˆn pêşîn li ser dîwarên şkeftên vî gundî hene.

Gundê Bîr-reş an jî Bîra Reş li Başûrê Kobanê bi 27 KM dikeve. Ew yek ji gundên kevnar ên Kobanê ye.

Şênîyên gund ji aliyê welatparêzîyê ve jî xwedî ked û nêrîn in. Di nava alozîya heyî de‹ hejmarek ji keç û xortên vî gundî tevlî nava refên YPG'ê bûn.

Li bakurê gund çiyayê Bîr-reş heye. Li bakur û rojhilatê gundê Kofî‹ li rojhilat Îtiwîran û li başûr jî kelheya Reş‹ li rojava mezreya Bîr-reş û gundê Xilomer heye.

Erdnîgarîya wê ji bakur ve çiyayî ye‹ ji başûr û rojava ve deştî ye.

Navê gund ji du gotinan pêk tê‹ Bîr û reş.

Pêşîyên gund berê dema ku xwestin li gund bi cî bibin‹ pêwîstîya wan hem wek şênî û hem jî ji bo sewalên xwe bi avê çêbû. Ji ber vê yekê şênîyên gund dest bi kolandina bîreke avê kirin.

Êdî di encama kolana bîrê de‹ kevirên reş derketin. Piştî ku kolana bîrê bi dawî bû‹ du kevirên reş ên mezin danîn her du kêlekên bîrê da ku çirixa bîrê çêkin.

Her wiha du Êmlig an jî afir danîn kêleka bîrê ji bo avdana sewalan.

Lê belê heta navê vê bîrê jî ji siyaseta erebkirina herêmê nema‹ êdî navê wê kirin Tarş‹ wateya wê jî bi kurdî pez e.

Her wiha Mezreyeke bi navê Bîr-reş li rojavayê gund heye. Hejmara malên wê 20'an derbas nake.

Şênîyên wê jî bi xwe ji gundê bîr-reş in. Ev mezre bi navê gundê Reşik tê naskirin‹ ew jî bi plana erebkirinê xilas nebû.

Koka vî gundî vedigere dîrokeke demdirêj ku hê şopên nişteciheˆn pêşîn

vedixwînin malên xwe ji bo xwarin û vexwarinê‹ û gelek pirsyaran jê dikin‹ jinên wan dibêjin law swerin vaye mêvanekî me ji welêt hatîye‹ çi şêrîn û ezîze bêhna welat jê tê‹ û pê re gelogirî dibe bi dilekî kovan û hisret û sed çîrok di çavên wan de tên xwendin‹ ew bi xwe xelkê welêt e‹ heger mirovekî Kurd ji dûrecîkî li daweteke wan dîyar dibe‹ keç û jinên xwe dikin destê wî û wî pîroz dibînin.

Cara diduyan ez çûm wê deverê di sala 1982'an de bû‹ hinek guhertin ketibû jîyana wan de‹ encama çûn û hatinê û derketina wan a bajarên Kurdî di şahî û dawetên wan de sazbend û hunermendên Kurdan tînin‹ lê hîn jî keçên wan bi girêdana Kurdî ne‹ ne sedî sed‹ yek kit ji wna bûne endamên partîyên siyasî yên tevgera azadîxwazîya Kurdî û ragihandina tîtbarî‹ kêm zêde‹ kêr û bandor li wan kirîye û wan û xelkên welêt jin dane hev‹ çûne û hatin di navbera wan de çêbûye‹ hin malên wan hatine bajaran weke Til temer û Hesekê. Hêjayî gotinê ye‹ hemî zevîdar xwedî ax û av in‹ xwendin jî ketîye nava wan de‹ niha piranîya wan bîr kolane û ew kerebej hemî kirine darên fêkî û şînkayî‹ ceh‹ genim‹ pembo‹ mixtî‹ bistan û mêwên tirî. Yanî xwestine ku xweşî û şînaya welatê xwe yê bav û kalan bi xwe re bînin û di nav de bimirin‹ lê vê carê di sala 2006'an de bû.

Lê hîn çêtir û xweştir e‹ heger Kurdên welêt yên zane‹ rewşenbîr‹ civaknas û sîyastmedar xwe bera nav wan din û seran ji wan nebirin‹ ji bo wan pirtir bi doza wan re girêbidin‹ ji wan re pirtûk‹ kovar û rojnameyên Kurdî bibin‹ her wiha civakên Kurdî lidarbixin‹ da ku rêya xwendin û nivîsadina zimanê xwe bi awayekî nivîsandî û zanistî bistînin û di nava wan de kar û xebata miletperwerî û welatparêzîyê bê kirin‹ ji bo şêranîya welat‹ milet‹ dîrok‹ folklor û gelepûrên wan bibe du qat di rih û damarên wan de.

Gotina herî şêrîn û rewan ya di bîra min maye‹ çaxê digtin: (lawo werin vaye mêvanekî me ji welêt hatîye). Ez jî dibêjim û vê gotara xwe pê bi dawî dikim; hûn her hebin û bijîn Kurdên winda yî û qayim di wê devera windayî û jibîrkirî de û hemî Kurdên nedilsoz û nezikşewtên ziman û doza miletê xwe bin‹ bi gorî we û resenîya we bibin‹ Kurdîya bê ziman‹ doz û bê nasnemeya netewî heger di kanga welêt de be jî pûç‹ vala û bê buha û rûmet e.

Serbest

gundê Imero‹ Refref‹ Alika‹ Sîha rojhilat‹ Sîha rojava‹ Hisênî‹ Til himam‹ Medînê‹ Mestûra‹ Babxêr û Umilmesamî.

Tiştê xweş û herî balkêş ew e‹ ku heyanî vêga bi zimanê xwe yê Kurdî ve girêdayî ne û kunc û bergên wan yê Kurdîya resen in‹ ku li welatê xwe yê berê li xwe dikirin‹ tevî ku sal û zeman di ser wan re borîne‹ lê wan û Ereban yek kitan jin dane hev û kirîvantî di nav wan de pir hindik çêbûye‹ cara pêşî di sala 1972'an de ez çûm wê deverê û di rêya rasthatinê re ez li şahî û govendeke wan hazir bûm‹ sazbendê wan bilûrvanekî Ereb bû‹ geh bi Kurdî û geh bi Erebî lê dixst û dîlanvanên Kurdî bi herdu celeban dawet û govend digerandin. Min dêhn û bala xwe da rabûn û rûniştina wan‹ kunc û bergên wan ‹ tij û berên hundirê malê wan‹ destek û alavên wan yên kar hemû Kurdî bûn û bêhna ruhê Kurdînîyê jê difûrîya. Kalemêrên û zilamên wan ên naveser hemû bi desmal‹ yelek û derbîyên hîzar yên fireh û qemçekirî bûn‹ xencerên bi cewher di ber hinekan ji wan de bûn‹ tîoeke Kurdî rasteqîn‹ silîvanî û kesrewanî bûn‹ bi xeftanên qedîfe‹ kolmisrî‹ hayasê zîvîn û kiladyî bûn. Bi cotê hrbîyên mûslî û qews û qezeh bûn‹ bi gumgum mîtanê surmekirî bûn‹ bi qolê zêran û bîyandûr û şehik û maşellebûn malên wan hemî bi ber‹ xaliç û mehfûrên rengîn ên dezgehên Kurdî bûn‹ dîwarên wan hemî perdeyên hîzarên neqişandî bûn‹ qewlik‹ hemayîl û gulkên rîsê rengîn pê ve hatibûn berdan‹ kil û kiladn û kilçîvên darî bi qewlik û codelîkan ve bûn‹ zîn û gem û xurcezîn di gel zêrbend û zengû û sergoşan dihatin dîtin‹ li hewş û hudiran misînên sifir‹ legan‹ dîzik û teyfikên çingo hebûn. Destar‹ navkil‹ meşk‹ mîkut‹ melhebên darî di gel das û bivir û hesan û hestan hebûn. Hesk û elbên darî‹ satila bêrîyê ya şîr û kûn jî hebûn. Mexmer û merkebên ji darxos û bîyekê li her malê hebûn. Cencere ‹ haletên cot û cotkarîyê li pêh navê bûn. Zarokên wan ên biçûk di dergûşên darî de bûn‹ bi kulihê rotyayê şîn‹ kespik û çavşînk bûn. Heyanî niha bi Kurdî dipeyîvin û Kurdîyeke wisa paqij û zelal weke ava kanîyên Kurdistanê heger bi hukime carekê yek ji herêmên Qamişlo‹ Dirbêsîyê‹ Amûdê yan Hesekê here mêvanî wan yan jî bi rêwîtî di wir re derbas be‹ hemî lê dicivin û rûmetê gelekî didinê‹ hemî wî

Miletê xwe binase

Tiştê xweş û herî balkêş ew e‹ ku heyanî vêga bi zimanê xwe yê Kurdî ve girêdayî ne û kunc û bergên wan yê Kurdîya resen in.



Salihê Heydo

Li başûr‹ rojavayê Hesekê bi mezîl û dûrahiya sih û pênc KM'an û bi taybetî di nava bera çemê Xabûr û çiyayê Ebdilezîzê Gêlanî (çiyayê Kizwanan) de‹ çend gundên Kurdan yên jibîrkirî hene‹ ew gund ne pir mezin û belawela ne‹ di mezîl û dirêjbûna pazdeh heta bîst û pênc KM'an de‹ a kincî û cihên derhola wan gundan hemî bi êl û eşîretên Erebî dorpêç in‹ weke Begaran‹ Bû Hemdan‹ Bû Miîş û Bû Şêxane‹ yanî hindikyayek ji Kurdên ji milet û welatê xwe birbûne û raqetîyane di nava pirranî û gêreke Erebî pir fireh û bê pîvan de dijîn. Ev Kurdane ji koka xwe de ji herêmên Amûdê‹ Dirbêsîyê‹ Qamişlo û serxetê hatine. Di despêka sedsala bîstan û heya nîveka wê li wî cihî hêwirîne‹ sedemên wê raqetandin û penaberîyê li gor min pirsî ji sê xalan e:

Xalek jê ew e: Ku kuştin‹ neyarî û dijberî ketîye navbera wan‹ xizim û mirovên wan di êl û eşîrtî de‹ev yeke Jî ji bextreşîya me ye.

Xala dudîyan: Dema Kurdan jîyana koçerî û revendîyê dikirin dihatin berîya çîyayê Ebdilezîzê‹ xwe li wî cihê fireh û bê pîvan digirtin‹ pez û dewar xwedî dikirin‹ çêre û zevî ji wan re vekirî bû. Ji lewre zevî û erd girtin û gundên xwe ava kirin‹ piştî konvegirtinê.

Xala sisyan: Hinek ji wan Kurdan ji ber muhacirîya sala 1916'an ji destê eskerê ûrûs û zilm û zorîya hikûmeta Tirkên Kemalî‹ piştî şoreşa Şêx Se'îd mişext bûne û xwe li wê deverê girtine.

Ev Kurdana ji van çend eşîran pêk tên:

Millan‹ Kîkan‹ Deqorî‹ Alikinan‹ Baravan‹ Gabaran‹ Omerî‹ Mêrsînî‹ Mûsilîyan‹ Gergeryan‹ Hekarî û Reşkotan.

Gund û zomên wan ev in: Yên ku di wê herêma teng û dorpêçkirî de bi gêra Erebî ya bê hejmar: Umhicera‹

Serbest

Lê ya Mîr Celadet Bedirxan bi serketin belav bû‹ zimanê Kurdî bi herdu şêwezaran‹ pê hat nivîsandin û kovara wî Hawar ne tenê li Şamê dihat belav kirin‹ lê belê di nav Kurdên Cizîrê‹ Efrînê‹ Libnanê‹ Zaxo‹ Duhok‹ Hewlêr‹ Rewanê‹ Karmanşahê û heta bi Mûsil û Bexdayê jî belav dibû. Her wiha bi helbeşt û nivîsên van kesan dihat xemilandin: Dr. Kamîran Bedirxan‹ Cegerxwîn‹ Osman Sebrî‹ Mustefa Ehmed Botî‹ Nûreddîn Zaza‹ Lawê Findî‹ Hesen Hişyar‹ Rewşen Bedirxan‹ Reşîdê Kurd‹ Qedrî Can‹ Ehmed Namî û Qedrî Cemîl Paşa.. Ji Kurdistana Başûr jî van nivîskarên bi nav û deng di Hawarê de dinivîsandin: Fayiq Bêkes‹ Goran‹ Tewfîq Wehbî‹ Şakir Fettah‹ Hevindê Sorî‹ Abdulxaliq Esîrî‹ Pêrût‹ Lawikê Kurd...û hwd. Hin kurdenasên biyanî jî hebûn wek: Pr.G. Michaelian û R. Lescot.

Çima Hawar e û ne Hewar e? Rast e di nav civaka me de gotina (Hewar)‹ tê bikaranîn. Lê dema ku ev peyv ji ber zilm û zorê tê der‹ mirov dike haaawaar Haaawaar.. Hawar dike.. Hingî‹ Mîr Celadet Bedirxan ji ber têkçûna serhildana Şêx Seîd û Araratê‹ cehalet û nezaniya gelê xwe û rûniştna bi zorê li Şamê‹ dikir Haaawaar Haawar.. Hawar hawara wî ji kezebê bû.. Bi hawarbûn li şiyarbûna kurdan digeriya.. Ji ber wê hawar hawarê navê kovara xwe kir HAWAR..

Fermo van gotinên nivîskar û lêkolîner jêhatî Rohat Alakom bixwînin û bê çawa Tirkiyê bi biryara Heyeta Koma Wezîran piştî du heftan bi serektiya Ataturk kovara Hawarê qedexe kiriye. Birêz Rohat Alakom dibêje: (.. Em bi weşandina vê dokumenta jêrîn vî zimanzan‹ nivîskar û ronakbîrê kurd bi rêzdarîke mezin careke din li vir bi bîr tînin. Çawa di vê dokumentê de jî xuya dibe di sala 1932'an de belavkirin û ketina kovara Hawarê a Tirkiyê bi biryara Heyeta Koma Wezîran bi serektiya Ataturk hatiye qedexe kirin. Lê belê Hawar‹ ev çavkaniya giranbiha ku wek ansîklopedîya kurdî hatiye hesibîn‹ ji mêj ve ketiye nav dîroka çanda kurdî û bi dirêjahiya salan bûye sertaca ziman û edebîyata kurdî. Kovara Hawar‹ di 15'ê Gulana 1932'an de derketiye û du heftan şunda bi bayê birûskê‹ bi lez û bez roja 30'ê Gulanê 1932'an belavkirina wê li Tirkiyê hatiye qedexe kirin..). Ev nivîs û dokument ji mamoste Rohat Alakom ve hatine girtin.

Sebaretî navê Elî û Alî; di heyamê Sultanetiya Abdulmemêdê diduwan de‹ wek model‹ kesayetiyên mezin û naskirî‹ navek li navê xwe zêde dikirin. Hingî‹ Mîr Emîn Bedirxan naznavê Alî ji xwe re bijartibû û bi navê (Emîn Alî Bedirxan) dihat naskirin. Gotina Alî erebiya‹ bi wateya Bilind e. Anku Emînê Bilind.

Dawî dibêjim; Silav li sifra hazir e.. Hem jî dibêjim‹ em miha xwe nadin bi bizinê û mala xwe nabin cem mala bavê jinê.

Hawarê‹ hejmara 8'an de‹ alfabeya wî û rojnameya Riya Taze li kurdên Rewanê pîroz kiriye û wiha gotiye: (Rojnameke kurdmancî‹ bi herfên nû‹ bi kurmanciyeke xwerû‹ li Rewanê‹ di şiklekî spehî û çeleng de derdikeve. Vê paşiyê çend hejmarên wê gehiştine destên me. Çavên me pê biruhn bûn‹ dilê me şa û geş bû.

Kurdmancên Rewanê ji rûjnamê pêve çend kitêb jî derêxistine. Me sê çar roj mijûlahîya xwe bi wan kirin. Ji nav rûpelên wan ên taze û ter bihna kulîlkên çiyayê Elegozê‹ bayê zozanên Serhedan dihatin. Di nav Resmên wan de şal-û-şapikê kurdmancî‹ xencer û piştxencera kal û kalikên me dihatin dîtin. "Rêya Teze" wek navê xwe teze ye‹ nû ye‹ nûbar e. Lê ji Hawarê kevintir e‹ bi emr jê mezintir e. Hejmara wê a paşîn ku gehiştîye destê me a pêncî û nehan e. Li gora ku Rêya-Teze rûjnameke deh-rûjkî ye‹ berî salekê û hin dest bi derketinê kiriye). Herekol Azîzan (Celadet Elî Bedirxan)

Belê‹ alfabeya Mîr Celadet Bedirxan û ya Moroglov bi gelek tîpan ji hev cuda bûn. Ew alfabe bi tenê di nav kurdên Rewanê de belav dibû û piştî çend salekî‹ bi alfabeya Kirîlî hat guhertin

Sebaretî berhevkirina Mîr Celadet Bedirxan ji alfabeya latînî re‹ ew di kovara Hawarê‹ hejmara 13'an de wiha dibêje:

(Ev alfabêya hanê ku îro em zimanê xwe pê dinivîsin paşiya xebateke salên dirêj e. Di sala 1919'an de‹ me dabû çiyayê Meletyê.. Mêcer Newel (Îngilîzek) jî digel me bû. Mêcer zarê nîvro dizanîbû‹ dixebitî ku hînî zarê bakur bibe û ji xwe re her tişt dinivîsandin. Min jî hin metelok‹ stran û çîrok berhev dikirin.

Carnan‹ me li nivîsarên xwe çavên xwe digerandin‹ dixwend û diedilandin. Min bala xwe dida Mêcer‹ bi lêvkirineke biyanî‹ lê bê dişwarî destnivîsa xwe dixwend. Lê belê ez‹ heta ko min (Û-و) ji (O-و) û (Î-ي) ji (Ê-ي) derdixistin‹ diketim ber hezar dişwarî‹ ma çima?

Ji ber ku Mêcer bi herfên latînî‹ lê min bi herfên erebî dinivîsandin. Ser vê yekê‹ di cih de min qerara xwe da û ji xwe re bi herfên latînî alfabêyek lêkanî..

Sala 1924'an de li Almanyayê‹ min careke din çavê xwe li alfabêya xwe gerand‹ hûr lê mêze kir û demeke xweş li ser xebitîm.. Alfabêya me paşiya xebateke sêzdeh salîn e‹ li gor zimanê kurdî‹ li gor dengê zimanê me ye. Herfên alfabê‹ berî sêzdeh salan hatiye nivîsandin û li gor zimên û dengên wî‹ hin bi hin edilî û kete hale xwe yê îro.. Ez vê alfabêyê ji keda xwe bêtir ji keda miletê xwe dihesibînim û pêşkêşî wî dikim. Ji xwe herçî yê wî ye ji yê her kesî hêjatir û sipehîtir e..) Celadet Alî Bedirxan‹ 28.11.1932‹ Şam

Di hejmara yekê de jî wiha dibêje: (Ez ku Kurd û Kurdmanczan im û zimanê xwe rind dizanim û min ew bi heft-heşt zimanên din daye ber hev‹ kitkitên wî hûr hûnandine‹ qaydeyên wî ji hev derêxistine‹ dikarim ji biyanîyan bêtir û qenctir dehkara wî bidim xuya kirin û zanîn..) Hawar‹ Hejmar: 1/1932.

Hawar Hawara Mîr Celadet Alî Bedirxan Ji Kezebê Bû



Konê Reş

Rast e di nav civaka me de gotina (Hewar)، tê bikaranîn. Lê dema ku ev peyv ji ber zilm û zorê tê der، mirov dike haaawaar Haaawaar.. Hawar dike..

Serbest

(Ez ku Kurd û Kurdmanczan im û zimanê xwe rind dizanim û min ew bi heft-heşt zimanên din daye ber hev.. dikarim ji biyanîyan bêtir û qenctir dehkara wî bidim xuya kirin û zanîn.. Herfên elfabê‹ berî sêzdeh salan hatiye nivîsandin.. Ez vê elfabêyê ji keda xwe bêtir ji keda miletê xwe dihesibînim û pêşkêşî wî dikim..). Mîr Celadet Alî Bedirxan

Min mebesta mamoste Têmûrê Xelîl ji vê nivîsandina wî ya bi navê (Alfebeya kurdî-latînî a ji alîyê dewleta Sovyet da testîqkirî) nas nekir?! Ez bawer im ne keşf û tiştekî nû ye.. Sebaretî min û gelek hevalên min‹ em roja (15'ê gulanê)‹ bi navê Roja Zimanê Kurdî nas dikin. Ev roja ku ji berî 84 salan ve Mîr Celadet Bedirxan kovara Hawarê bi alfabeya latînî li Şamê weşandiye..

Tevî ku em zanin‹ berî Mîr Celadet Bedirxan gelek hewildanên nivîsandina kurdî bi alfebeya latînî hatine kirin‹ ji wan; Xelîl Xeyalî‹ Mîr Mihemed Salih Bedirxan‹ zarokên Cemîl Paşa û hin din. Di pey wan re‹ Moroglov dostê gelê kurd û zimanzanê Ermenî wî jî‹ alfabeyek latînî di sala 1930'î de ji zimanê Kurdî re berhev kiriye û rojnameya (Riya Teze) pê hatiye weşandin. û Mîr Celadet di kovara

Rûyê zeytûnan tên dîtin
Li wir leşkerekî tirk
Agirê hesteya xwe nêzîkî daran dike
Tîna wî naşike
Û hewl dide bi hesteya xwe agir bi axê jî bixe
Li vir
Dîsan leşkerekî Tirk
Ji ser sînor ve agir bi av û simiblên me dixe
Leşkerek ji Şamê
Agir dixe nav pêçekên zarokên me de
Cekdarekî rih dirêj
Agirê xwe bi rêyên ku ji nav zeviyan ve
Me digahndin bihuştê‹ dixe.

Ez vedigiriyam malê
Li paş xwe dinerî‹
Zevî û roka ku duh gelekî zer bûbûn
Êdî bi hev re ew û simbil şewitîn
Êdî tenê rengê reş û hinek dûmana mayî li pêş mane.

Min got na nema vedigerim
Min çixareya xwe vêxist
Rahişt komek simbilên şewitî
Ku hîna germ bûn
Û ber bi zevîyê xwe ve çûm
Di dewsa her simbileke şewitî de
Min simbilek ji dilê xwe danî
Di guhê her simbilekê de got:
Sala bê ez û zarokên we
Em ê gelekî dirêj bibin
Ta bigêjin rokê
Bibin wek agir
Da ti agir me neşewitîne.

Destmala min‹ di dest min de ye
Çavê xwe li hawîrdora xwe digerînim
Carinan bi alî bakur ve baz didim
Carinan bi alî rondikan ve
Destmala xwe çend caran bi xurtî li erdê dixim
Da çend simbilek sax bimînin
Ta diwestim
Ta xwêdana şor di nav wî agirî de
ji ser mijangên min dikeve
Û derbasî çavên min dibe.
Bi tifa xwe ya bi bêhna şewatê tijî bûye
Devê xweyî zuha şil dikim
Xwêdana bi bêhna şewata simbilan şor bûye
Ji ser enîya xwe zuha dikim
Ji ser çavên xwe zuha dikim
Tu dibê qey‹ min ne xwêdan zuha dikir
Lê weku ji simbilan re bêjim: Destê min ji we nabe di nav vî agirî de
Û li vir dilê min‹ simbil bi simbi dişewite.

Li dora min
Her yek bi alîyê simbilê xwe şewitî ve bazdide
Her ku nêzîkî zevîyên xwe dibin
Êdî bêhna şewatê xurtir dibe
Êdî nema agir dikare tiştekî din
Ji bilî dilê wan bişewitîne.

Li vir
Ji simbilên şewitî ji xeftanê Tirbespiyê
Bêhna şewata darên zeytûnan li Efrênê tê
Di rûyê wan simbilên ku dişewitin de

Simbilên Rojava

Kerem Yûsiv

Li ser van rêyên dirêj
Tiştê ku dişewite‹ ne simbil in
Ew zarokên me ne
ku em wan di nav zevîyan de xwedî dikin
Aniha li ber çavên me wilo bêdeng dişewitin
Ta ku di cihê xwe de
Bi carekê re dirazin.. dimirin.

Di zivistanê de çavên me li ewran bûn
Me digot: Yareb baran
Me xwe dexîlî hemî ocaxan dikir
Carinan jî me dixwest berbejinekê bi simbilan ve vekin ‹
Da ew ewir tîna simbilên me bişkînin
Da ew li ser zevîyên me derbas nebin
Bêyî ku em û simbil
Bi hev re şîn bibin.
Çaya me
Ava me
Nanê me
Por û rûyê me
Kinc û mûyê sînga me
Bi bêhna van simbilên dişewitin re‹ hatîye dagirtin
Li jor dûman bilnd dibe
Li jêr simbilên nû dişewitin
Di nav wan de jî
Guman nakim
Ku agir karîbe wilo bi serê min û simbilan bike.

Welato

Nayîf çolo

Welato‹ ku tu vegerîya
Ji biyanîya xwe
Wê gulya genimî
Ji cotkar re
Çîrokên xwe û baranê
Bi ta û derzî veke
Û
Xunava sibehên xwe
Bike
Kanî ji bo canê evîdarên teyî tîbûyî
Ji firotina dengê xwe
Li bazara xakeke beyar.
Wê xwêdana enîya Hejaran
Vexwîne
Şahîya xwe û dasê bi
Şehnazî û rûmet.
Kulîlk û nêrgizan rengê xwe
Di rehên hêvyê de
Veşartibûn
Ta bi vegra te re
Zevîyên geşbînîyê
bixemilînin.
Ne tenê xakê bêrîya kenê
Te kirîye
Hemî zindîyar li hêvîya
Barana lêvên teyî sozdar in
Ku
Tu canê wan bi hingivê
Xûdî şil bike.

Destê Êvarê

Nezehat Dogan

Di destê êvarê de li te digeriyam
Heta ku bajar diraza û dîsa diketim xulumatên xwe
û te
Berê sibehan sikakên vî bajarî
Li min şiyar dibûn ji ber min ruhê xwe distira
bi ruhê te re
Çi bêjim... rêwiyeke bê nasname bûm
Hertim nasnama xwe di qorzîkên dilê xwe de diveşart‹
min di got tu heyî
Û rojekê xaşwaşî ne kete dilê min de
Ku te ji bîr bikim
Lê birîna min kûr dibû û bejna
min zirav dirêst ji êşên te
De were tu bi qedrê miriyê xwe ke
De were‹ êdî bes e
Lê dema tu hatî di miştaxa tirî de were
Ji bo ji germahiya himêza te germ bibim
Çîroka emrê min de were...

Helbest

ya ku ji gelyaz diniqute re
tu têyî
bi biçûk dîtina singên şar
a kulxanên qerisî re
û
dilê te yê kevok
xwe datîne li ser guliya serwîyê
lê
li wê pêlê
ax! li wê pêlê
dîsa der dibe bi xwînê
qehra min
dîsa der dibe bi xwînê
di paşila çiyayan de serma dişewite
agir dicemide
li cihekî
barana qemirandî
banga evîndaran dilşewat dike
zêra
li sengera mişteNûrê ya Kobanê
keçek ciwan der dibe bi xwînê
li destên wê
gula sor a sîh û du belgdar vedibe
û li wê pêlê
li ser guliyê dilê te yê kevok digîrî
dilopa evînê zuha dibe
serwî dikeve
û
dîsa dîsa
ji koka dara jiyana min
a ji ber derketî
der dibe bi xwînê

Der dibe bi xwînê

Evdilrehman Çadircî

Dilop a dawî ya evînê
dikeve li çola dilê min
li vê çolê
bi germahiya xwînên li axê rijî re‹
agir
li pir evînên mesûm ketibû
û bûbûn xwelî
an jî
bi hesasiyatan "bila şaş nayê fêmkirin"ê
dev ji pir evînên teze
hatibûn berdan
lê niha dîsa jî
li cihê dilopa evîna dawî ketî
bejn û bala xwe davêje serwiyekî
bêdengî dijenîne bêdengî
û li wê pêlê
cardin bihêvî dibe hêvî
ji dilxweşî digîrî dilxweşî
û
li ser xwe cil û bergên xwe ya bexşînerî
ya li ser gelyazên sor daliqandî
tu têyî
bi rojên me wendayî

derwêşekî
û hişyar bike van wicdanên ku xwediyê paşeroja şikestî ne
Rabe hîna nebûye dereng
dengê xwe tev li qîrîna Rojava bike.
Ma ta kengî tê
di vê xewna mirinê de
xwediyê helwestên ji kerbûyî bimîne
Rabe tu jî dengê xwe tevlî qêrîna Rojava bike
Va ye pêl bi pêl belav dibe dengvedana peyvê‹
û zarokên rojê dest didine hevdû li dora hêviyê
Xwe li rimiyên êgir dipêçin
Va ye xwe dikine qurban‹
sînoran diparêzin bi bedena xwe
rabe hîna nebûye dereng
tu jî dengê xwe tev li qîrîna Rojava bike

Va ye Qendîl bi ser Zagrosan de difûre
û Zagros mîna şapa gulanê di ber welatê pîroz ve‹
bi ser welatê rezîl ve diherike
bendên azadiyê lê dike bi stûnên polayî
De ka nebin xwediyê hêviyên şikestî
di xewnên mirar de nebin gerdena xêliyayî
Rabin‹ rabin hûn jî dengê xwe tev li qîrîna Rojava bikin‹
de rabin em hemû dengê xwe tev li qîrîna Rojava bikin‹ de rabin.

Banga Rojava

Ednan Dogan

Newal bi ser çiyayan dikevin‹
û va ye şev rojê dadiqûrtîne di ber-
banga sibehê de‹ nebe
xwediyê rondikên ji kavanên çavên
rijiyayî‹
bi ser dergahên xweziyên êsîr de
weke pepûkekî bê paşeroj dibarîne
dengê xwe tev li qîrîna Rojava bike
Va ye kevokên neqişandî ber bi deşţê
ve difirin‹
qertel û baz pêşwaziya wan dikin
Va ye zarokên te pêl bi pêl pê lê dikin
li ser singa Nemrûd û Firewnan
û ber bi azadiyê ve diçin
Nebe weke bilbilekî çengokirî ku bi
ser baxên bêgûl de‹
di qûntara çiyayên bêxêr de
di bin şewqa stêrkên vemirî de
dixwîne
dengê xwe tevlî qîrîna Rojava bike
Va ye dixwazin welatê te
di demsaleke beravêtî de vemirînin
De rabe û rahêje erbaneya xwe wekî

Pêxwas bûn...

Nûh Silêman

Yên ku di vir re derbas bûn
Xewnên xwe
Di bin paniyên xwe de perçiqandin
Û derbas bûn...
Cilên xwe li bejna tirsê kirin
Û navqetandî derbas bûn
Li şûna xwe
desmalek bi bêhna hinnê
Qutîk tutina kizirî
Qevdek ji ze'tera bejî
û kulmek navkên zeytûnan hiştin
û derbas bûn...

Dest vekirî û çav fireh bûn
Derî û pencereyên xew jî
Ji hechecîkan re vekirî hiştin
Cilên xwe li ser têla çekan raxistî hiştin
Û derbas bûn
Her sibeh bi dengê " Horo "
Rok ji xewê hişyar dikarin
Û her êvar di çavên xwe de
Di xew re dibirin
Yên ku di vir re derbas bûn
Îşev rok hişyar hiştin
Û
Derbas bûn.....

Ji Jina Kurd re

Boniye Cegerxwîn

Belê xuşkê tu ala yî
Li cîhanê te deng dayî
Di cengê de tu zana yî
Çelengî pêlê derya yî

Tu sembola gelê kurdî
Di danê de tu comerd î
Tu Leyla yî Şefa Gerdî
Tu Barîn î Evêsta yî

Tu xuşk î yan jî dayik î
Tu hevjïn î yan keçik î
Tu heval î xweş nazik î
Şahinşaha hemya yî

Ji malbatê re saman î
Ji biryaran re raman î
Ji êşê re tu derman î
Her tu mînaka jina yî

dimirim…
Di jiyana xwe de ji gelek aliyan ve sêwî bûm. Miletê bê dewlet be miletekî sêwî ye. Miletê ku xêrûbêra wî û welatê wî were dizîn‹ miletekî sêwî ye… Mirovê ku li dawiya temen hevjîna wî biçe ber dilovanîya Xwedê sêwî dimîne… Mirovê ku çar kur û sê keçên xwe hebin û tevan koçî dewletên dûr kiribin sêwî ye û ez yek ji wan im. Sê sal in bi tena xwe di vê malê de dijîm‹ hem sêwî û hem jî nîvmirî me…
Canêsîn -Melekê Mewtê- nêzîkî min dibe. Ziqitandina di serê min de û tevizandina tilîyên lingê min nîşanên wê nêzîkbûnê ne. Komek zarok û torînên min hene‹ lê kes ji wan li tenişt min nîne. Koçkirinê temenmezin sêwî hiştin… Gund û darên zeytûnê sêwî û di nav perîşanîyê de hiştin û…".
Êşa di serê Seydo de zêde bû û pênûs ji nav tilîyan ket. Seydoyê heftêsalî hêze xwe kir‹ lê gewdeyê wî giran bûbû. Hewil da rabe ser xwe û ber bi derîyê male ve biçe‹ lê hêza wî pir lawaz bû. Cara sêyem hewil da û rabû li ser pêyên xwe sekinî‹ lê serê wî gêj bû. Hewil da bang bike‹ lê dengê wî di gewrîyê de ma. Gavek ber bi deriyê male ve avêt‹ lê bi paş de kete erdê‹ serî li dîwarê odê ket û xwîn pijiqî ser lênûsê.
Seydoyê heftêsalî li ber xwe da‹ lê bê çare bû. Berî giyan xatirnên xwe yên dawî bixweze û kirtîniya dawî bi gewrîyê keve‹ Seydo bi nihrînên xwe bangî keç‹ law û torînên xwe dikir‹ lê tenê wêneyên wan ên berî sê salan di pêş çavan re derbas dibûn. Hêdî hêdî çavên Seydo bergewrî bûn û xwiya kêferatê li eniyê sar bû.
Piştî du rojan hevjîna Mêrze got: Lo Mêrze! Du roj in ez apê Seydo li ber dîwarê malê ne jî li bin dara tiwê nabînim!
Tavilê Mêrze bi lez çû li derîyê hewşê da‹ lê Seydo wek her car negot: Ew kî ye? Çend caran Mêrze li derî da‹ lê kesekî bersiv neda.
Merze di ser dîwêr re kete hewşê û li derîyê malê da‹ lê Seydo bersiv neda. Mêrze vegerî li pêş derîyê hewşa Seydo sekinî û li hawîrdora xwe dûr û nêzîk nihêrî ku kesekî bibîne ji bo karibin derîyê malê yê hesinî vekin‹ lê kes bi ber çavan neket. Bi dengekî bilind bangî hevjîna xwe kir‹ herduyan bi hin alavan derî hilqerastin‹ lê mixabin Seydoyê heftêsalî jiyana xwe ji dest dabû. Seydo dirêjkirî û berê wî berve deriyê malê bû.
Mêrze li çavên hevjîna xwe nihêrî‹ serê xwe hejand û got: Ji çar zarokên me Ronî tenê li ba me mabû‹ wî jî pişta xwe da me û çû Ewropa.
Dema ku xelkê gund Seydo li goristanê binax dikirin‹ piranîya kalemêr û pîrejinan hem li ser Seydo û hem jî li ser rewşa xwe digrîn. Hinan keser kûr dikşandin û wêneyên zarokên xwe li bîra xwe tanîn…
Li danê êvarê hemû keç‹ law û hin torînên Seydo yekem car rûpelên xwe yên fêsbokê bi wêneyê Seydo xemilandin.

teyê koçkirinê avête milê xwe.
- Ceng‹ şer nemaze şerê navxweyî welatan hildiweşîne. Civakê pîr dike… Şahî û jiyanê pûç dike… Goristanan fireh dike… Şer û ceng werzek ji werzên darbest û wêrankirina mirovahîyê ne. Korbûn e Mêrzeyooo korbûn!
- Belê apê Seydo belê! Şer û ceng dêya penaberî‹ koçkirin û windabûnê ne.
- Lo Mêrze! Her tişt bazarkirî ye. Çîrok kirîn‹ firotan û berjewendî ye. Civakên zana welatan ava dikin û yên nezan welêt difroşin. Dewletên ku zanînê dikin rêber û nifşan ava dikin. Li dewletên ku kursî ji her tiştî girîngtir e‹ her tiştî têk dibin. Nezanîn tarî ye û tarî wargeha her tiştê ne baş e.
Piştî ku Seydo wisa got‹ hêze xwe kir‹ rabû li hawîrdora xwe nihêrî û ji Mêrze re got:
- Miletê bê dewlet her tiştê wî tê dizîn‹ her kes bi wî dilîze û ji xwe re dike destek. Şeş sal in li vî welatî şer û çeng e û her tiştê nebûyî dibe. Çil salî ez Mele bûm û min xizmeta ola îsalamê kiriye. Lê xuyaye ku mejiyê min ne durust bû.
Yekem car bû Mêrze gotinên wisa ji Seydo dibihîst. Ji ber wê jî jê pirsî: Çawa mejiyê te ne durust bû? Yekem care ez vê gotinê ji te dibihîsim!
Seydo nihrîn li hawîrdora xwe gerandin û ji Mêrze re got:
- Kesê ku xizmeta milet‹ civak û welatê xwe neke‹ xizmeta mirovatiyê nebîne serûberê jiyana wî derw e. Xwezî berî mirina dawîyê ez karibim zanîna xwe têxim xizmeta miletê xwe. Em xizmeta ola îslamê dibînin û bêtir bi destên misilmanan tên kuştin… Ji me re dibêjin em bira ne. Eger em doza mafê xwe dikin serast devê tivingên xwe berve me dikin.
Piştî ku Seydo gotina xwe bi dawî kir û Mêrze bêdeng bû‹ Seydo got: Mêrze rabe em herin li hindur mal rûnin.
- Mala te ava be apê Seydo. Xalê min Reşo nesax e ez ê biçim serdana wî bikim.
- Ji min re xalê xwe Reşo silav bike.
Mele Seydo derbasî hindurê mala xwe bû‹ nihrînên xwe li pirtûkxaneya xwe ya biçûk gerandin û ji xwe re got:
- Ne hemû tiştên ku hatine nivîsandin û têne gotin rast in. Ya rast ku mirov li rastîya xwe û ya miletê xwe xwedî derkeve. Eger mirov li xwe xwedî dernekeve dê çawa karibe li kes û tiştine din xwedî derkeve?! Mejîyê ku hertim xizmeta xelkê bibîne û xwe ji bîr bike mejiyekî pûç e û li dawiyê erzan dimre.
Kalemêrê heftêsalî dixwest xwerinê bixwe‹ lê êşeke sivik di serê Seydo de diziqitand. Çend gulm av vexerin û vegerî li pêş pirtûkxaneya xwe ya biçûk sekinî û nêrînên xwe li navnîşanên pirtûkan gerandin. Di piştre lênûsa xwe ji pirtûkxanê derxist û çû li ser doşeka xwe ya hertim li erdê bû rûniştst.
Li ser doşekê Seydo hestewar dibû ku êşa di serê wî de hêdî hêdî zêde diziqitîne û serê tilîyên lingan ditevizin. Seydo lênûs vekir û nivîsand:
"Êşek di serê min de diziqitîne û tilyên lingên min tevizî ne. Mirina min ne ewqas pirsgirêk e‹ ne jî dawîya mirovahîyê ye. Di jiyana xwe de gelek caran ez mirim û gelek hêvî‹ nihrîn û daxwezên min jî mirin. Her ku neyaran komkujî bi serê Kurdan dikirin ez dimirim. Her ku şoreşeke kurdan têk diçû ez dimirim. Her ku xort‹ keç an rêberekî Kurdan bi dar ve dikirin ez

bavê xwe yê ku berî çil salî çûbû ber dilovanîya Xwedê li bîra xwe anîn. Korbûn beşek ji mirinê ye. Kalbûn rêkeftina berve mirinê ye. Erê… Bavê min wisa digot. Lê dema ku mirov bi darê zorê ji axa xwe hildibe û ji nasnameya xwe ya xaknîgarî dûr dikeve‹ ew jî şêweyek ji mirinê ye.

Piştî ku wî wisa got‹ hewil da ku ji ber dîwêr rabe‹ lê kalbûnê hêza wî mîna zarokekî sêwî kiribû. Ji nû ve pişta xwe da dîwêr‹ nêrînên xwe yên ku mîna bazekî baskşkeştî çep û rast li hawîrdora xwe gerandin û ji xwe re got: Van çavan gelek darbeştên mirinê dîtin‹ lê mirin di çavên min de nehate dîtin.

Gotina xwe domand: Rast e di çavên min de mirin nehatîye dîtin‹ lê gelek nêrîn ji çavên min derketin û mirin. Ma gelo her kes bi mirina nêrînên xwe hestiyar dibe?! Mirovê ku her kesekî mîna xwe dibîne nêrînkor e. Mirovê ku hemû xelkê ji xwe zanatir û baştir dibîne hişpûç û mejîziwa ye. Mirovê ku ji goristanê ditirse û hertim mirin li bîrê ye‹ jiyana wî darbest û goreke li ser axê ye. Dema ku nêrînên min kesên weha dibînin‹ hingê hestîyar dibim ku nêrînên min dimrin.

Hîn li ber dîwêr bi xwe û hin bîranîn û tiştine şaş û rast mijûl dibû‹ xortekî bejinzirav û lihevhatî berve jêrî gund bi lez diçû. Seydoyê heftêsalî destê xwe yê rastê da ser biriwên xwe‹ ji çavên xwe re kire sih û li xort nihêrî. Dema ku çente di destê xort de dît girî di gewriyê de bû girêka êşan‹ mijang bi rondikan hatin şuştin û bi dengekî pîr got:

- Biyaniyê hemû zarokên min revandin. Hevjîna min Nazo ji derdê koçkirina wan koçî goristanê kir. Bêtirî du salan e çavên min wêneyê zarok û torînên min nedîtine. Guhên min dengê wan nebihîstine. Her roj li ber vî dîwarî rûdinim û ji memikên bîranînan giyanê xwe dimêjînim.

Seydoyê heftêsalî li hawîrdora xwe nihêrî‹ ji ser kevirê lêhêmî rabû û çû pişta xwe da koka dara tiwê û lingên xwe dirêj kirin. Nêrînên xwe berve jêrî gund rêkirin‹ lê xortê bejinzirav nedît. Bi hêdîka serê xwe du-sê caran li koka darê da û got:

- Qirkirina civakê bi gelek şêweyan çêdibe û koçkirina xortan yek ji wan şêweyan e. Gundê me yê ku ji sed malbatî pêk tê tenê çend xort lê mane. Tiliyên keçan bê gustîlk mane… Şûna bêderan bêrîyra dawetan kiriye… Gelo ew xortê li jêrî gund bi kû de diçû?

Belkî pirsine din di serê Seydo de li bersivan digerîn‹ lê siha bejnekê hişt li kêleka xwe ya çepê binihêre.

- Mêrze tu yî?

- Belê apê Seydo Mêrze me.

Mêrze silav da‹ li tenişt Seydo rûnişt.

- Mêrze çima mirozê te ziwa ye û tu bi xem î. Çi heye?

- Apê Seydo! Rojane civaka me pîr dibe û rewş xirabtir dibe. Rojane kesên temenmezin sêwî dimînin û hêvîyên me di çenteyên koçberîyê de diçelmisin.

- Koçberî…!!! Belê koçkirina xortan em sêwî hiştin. De ka bibêje çima mirûzê te ewqas tirş e?!

Mêrze kesrek kişand‹ nihrînên xwe li nav şaxên dara tiwê gerandin û got:

- Tenê kurê min Ronî yê çardehsalî li ba min û dêya xwe mabû‹ îro wî jî çen-

Sêwîyê Heftêsalî

Mirovê ku çar kur û sê keçên xwe hebin û tevan koçî dewletên dûr kiribin sêwî ye û ez yek ji wan im. Sê sal in bi tena xwe di vê malê de dijîm، hem sêwî û hem jî nîvmirî me…

Merwan Berekat

Arîşeyeke tal û sitûr mîna pêlên deryayeke selt li kendalên mejî û ramanên wî dihatin hev. Di serê wî de wêneyên maline hilweşandî... Beza segeyine ku dûvê xwe xistibûn nav lingên xwe mezin dibûn û hêdî hêdî dûûûr dûr winda dibûn. Pişata xwe dabû dîwarekî bejinxwar û ji xwe re digot:

- Ma hestî jî tî dibin?! Ma kevir jî têne avdan?! Dibêjin ku çiya jî dişewitin، lê bawer nakim.

Kezeba xwe ji bayê kesereke bêdeng mişt dikir، nihrînine çelmisî li hawrîdora xwe diçandin û şivliva zarokan di reşika çavên xwe dilîskandin. Hêdî hêdî pişta xwe di dîwêr re dixuşand، li ser kevirekî lihêmî rûdiniştû di hindurê daxwezên xwe yên pîr de li baskên bîranînên zaroktîya xwe siwar dibû. Çawa hildiperikî darên hejîrê… Çawa li gel bavê xwe diçû nav darên zeytûnê… Çawa li ber agirê pixarê guhdarîya çîrokê dêpîra xwe dikir… Çawa، çawa û çawa?

Nedixwest ji kişwera bîranînên zaroktîya xwe vegere û derbasî bajarê pîrbûna xwe û rûbadana çerx û feleka mirûzqurmiçî bibe. Hêdî hêdî bîranîn zirav dibûn û di pişt perdeyeke mijdar de winda dibûn. Çavên xwe hişk girtin û ji xwe re got: Gelo çend nav ji mirinê re hene? Mirov bi çend şêweyan dimre? Ma gelo tenê jidestdana giyan mirin e?!

Wan pirsan dihişt ku bi sînga demê bigre û şêst salî bi paş de bizêvirîne. Heeey hey felek! Wisa got û gotinên

heta heft dengên mûzîkê bi vî awayî dijmêrin. Ne dûre ku niha kesek ji me bipirse û bêje: Gelo çima mûzîk bi awayekî akadîmîk li welatê we zêde pêş neketiye? Bê guman li welatê me‹gelek sedem hene ku nehêştine di vî warî de pêşkeftin çêbibe.

Eger em di warê rewanî de temaşeyî gelê xwe bikin‹ em ê bibînin ku rewnê gelê me‹ mûzîk û stran di nav hev de hatine strandin û ji hev cûda nabin‹ lê şerê ku li hember rewanê gelê me hatîye meşandin jî tu hest‹ zana û nivîskar nikarin wesif bikin.

Eger em xweşik lêkolînê bikin‹ em ê bibînin ku ji dawîya qonaxa dayîksalarî û heta roja îro li hember hest û rewanê gelê me şer heye. Bê guman‹ ev şer berî her tiştî li hember rewanê dayîkê meşandine û xwestine di wir de bi serkevin‹ li ser vê armanca xwe ya qirêj tu cara gav bi şûnve nehatine avêtine‹ pênc hezar sal in ew dewam dikin‹ her wisa pênc hezar sal in dayîka me jî bi hest û rewanê xwe yê resen li ber xwe dide.

Li vir ez dixwazim bêjim ku di nava vî şerê pênchezarsalî de‹ em stranan dibêjin. Niha dema ku em li mûzîk û stranên xwe vedigerin û awrekê li wan didin‹em dibînin ku stranên me ji yên dinyayê tevahî cûdatir in‹ ji ber ku her dem di encama êşê de me stran gotine. Bi wateyeke din em dikarin bêjin ku stranê me rastîya jiyana me ne.

Di van sedsalên dawî de‹ neyarên gelê me rengê şerê xwe qirêjtir kirine‹ bi her awayî xwestin ku rewanê vî gelî bidin gihurtin û tiştekî bi navê stran û mûzîk nehêlin. Bi hatina misilmantîyê re şerekî dijwartir dest pê kir û li hember rewanê dayîkê bi teybetî‹ rê û rêbazên qirêj hatin meşandin. Di vî şerî de me gelek ji hest û rewnê dayîka xwe winda kir‹ di windakirina van hestan de em gelekî ji postê xwe derketin û li rewanê me jî bandorên cuda hatin kirin. Li vir ez dixwazim tiştekî bêjim cara yekeme ezvê bi nivîs bînim ziman‹ bê guman hatina Îsalmê bandora herî nîgatîv li ser rengê jiyana me û her wisa stran û mûzîka me kir. Her ku em lêkolînan dikin‹ bi me re tiştên cûdatir derdikevin holê. Tê zanîn ku di welatê me de‹ dayîk xwedawend bû û rewanê wê civak bi rêve dibir. Hatina îslamê bi taybetî‹ her tişt ji me standin û tiştê nekarîn bibin jî weke ew dixwazin guhirtin. Heta niha gelê me yê herêma Hewramanê li başûr û rojhilatê Kurdistanê bi zaraveyê hewramî ji dayîkê re dibêjin: Ella nabêjin dayê yan jî Anê dibêjin Ella.

Bê guman dema ku li ser vê gotinê lêkolîn tên kirin‹ jêdereke din dernakeve holê ji bilî vê jêdera hewraman. Eger em vê rastîyê baş binasin‹ gelo ne pêwîste ku careke din di hemû warên jiyanê de em li koka xwe vegerin?.

Dema me karîbû em hinekî li koka xwe vegerin‹ em ê wê demê fêm bikin ku çima stranên me weqas xirap bûne‹ em ê wê demê fêm bikin ku hunermendî li welatê me nehêştine‹ ev kesên niha jê re dibêjin hunermend tiştekî gelekî cuda ye.

Dema ku em hinekî vegerin ser koka xwe‹ wê demê em ê careke din pîvanê vî karî nas bikin‹ heger me pîvasn naskirin heqîqet jî derdikeve holê û av vedigere cogên xwe.

Her wisa mijara çand‹ dab û nerîtên (irf û adet)civakan jî li vê dvera me hatine rêsandin‹ heta roja îro jî mirovahî bi wan mirov tê pênasekirin û li ser wan bingeha xwe birêxistin dike û pêşdikeve. Di nava vê dewlemendîya jiyanê de‹ felsefa Zerdeşt serî hildide û dibe ronahîya rêya civakên vê deverê. Kesekî weke Zerdeşt bi sê gotinan hizir û ramanên xwe pêşkêşî mirovan dike (Baş bihizire-baş bipeyive-baş kar bike). Ev sê gotin di wêjeya zerdeştîyan de bûne rengê jiyana mirovan wate bûne çanda wan gelên ku bi vê felsefeyê bawer kirine.

Dema niha em li hunera gelên Zerdeştî ya kevnare dinêrin‹ em vê wêjeya dewlemend dibînin. Ji bo em bikaribin hinekî din jî nêz bibin‹divê em mînaka kurdên Zerdeştî yên ku nebûne misilman bînin ber çavên xwe‹ ev kesên hanê hîn jî bi wêjeya xwe ya dewlemend û resen jiyan dikin‹her çiqas weke ku me li jor bahis kir bi hezar salane hewildanên jinav birina wê tê kirin‹ lê dîsa jî ev wêje gelekî di rengê jiyanê de bi rewneq e. Kurdên yaresan ew kurdên ku ji koka felsefeya Zerdeştî rengê jiyana xwe digrine.

Ev kurd li deverên jêrîn yê rojhilatê Kurdistanê jiyan dikin‹ ji bo ku xwe ji hêrişên bi navê fitohatên misilmanan biparêzin‹ gelek caran gotine em Kurdên Elewî ne. Her wisa Kurdên Kakayî‹ Êzdî‹ Ehlî heq‹ Maço û Elewî‹ van kurdan hemîyan bi her awayî rastî hêrişan hatin û heta roja îro jî ew wêjeya xwe ya dewlemend di rengê jiyana xwe de parastine û bi hezaran dastan‹ çêrok û serpêhatî di qefesa sînga xwe de veşartine. Bê guman mûzîk û strana dewlemend jî ancama vê wêjeya dewlemend in.

Li welatê me mûzîk û stran di nav hevde bûne tiştekî ku di rewanê gelê me de hatiye çandin‹ bi hebûna gelê me re ji dayîk bûye û pê re mezin bûye. Niha gelek mûzîkjen û kesên ku di warê mîzîkê de kar dikin‹ vê rastîyê tînin ziman‹ li Mezopotamyayê notên seratayî yên mûzîkê hatine dîtin. Her wisa navê wan notên ku ketine ber destên van kesan bi zimanê gelên Aryen hatine ristin.

dema ku behsa dengên mûzîkê dikin dibêjin: Yek ga du ga sê ga û

Wêje Koka Hunerê Ye

Li welatê me mûzîk û stran di nav hevde bûne tiştekî ku di rewanê gelê me de hatiye çandin, bi hebûna gelê me re ji dayîk bûye û pê re mezin bûye.

Delîl Mîrsaz

Di welatê me de stema ku hatîye meşandin gelek mijar serûbinî hev kirine, mirov nema dikarin rastîyan ji nav hev derxin. Gelek caran kesên zana derketine û xwestine rastîyên veşartî derxin holê û ronî bikin, lê mixabin serdestîya di welatê me de serwertir bû, zû destwerdan dikirin û careke din ew rastî binax dikirin.

Yek ji mijarên hatin binaxkirin jî mijara huner û hunermendîyê bû. Bê guman li vê devera me bi giştî, huner bi awayekî gelekî xwezayî hatîye hûnandin û salên gelekî dirêj berdewam kirîye. Xelkên devera me ji wê hunerê sûd girtine û rengê civaka xwe bi wê hunerê avakirine. Eger em bixwazin hunera welatê xwe nas bikin, divê hinek rûpelên dîroka kevnare werin qulibandin.

Tê zanîn ku huner ji bingehê wêjeyê ava dibe, lê wêjeya ku li welatê me heye têra dinyayê hemî dike, bi hezaran sal in li dijî wê hewildanên têkbirinê tên kirin, dîsa jî ew têra dinyayê hemî dike.

Bê guman sedema dewlemendîya vê yekê heye, eger em li dîroka vê deverê vegerin em ê vê sedemê destnîşan bikin. Devera ku însan lê hatiye cem hev û li wir rengê jiyanê lê hatîye avakirin, bê şîrove wê dewlemend be.

Welatê me cîyê avakirina rengê jiyanê ye, li vê deverê cara yekem însan bûne komîn û bi civandina li derdora dayîkê rengê jiyana însana hatîye despêkirin. Kombûna însan bûye sedema pêşxistina ziman, ji ber pêdivîya mirovan bi hevfêmkirinê hebû, lewra em dikarin bêjin ku ziman di welatê me de dayîka hemû wêjeya ye û her wisa navên ku di jiyanê de tên bi karanîn bi piranî li welatê me hatine rêsandin.

randibû. Jineke bêxwedî ku yezdanan di wê şevê de rêhevalekî çûçikanok jê re hinartibû da ku deŝtên wê girêde û wê bê kar û rozî bihêle.

Gava xirecira xelkê li kolanan hedirî‹ jinika reben pitikê xwe xiŝt hembêza xwe‹ li her du çavên wî yên birqonek nêrî û bi dilşewatî girîya. Mirov digot qey dixwaze wî bi merdîya rondikên xwe baptîz bike. Jinikê bi dengekî ku zinaran diqelêşe got: "Tu çima ji cîhana gîyanan hatî kezeba min? Ma tu timatîya hevparîya jîyana min a tal dikî? Ma dilê te bi qelsî û hejarîya min şewitî lawikê min? Te çima deŝt ji ferîşteyan û esmanê fireh berda û berê xwe da vê jîyana teng a tijî perîşanî û riswatî? Zarokê min ê tek‹ çu tişt ji bilî van rondikan li cem min nîne‹ ma tu dê li şûna şîr van rondikan binoşî? Ma tu dê deŝtên min ên şilfîtazî li şûna caw ji xwe re bikî cil û kinc? Çêlîkên ajelan li nav gîyê diçêrin û bi aramî di kuncên xwe de radizin; çêlîkên firindeyan jî libên genim hildigirin û bi kêfxweşî di nav çiqilên daran de dinivin‹ lê tu kurê min‹ zadê te keser û hejarîya min e".

Lawikê xwe bi hêz hembêz kir‹ te digot qey dixwaze her du laşan bike yek. Deŝtên xwe ber bi esmên ve bilind kirin û qîrîya: Xwedêyo‹ li me were rehmê!

Gava ewr ji ber rûyê heyvê belav bûn‹ ronîya heyvê ya zenûn ji pencereya wî xanîyê pîsik derbas bû û da ser du laşên hişk…

Du Zarok

Cibran Xelîl Cibran
Wergera ji zimanê Erebî: Evdo Şêxo

Lawikê xwe bi hêz hembêz kir، te digot qey dixwaze her du laşan bike yek. Destên xwe ber bi esmên ve bilind kirin û qîrîya: Xwedêyo، li me were rehmê!

werger

Mîr li ser şaneşîna koşkê sekinî û gazî girseya gel a li gulzara koşka xwe kir û got: "Mizgînîya min li we! Ez we û welêt pîroz dikim: Mîrbanûyê barê xwe danî; kurek ji me re anî da ku rûmeta malbata min a bişan û navdayî hilgire، ji we re bibe rûmetgeh û penageh û ji bav û bavpîrên xwe re bibe mîratgir. Kêf û şahîyan li dar bixin û dîlanê bigerînin، êdî siberoja we û vî dundeyê birûmet gihan hev.

Hirmehirm bi girseyê ket û esman bi tilîlîyên kêf û şadîyê çirîya; êdî her kes dilxweş bû bi wî pitikê ku dê di dergûşa şikodarîyê de bi xwedî bibe، ciwanîya xwe di hembêza hezkirinê de bibîne û paşê bibe destthilatdarekî bêsînor: Jîyana xelkê bixe jêr hêza şûrê xwe، bi hişkî dizgîna hejaran bigire û laş û gîyanê wan bi serbestî ji nav bibe. Êdî welatî dilşad bûn، sirûd û stran digotin û di ber re pîyaleyên kêfxweşîyê vedixwarin.

Dema nîştecihên bajêr hêzdarê xwe berz dikir û stran li ser zordestê xwe digotin; dema wan xwe û kesayetîya xwe riswa dikir û ferîşte li ser piçûkîya wan digirîyan، jinek li ser textê nexweşîyê yê maleke dêris û jihevketî ramedîyabû û pitikekî bi qerpol û potikekî pêçayî girtibû hembêza xwe ya sincirî.

Keçeke ku xizanî û êşkêşî bûbûn para wê ya jîyanê û mirovan ew paşguh kiribû. Jineke ku sitemkarîya mîrê hêzdar rêhevalê wê yê qels mi-

- Heftiyekê!
- Heftiyekê?
- Heftiyekê!
- Heftiyekê?
- Heftiyekê!
- Piştî heftiyekê tu tê û ecele vê xebatê dikî!
- Piştî heftiyekêî?
- Erê!
- Erê?
- Erê!
- Pazdehê mehê?
- Pazdehê mehê!
- Berbangê?
- Berbangê!
- Ez hêsa dibim.
- Hêsa dibî?
- Hêsa dibim!
- Westiya yî?..
- Hêsabûna min e!
- Ji hêsabûnê bêy û ecele vê xebatê dikî!
- Ji hêsabûnê?
- Erê!
- Serê salê?
- Helbet!
- Xilasiya mehê?
- Ese!
- Ese!
- Wisa?
- Wisa!
- Wisa?
- Wisa!
- Piştî salekê‹ piştî pênc salan tu yê ji min ra vê xebatê ecele bikî!
- Piştî vêya (kulma xwe nîşanî wî dike) ez ê ji te re hazir bikim!
- Erê?
- Erê!
- Ji Wê Dinê tu yê bêy û vê xebatê ecele ji min ra bikî!
- Ji Wê Dinê?
- Erê!
- Erê?
- Erê!
- Tevî te!
- Erê?
- Em ê bi tevayî bikin!
- Erê?
- Erê!
- Erê? Ez ê xatrê xwe ji te bixwazim‹ tu yê ji min ra çêkî!
- Ez çê nakim!
- Tu yê çêkî!
- Çê nakim!
- Lê ez dibêjim: erê!
- Lê ez dibêjim: na!
- Erê!
- Na!
- Erê!
- Na!
- Erê!
- Na!
- Hav!
- Tiyav-tiyav!
- Hav!
- Tiyav-tiyav!
- .....

- Piştî wê xebatê nîvroxwarina min e!
- Nîvroxwarina wî ye!
- Nîvroxwarin e!
- Birçî bûyî?!
- Birçî bûme!
- Ji bo te ku dore kalbas karxanê bihatir e?..
- Nîvroxwarina min e!..
- Nîvroxwarin... Piştî nîvroxwarinê ecele vê xebatê bike!
- Piştî nîvroxwarinê ez ji bo hacetan diçim!!!
- Hacetên çi?
- Yên ku we nedane min!
- Me?!!
- Erê‹ we!!!
- Ji bîra te neçe‹ cem me komekdar Egît dixebite û ew hertim komekê dide xebatçiyan!.. Û tu jî pozê xwe neke nav wan şuxulên ku nagîje te!..
- Li cem we dixebite Egîtê komekdar...
- Helbet!..
- Ew domîno dilîze sibê heta bi êvarê!
- Te dîtiye?! Te dîtiye?!
- Lê tu cina dikevî sibê heta êvarê!
- Ez cina dikevim?..
- Hilbet!..

(Şer dikin)

- Erê?
- Erê!
- Erê?
- Erê!
- Erê?
- Erê!
- Erê?
- Erê!
- Erê?
- Erê!
- Erê?
- Erê!
-Ku te hacet anî‹ ecele vê xebatê dikî!
- Piştî hacetan? Xilasîya xebatê ye‹ ez diçim mal!..
- Mal?
- Mal!
- Mal?
- Mal!
- Tu yê du seatan bimînî û eseh vê xebatê bikî!
- Piştî xebatê?
- Erê!
- Ez diçim înstîtûtê. Dersên min hene!
- Dersên wî hene!
- Dersê min hene!
- Tu yê ji min ra bibî înjînêr?!
- Belê‹ înjînêr!
- Ma hindikin cem me ew hebûna?!
- Bila dîsa hebe!
- Erê?
- Erê!
- Erê?
- Erê!
- Erê?
- Erê!
- Erê?
- Erê!
- Sibê şeveqê tu tê û ecele vê xebatê dikî!
- Sibê?
- Erê!
- Şeveqê?
- Şeveqê!
- Zû?
- Zû!
- Berbangê?
- Berbangê!
- Ez ê guhastina dudan da bim...
- Çiqasî?
- Heftiyekê.
- Heftiyekê?

werger

Dîroka Nexweşîyekê

Xortê delal، bêhna xwe fireke، bêna xwe fireke، bêhna xwe fireke... Hişê xwe komî ser hev bike û bîne bîra xwe: kengê hatine dora te?..

Mîxayîl Jvanêtskîy
Wergera ji rûsî: Şalîko bêkes

Niha siraya kê ye cem psîkîator?. Kerem bikin، pêş de werin ... Roja te bi xêr، xortê delal. Tu çi dikarî derheqê xwe de ji me re bibêjî?.

- (Dike "ewtîn") Hav!
- ... ... Femdarî ye... Em derheqê tiştekî din xeber didin... Bêje min، xorto، tu ji sporê hiz dikî?
- Erê، ji sporê...
- Futbolê، baskêtbolê?
- Futbolê.
- Lê ji çandê، tiyatro hiz dikî?
- Çandê، tiyatro hiz dikim.
- Dibînî، her tişt baş e... Û ji zû ve ev yeka qewimî?..
- Çi?
- Ay ev yeka...
- Futbol?
- Ay eva، eva... Zû ve hatine mêvanî te? Ay eva...
- (Mîna kûçika) R-r-r-r-r...
- Xortê delal، bêhna xwe fireke، bêna xwe fireke، bêhna xwe fireke... Hişê xwe komî ser hev bike û bîne bîra xwe: kengê hatine dora te?.. Bêhna xwe fireke، hişê xwe komî ser hev bike، bîne bîra xwe... Bêhna xwe fireke... çi li te qewimîye... (Wêne tê guhastin. Bîranîna xort) ..... Feyat! Feyat! Ka bilezîne، vê xebatê bi lez ji min re bike. Han ji te ra qirar. De zû bike!
- Xebateke bilez li cem min êdî heye!!!
- De pek، piştî wê xebatê، eseh vê xebatê bike!..
- Piştî vê xebatê، xebateke din li cem min heye!..
- Pek، piştî wê xebatê tu eseh vê dikî!

nakin û ji deryayê diqeherin‹ yekî ji wan rê li ber min girt û bi dengekî zivr û hişk ji min re got: tu nirxê vî bajarî dişkênî".

Di wê kêlîyê de min nasî ku ne tenê zarok ji polîsan ditirsin‹ min got û bi hewildaneke mezin ku lerizandina dengê xwe veşêrim: "Ez? Ma min çi kirîye?"

-Pişta te..‹ pişta te ya xûz navê bajêr xerab dike. Tenê birçî û nexweş mîna te dimeşin.

-Bi rastî jî ez birçî û nexweş im.

-Bê fedî‹ tu çawa dikarî bibêjî birçî û nexweş im? Di vê gotina te de êrîşeke eşkere li ser dewletê heye.

-Bibûre‹ bibûre. Mebesta min ne êrîşî ser tu kesî ye.

Tilîya xwe dirêjî rûyê min kir û got: Û rûyê te?..

-Rûyê min‹ Çi bi rûyê min hatîye?

-Li eynikekê binere‹ rûyê te tirş e‹ çima?.

- Ji ber ku bê kar im.

-Bêdeng be. Tu çawa dikarî zagonan rexne bikî?

-Ez?!.

-Hiş be. Devê xwe bigire û ji ber çavên min here. Hişyar be û li kolanan jî negere.

Bilez meşîyam‹ mîna lawirekî ku hinek bi dûv dikevin‹ wisa bilez min berê xwe da mal. Darên kolanan zer bûn û çiqlên wan tazî bûn‹ bê çivîk bûn‹ çivîkan ji hêlînên xwe bar kiribûn û di kerxaneyên şevderî de kar dikirin.

Dema ez dimeşîyam min dît jinek ji zarokekî biçûk dipirse; "çima tu digrî?" Wî jî got; "Zarokan li min da".

Destê xwe di ser serê wî re bir û bi dilovanî got: Megrî‹ yê li te bixe tu jî lêxe.

Kêfxweşîyekê ez girtim‹ Bazê ku di malên xizanan de dijî‹ rojekê wê derkeve‹ bilind bifire û wê asmanê bajêr bidest bixe‹ lê kêfxweşîya min piştî kêlîyekê vemirî‹ ji ber ku li kolanê baweşk hate min‹ polîsan ez girtim û yekser min birin dadgehê‹ yê dadgêr ji min pirsî: Bi rastî tu baweşk hate te?.

Wê kêlîyê ro li derveyî dadgehê mîna çûkekî baskzêrîn bû‹ baweşk hate min û ji dadgêr re min got: Belê‹ baweşk hate min.

Dadgêr bi hêrs got: Bêje dilê te çi dixwaze.

Min jê re got: dilê min tiştekî naxweze..

Dadgêr enîya xwe bi desmaleke hevrîşimî spî baqij kir û biryara dadgehê ragehand. Ez ji hola dadgehê derketim dorpêçkirî bi hejmarek ji zilamên polîs‹ tirimbêleke mîna darbesteke ku bi darên kevn hatibe çêkirin li derve li benda min bû‹ ez veguhezandim qeraxa çemekî ji her heft çeman‹ polîsan li wir min bi werîs girêdan‹ du kevirên giran bi lingên min ve asê kirin û min avêtin çêm‹ noqî avê bûm‹ hema her di wê gavê de li binya avê sekinîm‹ dev û çavên min girtî‹ min hewil dida ku ez xeyal bikim‹ bajarekî dibin asmanên kesk û heyveke reş de dişewite. Dema ku devê min xwest hawar bike û bibêje "Yadê"‹ avê qîrîna wî fetisand û neçar kir ku bêdeng bimîne. Bi vî awayî ez ji baweşkînê bê par bûm‹ lê min hişt ku her sibeh Ro hilê...

werger

Baz

Zekeriya Tamir
Wergera ji Erebî: Aram Hesen

Bazê ku di malên xizanan de dijî، rojekê wê derkeve، bilind bifire û wê asmanê bajêr bidest bixe.

Bavê min berî bi salekê mir، vaye diçim serdana wî û di nav tirbên spî de disekinim. Tirs، xemgînî û şkestinê li xwe didim dîyarkirin، sûret elfatîha bi dengekî lerzok dixwînim، diyarî gîyanê wî dikim. Her di wê gavê de dengê wî tê min û bi hêrs bang dike; “ kuro، fedî bike، çixarê mekşîne”.

Ez li ber xwe dikevim، çixarê dihavêjim، bi panîya pêlava xwe pêlê dikim، dengê bavê min hîn berdwam tê û pirs dike;” ma tu nezewicî?”.

Matmayî jê re dibêjim: “Û çima ez ê bizewicim?!”.

Bi derd û keder dibêje; “zarok xemla jiyanê ne”.

Bi serhişkî û bi rijd jê re dibêjim; “ez nazewicim û naxwazim bibim bav”.

diqîre، bi kerb، ez bilez jê re bi kêf dibêjim: hêrs nebe yabo، hêrs ji bo tendurîstîya te ne baş e”

Hêrsa wî zêde dibe û qîrînên wî bilind dibin، ez bi bez derdikevim derveyî gorîstanê، vedigerim malê، min dît ku yara min çavgirtî li ser têxt dirêjkirî ye، min jê xwest ku goreyên min bişo، got: ez westîyayî me. Min ew serjêkir bêyî ku destên min bilerizin û ro ji asîman qewitand، bi tena xwe li rûzemînê mam، damareke reşereng ya bê dev e، nikare biqîre jî، hespên şeveke kor pêlê dikin.

Bi hatina sibehê re bilez û mereqdarî çûme gorîstanê، lê bavê min bê deng ma، ez neçar bûm ji gorîstanê derkevim، piştxûz û bi gavne kerrxiî li kolanan dimeşîyam. Zilamekî lawaz ku di damarên wî de heskirineke germ ji muzîk û deryayê re dilive، lê polîsên ku ji muzîkê hez



Navê pirtûkê: Vexwendineke Çiyayî Ji Agirî Re
Naverok: Helbest
Nivîskar: Mihemed Bîlal Yûsiv
Hijmara rûpelan: 278
Ji Weşanên Yekîtiya Rewşenbîran Kantona Efrîn
Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo 2017

Navê pirtûkê: Xoce Simayîl "Dînê Bîrewir"
Naverok: Serpêhatî
Nivîskar: Mihemedê Pîrê
Hijmara rûpelan: 156
Ji Weşanên Komîteya Wêje Ya Rojavayê Kurdistanê
Weşanxaneya Şilêr- Qamişlo 2017

Navê pirtûkê: Rênîşandara Dest Ya Partîbûnê
Hijmara rûpelan: 180
Çapxaneya Sîmav- Qamişlo 2017

Navê pirtûkê: Jiyana Min Her Tim Şer
Bû- BERGA 2
Naverok :Nirxên kesane
Nivîskar: Sakîne Cansiz
Hijmara rûpelan: 546
Weşanên Akademiya Jina Azad A Zeynep Kinaci
Çapa Yekemîn : Çapxaneya Azadî 2015
Çapa Duyemîn : Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo 2017

Navê pirtûkê: Girê Şêran (Serhildan)
Naverok: Roman
Nivîskar: Menaf Osman
Hijmara rûpelan: 536
Çapa Yekemîn : Weşanxaneya Aram 2003
Çapa Duyemîn: Weşanxaneya Şilêr – Qamişlo/ 2017

Navê pirtûkê: Nazenîn -1
Naverok:Helbest
Nivîskar: Cindiyê Xizan
Hijmara rûpelan: 188
Ji Weşanên Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê
Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo 2017



Navê pirtûkê: Qulingên Rewanê -Dengbêjî Û Sazbendiya Kurdên Qefqasya
Naverok: Lêkolîn
Nivîskar: Polat Can
Hijmara rûpelan: 306
Weşanxaneya Şilêr- Qamişlo 2017

Navê pirtûkê: Berxên Me
Naverok: Serpêhatî
Nivîskar: Husên Engîzek
Hijmara rûpelan: 138
Çapa Yekemîn 2010
Çapa Duyemîn:Weşanxaneya Şilêr
Qamişlo 2017



Navê pirtûkê: Zindana Amedê -Ji Dîrokê re Rûpelek ji Agir -Cild-1
Nivîskar: Muzaffer Ayata
Werger: Yekta Şoreş
Hijmara rûpelan: 620
Çapa Yekemîn: Çapxaneya Azadî 2016

Pirtûkên derketî

Navê pirtûkê: Manîfestoya Civaka Demokratîk -Pirtûka Duyemîn- Şaristaniya Kapîtalîst (Serdema Qralên Tazî û Xwedayên Bêmaske)
Naverok: Raman
Nivîskar: Abdullah Ocalan
Werger: Rêşad Sorgul
Hijmara rûpelan: 324
Ji Weşanên Mezopotamyayê
Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo 2018

Navê pirtûkê: Manîfestoya Civaka Demokratîk- Pirtûka Sêyemîn- Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê
Naverok: Raman
Nivîskar: Abdullah Ocalan
Werger: Rêşad Sorgul
Hijmara rûpelan: 430
Weşanên Mezopotamyayê
Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo 2018



Navê pirtûkê: Şoreşa Azadiya Rojavayê Kurdistanê-2- Cizîr
Naverok: Dîrok
Nivîskar: Mehmet Emîn Mutlu – Ersîn celîk
Hijmara rûpelan: 316
Weşanxaneya Şilêr – Qamişlo/ 2017

navnetewî‹ lê têne girtin û herdu jî tên kuştin.

Roman pir xweş hatîye hûnandin. Peyv‹ hevok‹ têgîn û derbirîn xweş hatine zimên. Romanek bi zimanê kurdî yê resen hatîye avakirin. Hêja ye ku xwendevanên kurd bixwînin‹ nexasim ku romanên me kêm in û peyda jî nabin. Lê piştî min ev roman xwend hin têbîniyên min li ser nivîskar û şêwazê wî çêbûn‹ dixwazim bi we re par ve bikim:

-Ev roman rastîya civaka Kurd û şoreşa wê pênase nake. Heger em bi çavê biyanîyekî bixwînin‹ em wan nirxên giranbiha yên gelê Kurd tê de nabînin. Em ê civakeke nezan‹ bêrêxistin‹ êlperest di vê serdemê de bibînin û ev bêmafîyeke li çanda gelê me yê berxwedêr û kevnar hatîye kirin. Berî roman bê nivîsîn bi 6-7 salan gelê Kurd bi milyonan li Bakurê Kurdistanê li ser pîyan bû. xwe rêxistin kiribû. Xwe bi hilbijartinan gihandibû perlemanê Tirkîyê. Çawe em ê vê ji bîr bikin û di romanê de nebînin. Gelo M. Uzun çiqasî weke Îvo Andrîç karîye dîroka xwe bîne ziman!!

-Kesatîya Kevokê di romanê de‹ bi tu awayî nûnertîya keç û jinên Kurd ên şoreşger nake. Ne jî nûnertîya evîn û dildarîya keç û xortên Kurdan dike. M. Uzun bi hişmendîya mirovên Ewrupî û lîberal nêzîkî jinê bûye. Kevoka Şervan li gorî hişmendîya xwe avakiriye û bi ku ve xwestîye ajotîye.

-Nebinavkirina erdnîgarîyê û hin navan‹ tirs û reva nivîskarî ya ji dijmin dide xuyan. Li gor min‹ Uzun bi vê reva ji navlêkirinê‹ rêya vegerê ji xwe re li cem dewleta Tirkî hêlaye. Nebawerîya wî bi serketina têkoşîna azadîya gelê Kurd nîşan dike.

-Roman li ser Şoreşa azadîya gelê Kurd e. Lê M. Uzun bi yek peyvê jî nîşan nedaye ku ev têkoşîn bi rêbertîya PKK'ê ye‹ yan ev şervan û qehreman gerîla ne. Ev cihê pirsê ye. Çawe ez romanekê li ser serdemekê û bûyerên wê binivîsim û xwedîyên wê bi nav nekim!!

-Ji hûnandin û bûyerên di romanê de hatîn‹ takekesî û ezîtiya M. Uzun dixuyin.

-Dîmen û wêneyên zayendî-seksî ku di romanê de hatine‹ bandorbûna nivîskar a bi civaka Ewrupî nîşan dide.

-Roman‹ zimanê çîrokbêjîyê serdest e. M. Uzun her gav dibêje: ka em vegerin çîroka Baz‹ Kevok... ka ez ji xwendevanên xwe re bêjim çi hat serê û her wiha. Nivîskar xwe kirîye çîrokbêjê romanê.

Ev têbînîyên min li ser romanê nivîskarîya M. Uzun qels û lewaz nakin. Ew bi rastî nivîskar e. Kedeka mezin daye wêjeya Kurdî. Belkî ew weke romanivîsê hemdem û nûjen jî hatîye binavkirin. Em hêj di gera xwe ya li nasnameya romana Kurdî de ne. Gelek lêgerîn‹ xwendin û lêkolîn divin ta em karibin romana xwe nas bikin.

nîgaş û dîmenên derxistîn re‹ em gerandine.

Em werin ser kesayeta sereke di romanê de (Baz)ê zabit ê fermandar ku sembola mirin‹ kuştin‹ wêrankirin‹ zor‹ xwînmijî‹ dilhişkî‹ talankirin û hemî cûreyên hovîtiyê ye. Ev Baz‹ di demekê ji deman‹ piştî serhildaneke Kurdan li himber Tirkan û têkçûna wê serhildanê û komkujîyên di pey re çêbûyîn‹ ev Bazê ku hingî dusalî ye‹ ji komkujîyê difilite‹ û zabitekî Tirk nahêle hevalê wî vî zarokî bikuje‹ wî dibe û dike kurê dewletê. " piştî bîskekê‹ tiştekî ku di efsanan de tê pê‹ diqewime. Ji nav dûmana devê şkeftê reşahîyek dixuye. Cewrikeke biçûk‹ bi kûzekûzeke ku bi zehmetî tê bihîstin.. ji nav dûmanê derdikeve. Bi dû cewrikê re jî reşahîyeke din‹ zarokekî biçûk ku bi zehmetî gav davêje...". (r-50)

Bi rastî dema min ev beşê romanê (koç) xwend û hovitîya leşkerên Tirkan li ser gelê me û birina vî zarokê du salî.. romana nivîskarê Bosnî-Yogsilavî Îvo Andriç (pira li ser çemê Derîna) hate bîra min. Ev roman di sala 1986'an de min xwend. Romaneke pir biêş e. Îvo Andriç êşa gelê Balqan û hovîtîya Tirkan bi serê wan anî‹ gelekî xurt û bibandor vegotîye. Di vê romanê de hatîye ka çawa Tirkên Osmanî zarokê Balqanan bi kotekî ji wan distandin û dibirin li dibistanên xwe‹ li ser parastina dewletê û nijadperestîyê perwerde dikirin‹ mezin dikirin‹ dikirin misilmanine hişk û olperest‹ paşî ew dişandin welatê bav û kalên wan. Bi destê zarokê wan ew dikuştin û welatê wan talan dikirin. Lehengê romana Îvo Andriç‹ Pira li ser çêm e. Ev pira ku Mehmed paşa ku ew jî zarokekî di piçûkanîya xwe de hatîye revandin‹ li dibistanên Osmanîyan perwerde bûye ta gihaye payeya herî bilind di dewleta Osmanî de. Lê Mehmed paşa zaroktîya xwe ji bîr nekiribû‹ welatê wî di nîgaş û mejiyê wî de mabû‹ ne weke Baz bû. wî xwest ji welatê bav û kalên xwe re tiştekî binirx bihêle. Lewma pirekê li ser çemê Derîna ava dike.

Bazê xwînrêj ê ku li ser tunekirina gelê xwe hatîye perwerdekirin‹ piştî gelek zehmetî û derbdanên derûnî dixwaze xwe nas bike‹ li xwe digere‹ lê kes tiştekî li ser wî nizane‹ lewma berê xwe dide zabitê Simbêlqît ê ew xwedî kirî‹ lavan jê dike ku tiştekî li ser malbat û xizmên wî jê re bêje.. hingî ji axftina zabitê simbêlqît ê li ber mirinê‹ bi xwe hay dibe. (yanî bav û diya min ne di qezayeke trafîkê de mirin? Li wan deran ez sêwî mam. Bav û diya min ji wan in? ez ji wan im?). (r-338).

Kevok‹ keça xwendekara zanîngehê‹ evîndarê wê tevlî şoreşê dibe‹ ew jî di dawîyê de li pey dilketîyê xwe Jîr diçe û dibe şervan. Di şerekî de Kevok birîndar dibe û dikeve destê dijmin. Piştî bi mehan îşkencekirin‹ Kevok dikeve û hew li ber xwe dide. Dibe alîkar ji leşkerên Tirk re û cihê hevalên xwe nîşa wan dide. Dibîne hevalên wê têne kuştin. Derûna wê xira dibe. Di vê pêvajoyê de Baz jî êdî xwe nas dike. Bandora sinc û reftarê Kevokê jî lê dibe. Ew û kevok dixwazin ji welatê mezin birevin û rastîya hovîtîya bûyî bigihînin ragihandina

Gilgamêş desŧ pê dike. Gilgamêşê ku ketîye tarîsŧana dariŧanê‹ diçe û diçe‹ bê wesŧ û navber diçe‹ qonax bi qonax diçe da xwe bigihîne ronahîyê:

"piştî qonaxa nehan hênikahîya bayê bakur li rûyê wî ket‹ lê tarî giran û kûr bû. nepêşîya wî û ne jî paşîya wî dixuya.

Piştî qonaxa dehan‹ êdî ew gihiştibû dawîya rê.

Piştî qonaxa yanzdan‹ tîrêjên berbangê xuya kirin. Û piştî qonaxa donzdan tîrêjên royê mîna lehîykê herikîn". (r-5)

Navê romanê yê dirêj (Ronî mîna evînê‹ Tarî mîna mirinê)‹ belkî têkoşîna gelê Kurd a dirêj‹ ya li himber tarîtî‹ zehmetî‹ koçkirin‹ awarebûn‹ kuştin û birçîbûnê pênase dike. Jixwe ev şer û nakokîya di navbera tarî û ronahîyê de‹ Ehrîman û Ahoramazda de‹ ji felsefa Kurdî belavî cîhanê bûye‹ ji felsefa Zerdeştiyê.

Roman bi zimanekî xweş‹ hêsan û têgihiştî hatîye hûnan. Bi pend û biwêj û gotinên pêşîyan hatîye xemilandin. Ev jî xurtbûna nivîskar û dewlemendîya wî ya zimên nîşan dike. Di herikîna bûyeran de‹ dîroka gelê me ya biêş hatîye pê. Serhildan û têkçûna wan. Komkujî û qirkirin. Wêrankirin û şewtandina gund û bajarên Kurdan. Koçkirin‹ derbiderkirin û awarekirina miletê Kurd li welatan‹ heya digihe serdema me û şoreşa azadîyê ya bi rêbertîya Partîya Karkerên Kurdistanê‹ çendî ku nivîskar nav bi kar neanîne jî‹ lê bûyer û qewmîn cih û navan dîyar dikin.

Di romanê de erdnîgarî (cografîya) nehatîye binavkirin. Ji dewleta Tirkî re‹ welatê mezin û ji Kurdisŧanê re jî welatê çiya gotîye. Ev jî cihê pirsê ye li cem xwendevanan. Gelo çima romaneke ku nivîskarekî Kurd li ser gel û welatê xwe nivîsiye‹ lê bi nav nekirîye!! M. Uzun gelekî pesnê bedewîya xwezaya Kurdisŧanê daye. Gelek peyv û hevokên hevwate bi kar anîne. Di çûna bi rêyekê de wiha dibêje: (rê nexuyane‹ Teng in‹ Nînin‹ Tijî kevir in‹ kelem‹ dirî‹ sŧirî ne‹ xîç in‹ qîş in‹ rê dijwar e‹ rê dirêj e‹ xiloxwar e‹ bi çîv e‹ zinar li pey zinar‹ gir li pey gir‹ pal li pey pal‹ pozik li pey pozik‹ kuç li pey kuç‹ kaş li pey kaş‹ çal li pey çal‹ dar û devî li pey dar û devî‹ av û co li pey av û co tên...). (r-36). Her wiha bi dehên hevokan li ser berf‹ serma‹ seqem‹ germ û dijwarîyên welatê çiya anîne zimên. Dîsa dar‹ av‹ kanî‹ lawir û ...hwd‹ bi

Romana Mehmed Uzun

Ronî mîna evînê، tarî mîna”

Navê romanê yê dirêj (Ronî mîna evînê، Tarî mîna mirinê)، belkî têkoşîna gelê Kurd a dirêj، ya li himber tarîtî، zehmetî، koçkirin، awarebûn، kuştin û birçîbûnê pênase dike.



Ciwanê Dêrikê

Weke em dizanin، nivîsandina romanê li cem kurdan kêm e û dereng dest pê kirîye. Romana yekem bi zimanê Kurdî di salên sihî ji sedsala bîstan de، ji hêla bavê romana Kurdî Erebê Şemo ve hatîye nivîsîn. Gelek navber û demên dirêj derbas bûne û romana Kurdî maye nezayî، yan heger zabe jî، negihaye destan û belav nebûye. Ev rewşa derengketina nivîsîna romanê، vedigere gelek sedeman ku dîroka gelê me wê rave dike. Lê em dikarin bêjin piştî salên notî ji sedsala bîstan. Êdî lib û mib romanên Kurdî derdiketin û navê nivîskarên wan dihatin bihîstin.

Yek ji romanivîsê ku mora xwe li wêjeya Kurdî daye، Mehmed Uzun e. M. Uzun heft (7) roman bi zimanê dayîkê، bi Kurdî nivîsîne، ji bilî gelek berhemên din ku ji lêkolîn، ceribandin û helbestan jî pêk tên.. pirtûkxaneya Kurdî dewlemend kirîye û zimanê Kurdî jî di alîyê nivîsê de xurt û bihêz kirîye. Romana (Ronî mîna evînê، Tarî mîna mirinê) ku di sala 1998’an de çap kirîye، hêjayî xwendin û lêkolînê ye. Ev roman ji 384 rûplan û ji 17 beşan pêk tê. Naveroka romanê li ser têkoşîna azadîya gelê Kurd a li dijî dewleta dagîrker Tirkîyê ye. Du kesatîyên sereke di romanê de hene ku hemî bûyer û qewmîn bi wan û li derdora wan çêdibin، Baz û Kevok، digel çend kesatîyên din ku nivîskar bi rêya wan herikîna mijaran û hûnandina romanê xemilandîye.

Roman bi komek malikên destana

jinan li gor karan cuda dibûn. Destarhêran ji bo jinan‹ karekî giran û zehemt bû‹ lewma wan stran li hev tanîn û bi awazine xweş û balkêş digotin. Stranên di ber Conîkutanê/Dankutanê Re: Bi taybetî jinan stran saz dikirin. Stiranên di ber Kilandin(Keyandina) meşkê re. Stranên di ber paleyîyê re . Stranên Şahîyê: Para bûk û zavayan‹ di folklorîkên ji devê jinan de hebû‹ ji mêj ve jinan şahî û hine bi stranên xwe yên xemrevîn xemilandine. Di warê lixwekirina cilan û xemilandina bi zêr‹ zîv û xişiran de‹ jina Kurd her dem bi rengerengîya cil û bergên xwe û bi xemil û xişirên xwe yên ciwan bal kişandîye ser bedewîya xwe. Ji berê û paş de cil û bergên jina Kurd di dirûvê kevokekê de hatine sêwirandin û nîgarkirin. Di vî beşî de‹ min hewl daye ku balê bikişînim ser rola mezin a jina Kurd di parastin û xwedîderketina li çanda Kurdî û zargotina resen û dewlemend de. Her wekî ku di folklora Kurdî de‹ di nav çîrokên Kurdî de motîveke zêdetir hatîye bi kar anîn‹ bêguman rewşa jinê ye. Di nav van berheman de babeta jin motîveke rengîn e‹ bi taybetî xelasîya jinan. Ev çîrokên Kurdî‹ ji salên kevnare de‹ derbarê rewşa jinan‹ cihê wan‹ berpirsîyarî û erkên wan de‹ gelekî ronî dikin. Çîrokbêjîya Kurdî di vî warî de serkanîyeke gelekî bi kêrhatî ye. Ji bo lêkolîn û xebatên ku li ser jina Kurd têne kirin‹ ev çîrok wek sermayeke mezin in.

Dema em naveroka van çîrokan bi kûrahî hûr-hûr dikolînin‹ em dibînin ku civata kurdî‹ rûmet û cihekî mezin daye jinê. Pesnê jinê‹ bi rojê‹ heyvê‹ gulê‹ jîyanê û can‹ hem firîşte û perî jî dane‹ lê ev yek tenê weke zayendeke mê‹ ji bo xweşî û şahîya evîn û hezkirinê ye. Jinê di pêwendîyên jin û mêran de‹ di warê mêrkirin û zewacê de‹ herdem roleke mezin lîstîye. Ji alîyê din ve‹ civatê hemû jin nexistîye tayekî terazîyê‹ jinên baş û jinên nebaş‹ li gorî normên wan sal û zemanan‹ ji hev cuda kirine. Bi nêrîn û çavên mayî li van herdu komên jinan mêze kirîye. Jina baş rûspî kirîye‹ jina nebaş rûreş û rûtenî kirîye.

Civakê pîvanên başî û nebaşîyê‹ li gorî xêra civat û malbatê‹ an li gorî xêra zarokan‹ an jî li gorî xêra xelasî‹ azadîya jinê kifş kirîye. Jinên baş‹ çawa em di dawîya çîrokan de dibînin‹ xêr û xweşî li ser wan dibare‹ ew ji ber destê zordestan xelas dibin û difilitin. Pirsa xelasîya jinan di nav çîrokên Kurdî de babeteke herî berbiçav e. Di dawîya her çîrokekê de‹ ew bi dilketîyên xwe ve dibin yek‹ diçin digihêjin mirazê xwe û bi hev şa dibin. Jinên nebaş jî‹ di dawîya çîrokê de gelek caran cezayên xwe dibînin û têne kuştin. Di vê babetê de‹ her çîrokeke Kurdî‹ mirov dikare bibêje maf û dadmendîyê belav dike.

Di warê çîrokê de‹ jinên navdar hene ku roleke mezin di jîyana civakî û demê de lîstine‹ wek: Çîroka Zembîlfiroşê ku Xatûn pê re beşdar e. Hem jî navên gul kulîlk‹ lawirên bedew û firindeyan...û hwd. Di civaka Kurdî de‹ navên li jinan bûne‹ wek: Binefşê‹ Qumrîyê‹ Gulê‹ Xibşê‹ Rewşê‹ Şîrînê‹ Nazenînê‹ Şaha‹ Şêlan‹ Arîn‹ Xanimê‹ Xatûnê.. û hwd.

Jinên navdar‹ ji kevn de ta niha‹ di warê huner‹ mûzîk û stiranbêjîyê de pir hene‹ mîna: Meyremxan‹ Eyşeşan‹

Jin û Folklor

Ji mêj ve, jina Kurd bi gelek şêweyan mîna semboleke folklorîk derketîye pêş û kedeke wê ya berbiçav di parastin û dewlemendkirina folklor, zargotin û wêjeya devkî ya gelê Kurd de heye.

Sîlva Elî

Rengînî û dewlemendîya folklora Kurdî ji zû de, bala rohilatnas, kurdnas, folklorîstan û gelek kesan kişandîye. Folklor serborîya civakê ya dîrokî û hunerî ye. Folklor pêşketina zimanê wê civakê nîşan dide. Ev yek hemû di nav folklor de digihin hev, di nav hev de hatine hûnandin, di dawîyê de defîneyeke çandî pêk anîye û bûye serkanîyeke xurt.

Ji mêj ve, jina Kurd bi gelek şêweyan mîna semboleke folklorîk derketîye pêş û kedeke wê ya berbiçav di parastin û dewlemendkirina folklor, zargotin û wêjeya devkî ya gelê Kurd de heye. Wê gelek stran û çîrokên tijî hest, çakzanîn û serpêhatî, li çanda me zêde kirî ye û jîyana me pê xemilandîye. Rola jinê di parastina zimanê Kurdî de pir zêde bû, çiku ew ji mêran bêhtir, di nava malê de dima û têkilîyên wê yên bi derdora civaka Kurd re kêm bûn. Jinên Kurd hemû kar, şahî, xweşî û nexweşîyên xwe bi stranan, bi belge dikirin, ji ber ku bi wan stranan karîbû demê bibihurîne û giranî û zehmetîya karên nava malê sivik bike. Wekî din, di warê xwexemilandin cil û berg û xişiran de, her dem bi cilên rengîn, bedew û lihevhatî bal dikişand ser xwe, ku ev jî jîyanhezîya wê nîşan dide.

Di vê gotar de, ez ê heta radeyekê hewl bidim ku hin alîyên folklora jinane, ya jinên Kurd nîşan bidim.

Her çendî zargotina Kurdî û wêjeya devkî tu cudahîyeke berbiçav nexistîye navbera jin û mêran de, lê belê, piştî çavgerandinekê mirov tê dibîne, ku mêran bêhtir guh dane stranên şeran û dengbêjîya di civatên odeyan de, bi giranî bûye para wan. Li hêla din jî, jinên Kurd stranên girêdayî dîyardeyên civakî saz kirine û ew her dem bi şêwazekî nêzî hest û dilînîyên mirov gotine, ku ev yek -heta radeyekê- heta roja îroj ajotîye. Jinan wêneyên kevn ên jîyana xwe ya rojane bi stiranekê tanîn ziman. Jina Kurd, di ber karên giran re, gelek stran digotin da ku dijwarîya kar bide jibîrkirin, stranên

Tabloya şêwekarekî- Narîn Ebdê

ku îro herî zêde pergal êrîşî ser wan dike jin in. Bi mûzîkê‹ stran‹ sînema‹ cil û berg(moda)‹ madeyên hişbir‹ pere û hê gelek tiştên din ve jin ji rastîya xwe û civaka xwe dûr dixin. Ber bi rêyek çewt û xeter ve tên meşandin. Di vê rêkê de civak û civakîbûn nîne. Di vê rêkê de lêgerîna rastîyê nîne. Di vê rêkê de xweşikî‹ xweşî û başî nîne. Di vê rêkê de şaştî û qirêjî heye. Ê ku ciwanan ji vê rêkê dûr bixe û wan ber bi rêka jîyana civakî ve bîne huner û hûnermend in. Şoreşgerên jîyanê‹ milîtanên jiyana azad in. Bi tehlîlên xurt hunermend dikare jinan ber bi jîyanek azad ve bîne. Encex hunermend dikare wan dîwarên ku di serîyan de hatine avakirin birûxîne. Dîsa van feraset û nêzîkatîyên pergalî bê wate kirin di destê huner û hûnermendan de ye.

Li Kurdistanê‹ di nav civaka Kurdan de pêvajoya îro tê jîyîn rast û di cih de anîna ser ziman yek ji erkê herî bingehîn ê hunermendê Kurd e. Ger bi rastî jî dibêjin em milîtanên vî gelî ne‹ em armanc û hêviyên vî gelî parve dikin‹ wê demê pêwîst e ku her dem di nav hewildan û tevgerîneke şoreşgerî de bin. Destpêkê xwe girtina dest‹ di rastîya civakê de xwe dîtin û hûnera xwe li gor pêwîstîyên civakê meşandin‹ erk û berpirsyarîya herî bingehîn a li pêşîya hunermendên Kurd e.

Kurd û Kurdisatan êdî xwe gihandîye astek ku ji alîyê herkesî ve tê dîtin. Di milekî de ev baş e. Ji ber heya niha tişta dihat pêşxistin ‘tine hesibandin’ bû. Îro ev vala derket. Bes li kêleka wê metirsîyekê jî di nav xwe de dihewîne. Ev jî; ji ber ku azad jiyîna Kurdan ne li gor berjewendîyê serdestan e‹ ji bo wê jî wê bibe armanca êrîşan. Di her milî de wê êrîşên heya niha nehatî pêşxistin wê pêş bikevin. Herî zêde jî wê di milê huner de êrîş zêde bibin. Ji bo wê jî xwe li gor pêwîstîyên demê amadekirin û bi rêbazek şoreşgerî tevgerîn pir girîng e. Di dem û cihê rast de li gel civakê bûn û pêwîstîyên civakê bi cih anîn rihê şoreşgerîya demê ye. Bûyîna hûnermendeke şoreşger vê dixwaze.

xwe dane jîyîn. Ger îro hîn jî civak li hemberî pergalê di nava berxwedan û xwe parastinê de bin‹ berhemên vê çand û hunerê ye. Lê mixabin li kêleka vê gelek kes û derdorê ku xwe wek hunermend dibînin û dibêjin em huner û çandê pêş dixin ber bi bayê pergala heyî ve diherikin.

Ev herikîn ne kêm e. Ev di Kurdistanê de jî di astek jor de ye. Di şert û zirûfên têkoşîna azadîya gelê Kurd de tişta tê jîyîn ne li gor asta bersivdayînê ye. Pêwîst e berî her tiştî her hûnermendek ku xwe şoreşgerê gelê xwe dibîne vê qebûl bike. Ji ber hunera heyî neqebûlkirin û her tim li ya nû gerîn e. Tişta ji xwe re bingeh digire; avakirin û xwe çêkirin e. Ev çêkirin û avakirin jî di çerçoveya civak û civakîbûnê de ye. Ji ber çavkanî civak e. Hunermendeke şoreşger‹ li kîjan welatî dibe bila bibe‹ di kîjan şert û zirûfan de bijî bila bijî‹ xwedî hin erk û berpirsyarîyên nayên guhertin e.

Hunermendek şoreşger bêyî dîrok‹ civakîbûn‹ aborî‹ sîyaset‹ têkoşîn û çanda welatê lê dijî nikare hunerê pêş bixe. Ger‹ bikaribe di van mijaran de û pêve girêdayî li gor pêdivî û pêwîstîyên civakê xwe rêkûpêk bike‹ hingê dikare bêje ku ‘ez hunermend im’ .Derveyî vê ango bêyî ku rastîya xwe di nav rastîya civaka xwe de bibîne‹ nikare ne bibe hunermend ne jî hunerê pêş bixe. Ev tê vê wateyê: her hunermend di heman demê de milîtanê gelê xwe ye. Ji ber nûker û guherîner e. Nabe ku hunermendek ji têkoşîna azadîyê ya gelê xwe‹ civaka ku tê de dijî xwe bê par bike. Dema dest girtinek wiha pêş ket‹ wê demê ew kes ji bo xwe hin tiştan dike. Ango tişta dike ne civakî‹ takekesî ye. Tişta ne civakî ye jî tişta ku pergala sermayedarî dixwaze pêş bixe ye.

Huner bi xwe şoreş e. Tê wê wateyê ku her hunermendek jin jî şoreşgerek e. Ji ber hunermend têkoşîn‹ jiyan‹ hest‹ bawerî‹ hêvî‹ hîskirin‹ xemgînî‹ êş‹ nexweşî û kêfxweşîyên civaka tê de dijî bi hunera xwe tîne zimên.

Em ji stranekê bigrin‹ heya sînemayê ya esas tê girtin ev e. Şano‹ dîlan‹ wêne‹ helbest… Di milekî de hunermend dibe zimanê civaka xwe. Ê ku rihê civakê herî baş nîşan bide hûnermend e‹ ango şoreşgerê jiyanê‹ milîtanê azadîyê yê civakê ye. Bê guman ev hêsan nîne. Ji bo vê di asteke herî jor de hewildan û tevgerîn pêwîst e. Bi rastî jî jîyanek civakî jîyîn pêwîst e. Armanç û ramanên civakê baş têgihêştin pîwest e û di wê çerçovê de ketina nav lêgerînê pêwîst e. Bi rihek fedakar‹ tiştên di civakê de tên jîyîn‹ ev çi baş çi jî xirab bin‹ tevî her cure hewildanê tepisandinê yê serdestan yek gav paş de ne avêtin û agirê têkoşînê her bilindkirin pêwîste. Çawa ku çavkanîya hunermendekî civak e‹ di heman demê de berhemên derdikevin jî pêwîst e ku ber bi civakê ve biherikin. Hunerek civakî nebe‹ nikare xwe li ser pîyan bihêle. Hunermend‹ ji rastxwendina pêvajoyên tên jîyîn jî berpirsyar e. Di mile jîyanî de pêwîst e ku kêm û kûrtasîyên tên jîyîn bi şêwazekî ku bê fêhm kirin ji civakê re nîşan bide. Ev tişt‹ ji hawekirinê dûr e. Ango xwe û civakîbûnê dijî û civaka xwe dide jîyîn. Di vir de tişta esas Xwebûn e. Yek ji beşên civakê

Jina hozan û Şoreş

Evîn Hesen

Huner bi xwe şoreş e. Tê wê wateyê ku her hunermendek jin jî şoreşgerek e. Ji ber hunermend têkoşîn، jiyan، hest، bawerî، hêvî، hîskirin، xemgînî، êş، nexweşî û kêfxweşîyên civaka tê de dijî bi hunera xwe tîne zimên.

Bêguman wateya van her du têgehan، ji bo civakan pir girîng e. Tevî rewşa ku huner tê re derbas dibe، lê em nikarin tişta îro tê jiyîn wekî rastîya civakê bi nav bikin. Ji ber tişta îro tê jîyîn ne li ser navê civakê ye، an jî ne ji bo danasîn û berjewendîyên civakê ye. Çawa ku ev her du têgeh ji bo civakan pir girîng in، dîsa ev her du têgeh di devê mirovan de weke benîşt lê hatîye. Bi taybet jî dema em di bikaranîna têgeha hunerê de dinêrin، em vê rastiyê pir zelal dibînin. Çawa? Bi taybet bi çanda popûler re ev têgeh heta tu bibêjî heya، em bibêjin ji naveroka xwe hatiye dûr xistin û xavilokî kirine.

Yek ji rêbazên herî bingehîn ê pergala sermayedar ku bikartîne û li ser civakan dide sepandin perçekirin e. Perçekirina hunerê jî di asta jor de ye. Bê guman beşên hunerê yê cuda hene، li her dera cîhanê، di nav her civakekê de curbecurbûnek di milê hûnerê de heye. Lê belê curbecurbûn ti carî nebûye sedem ku civak winda bibe.

Tişta îro di sermayedarîyê de tê jîyîn û xwe li ser civakan ferz dike curebûnek ji hev qut، yek yê din nas nake، yek xwe li ser ê din ferz dike û ditepisîne. Dema ev pêş dikeve، em dinêrin ku tiştê pêş dikeve li gor xwestek û berjewendîyên serdestan û pergalê، di dem û cîyê ku ew dixwazin de hin tişt tên jîyîn. Gelo ev di vê germolekê de dê çawa û bi çi helî jina hozan bikaribe ji şoreşê re bibe mak?.

Çanda popûler ku îro xwe li ser civakan ferz dike û hêdî hêdî، bêyî ku bide hîs kirin civakan pûç dike di hemû cîhanê de xwe bi cih kirîye. Ketîye nava xwîna ku di damaran de diherike. Weke ku bêyî wê nayê jiyîn' lê tê nihêradin. Lê em baş dizanin ku civakan bi deh hezaran sal، bi çand û hûnerên

li daxwaza yasayên wergerê ji alîyê her du çandan û zimanan ve ne berhev be‹ bêguman ew berhemê ku dihête wergerandin dê lawaz be‹ dê belengaz be. Ji ber ku yê wergêr derbarî têgehiştina yasayên wergerê de lawaz û perîşan e.

-Her wekû dizanî‹ xwendina zanîngehê xwedî taybetiyên cuda ne ji qonaxên berî zanîngehê‹ her wisa tu jî li zanîngeha Rojava mamoste yî‹ gelo tu rewşa zimanê Kurdî li zanîngehê çawa dibînî?

Bêguman her destpêkek -erênî‹ nerênî- dê encameke xwe ya hemareng hebe. Heger em‹ digel rabûrîya xwe ya dûr û nêzîk‹ tevlî helûmercên îroyîn ku em tê re derbas dibin‹ her wisa dûr ji berçavkirina rewşê ya bi mêjîyekî tevlîhev yê sîyasî‹ yan jî bîrdozî‹ digel hebûna kem û kurtîyên sruştî ku hemî deman hene û dê hemî deman hebin‹ em dikarin bi asanî bibêjin ku rewşa Zanîngeha Rojava‹ di serî de ziman ji hemî alîyan ve li karûbar e.

Piranîya kem û kurtîyên ku hene jî‹ bêguman di van çend salên em tê re derbas dibin‹ ango‹ digel nemana valahîya qonaxên li navbera Dayîngeh û Zanîngehê‹ xweber dê bihêne çareserkirin.Tenê‹ bi xurtî ji me dihête xwestin ku em bi nirxên xwe yên niştîmanî ve durist‹ xwebexş û girêdayî bin.

Belê‹ wekû dihête zanîn‹ bi zanist û zanistîyê ve girêdayî encama her xebatekê‹ her kedekê‹ wekû di rabûrîya mirovahîyê de jî xweş diyar dibe‹ dê encam erênî be.

-Ji bo paşerojê projeyek te heye?

Ji mêj de ye xwedî projeya ferhengeke Bêjenasî (Etîmolojî) me. Di bawerîya min de tenê amadekirina ferhengeke bêjenasî -bikêmanî- dikare bibe şivarêkek ji bo yekgirtina zimanê Kurdî. Xebateke bi vî rengî‹ ji bo yekgirtina zimanê Kurdî temet nan û avê pêdivî ye. Lê mixabin ku rewşa îroyîn ya sîyaseta Kurdî ji bo vê pêdivîyê ne li bar e û ne jî xwedî bersiv e.

Min ev proje di wextê de pêşkêşî her du desthilatên Silêmanî û Hewlêrê kir‹ lê ne erênî‹ ne jî nerênî bersiv jî nehate dayîn. Çend caran li dûv çûm‹ belê ji alîyê deverên peywendîdar ve hîç pûte pê nehate kirin. Di sala 2018'an de‹ her ev proje ji alîyê min ve bo Rêveberîya Xweser ya Rojava jî hate pêşkêşkirin‹ ew jî wek her du desthêlatên Başûr temet ku bersiva min bidin pûte jî pê nekirin. Helbet ev jî ji bo min dide xuyakirin ku nirxên niştîmanî Kurdî hîna pêrgî xwedîyê xwe nehatine.

-Birêz Dildar Şeko gelek spas‹ heger gotinek te ya dawî hebe bi fermo.

Digel spasîyeke ji dil daxwaza serkeftineke bi rûmet ji bo Kovara Şermola û xebatkarên wê dikim.

Her wisa hêvî û daxwaza min ji desthilatê heye ku sîyaseta xwe ya derbarî çanda Kurdî de‹ ser ji nuh de‹ belê bi çavê kirrînê‹ nirxên niştîmanî Kurdî binirxîne û ji dil li bersiveke merdane bigere û di vî warî de biryareke erênî bide.

evin. Yekcar em ramana tiştekî bi vî rengî nekin! Ji ber ku di warê geşkirin û parastina nirxên xwe de pêdivîya me bi tevgereke wisa bêjiyane her nîn e.

-Di warê lêkolnê de astengîyên ku derdiketin pêşberî te çi bûn û te çawa derbas dikirin?

Karê zanistî berpirsîyê dixwaze. Berî dest bi karekî zanistî bikim ez şîyan‹ têgehiştin û çanda xwe misoger berçav dikim. Heger di warê ziman de‹ di çanda min ya niştîmanî û cîhanî de kêmasîyek hebe bi karekî wisa girîng ranabim. Ji ber ku karê zanistî nîşander û mayînde ye‹ ji ber ku şaşî dibin sedemê beravêtîkirina rastîyan û ji ber ku ji alî zanistîyê ve şaşî nayên herê kirin‹ nabe meriv sivkatîyê bi karûbarê zanistî bike.

Her kesekî ku bi karekî wisa rabe pêdivîye şîyana xwe ya van nirxên me gotî berçav bike û paşê biryara xwe bide.

Vêca; ji ber ku li ser bingeha nirxên xwe yên niştîmanî hatime xwedîkirin‹ her wisa di çanda xwe ya niştîmanî û cîhanî de aza û serdest im‹ çi di karê lêkolînê‹ çi jî di karê xwe yê wergerê de hîç carekê tûşî hîç astengîyeke ku nahête çareserkirin‹ nebûme.

-Digel ku ji mêj de tu bi karê wergerê rabûyî‹ lê berhemên te li piyasê nexuyane‹ gelo sedem çi ne?

Dikarim vê pirsê bi kurtayî wisa bibersivînim. Ji ber nebûna sîyasetek û ragehandineke niştîmanî Kurdî bi sedan yên wek min di vê pêvajoya pir aloz de bêdeng û bêserûşûn -varî- çûn. Lê dûr ji pesindarîyê‹ tenê ji bo rastîyekê bihênim zimên dixwazim bibêjim ku çûna her kadroyekî niştîmanî zîyaneke bêveger digehîne gencîneya Kurdî.

-Bi qasî em dizanin tu karê wergerê jî dikî‹ Di nerîna Dildarê Şeko de giringîya wergerê çi ye û çima wergera bo Kurdî lawaz e?

Werger navgîneke ciddî ya veguhestin û belavkirina çandan a li ser tevaya civakan e. Ji ber ku di pêşxistin û nûjenkirina civakan de‹ di berfirehkirina çandan û rewşenkirina mêjiyê mirovan de xwedî roleke erênî û nerênî ye‹ em dikarin bi asanî bibêjin ku werger‹ nirxeke hevpar ya mirovahîyê û pîşeyeke xweristî ye.

Werger di hemî qonaxên mirovahîyê de xwedî roleke berbiçav bûye û berdewam gêre û dêrandina xwe berfireh kirîye. Her ku bi mirovahîyê re teknolojî bi pêş de çûye‹ nirxê wergerê jî qat bi qat zêde bûye. Em dikarin bi dilniyayî bibêjin ku werger‹ her ji serdemên dêrîn de‹ hemî gavan wekû pîşeyeke hevçerx bi rola xwe ve rabûye û di destnîşankirina paşeroja mirovahîyê de‹ wekû rêhbereke zanistî hatîye bikaranîn û dîsa‹ bi dilnîyayî em dikarin bibêjin ku werger‹ di dema me de û di destnîşankirina paşerojê de jî‹ yek ji pîşeya herî binirx û biha ye.

Ji ber çi wergera bo Kurdî lawaz e? Çunke wek her babeteke zanistî werger jî xwedî yasa ye. Heger hat û yê wergêr derbarî yasayên heyî yên wergerê de ne şareza be‹ yan jî‹

çînçîn kirin. Zimanekî wisa ye ku di hemî beşan de zengîn e‹ îro jî ji bo bersivdayna her pirseke hevçerx bêkêmasî berhev û amade ye.

Ji bo zengînîya ziman bihête zanîn hindek pîvan hene. Bo nimûne zimanê Kurdî bi peyvên xwe yên giyanî‹ ango bi peyvên anatomîk gelekî zengîn e. Ev yek ji bo hemî beşên dîtirî jiyanê derbas dibe.

Heger; xebateke durist û ji dil derbarî zimanê Kurdî de li dar bikeve‹ rêya yekgirtin û bersivdayîna pêdivîyên zeman û mekan li ber zimanê Kurdî heta bi dawî vekiriye.

-Di nerîna te de rêbazên parastin û pêşxistina zimanê Kurdî çi ne?

Parastin û pêşxistina ziman ne karekî asan e‹ yekser bi pergaleke sîstematîk ya desthilatdarîyê û bi hebûna bazareke geş ya nıştîmanî ve girêdayîye. Lê‹ ji bo netewên wek me ku ji sîstemeke wisa asayî bi sedsalan bêbehr mane‹ pêvajoyeke dem-diyar ya bi serperiştîya alîyên rewşenbîr û kesên di nirxên nıştîmanî de şareza û pispor‹ her wisa dûr ji destwerdana hişmendîya teng ya siyasî û bîrdozî a yekser‹ belê çi sazber‹ çi jî razber (maddî-manewî) bi alîkarî û piştgirîya peyapey ya desthilatê derfeta parastin û pêşxistina ziman û tevaya nirxên nıştîmanî Kurdî misoger dibe.

Di serî de ziman‹ geşedana tevaya nirxên nıştîmanî girêdayî bi hişmendîyeke misoger ya nıştîmanî ye. Bi hîç şêweyekî ji şêweyan‹ nabe em ji bîr bikin ku dijminên me di sîyaseta xwe ya asimîlasyonê de bi serkeftin.



Di vê serkeftina (ji bo me) nerênî ya dijminan de‹ bedena me ya nıştîmanî ji hev belawela bû‹ hemî parsûyên me ji cihên xwe şemitîn û mêjiyê me yê nıştîmanî bi hemî ber û gulîyên xwe ve‹ di encama gelek salên dirêj de bi aveke gemarî hatin avdan‹ hatin şûştin‹ hatin şêlûkirin.

Di vê pêvajoya îroyîn ya netewa me de û her wisa di karûbarên amadekirina bingeha nirxan ya li ser bingeha nıştîmanî Kurdî de‹ hergîz nabe em bi kar û tevgêreke amatorane rabin. Hergîz nabe bi vac (mantiq)eke bêjî (!) ku dûr be ji têgehiştin û vedana sruşt û erdnîgarîya nıştîmanî Kurdî em tev bigerin

Di rewşa me ya îroyîn de‹ ji bo amadekirina bingeha nirxên xwe divêt em gelekî hestyar û tevgera me ya amadekirina bingehê -bêkêmasî- pisporane be.

Bi kurtayî û bi taybetî‹ li hember her sê zimanan (Farisî‹Erebî‹ Tirkî)‹ ji sîyaset û karê adaptasyonê em dûr bik-

karanîn‹ ji ber vê çendê piştî demekê axaftina bi zimanê xwecihî kêm dibe û wirde wirde peyv têne ji bîr kirin‹ mêjî tê asîmîlekirin‹ xwendina bi zimanê bindeşt giran dibe‹ tamsar dibe û her wisa wekû navgîna rojane zimanê xwecihî ji holê radibe. Ev yek jî nivîskar û rewşenbîrên welatperwer ji alîyê peyvan de tengav dike û dibe sedema lawazîyê di darijtina berheman de.

Lê dîsa jî em nikarin bibêjin ev dîyarde ji bo Kurdî têper e. Çunke; digel sîyaseta asîmîlasyonê û derxistina gelek aştengîyan li pêşberî Zimanê Kurdî‹ bi dilnîyayî dikarim bibêjim ku zimanê kurdî zimanekî zindî ye û di aştê bersivdayîna her pêdivîyekê de ye. Ango; ji bo darijtina her babeteke zanistî‹ zimanê kurdî berhev e û bi asanî têrê dike. Bi kurtayî‹ qelsbûna berhemên ku derdikevin piyasê‹ ne ji jarî û lawaziya zimanê Kurdî ye‹ belkû ji belengazîya ziman a kesan e.

-Tu zimanê Kurdî di aştekî çawan de dibînî?

Her erdnîgarîyek li dûv helûmercên xwe yên siruştî peyvan diafirîne û di pêvajoyeke dirêj de‹ li dûv helûmercên wê erdnîgarîyê ziman durist dibe.

Li dûv raporên ku derbarî zimanan de heta niha derçûne‹ îro li cîhana me bêhtir ji 3 hezar ziman hene. Belê piranîya van zimanan di gorepana jiyanê de her wekû nîn in‹ bênav in‹ bêdeng in û heta hebûna wan jî bûye cihê gumanê. Gelek ziman jî qonax bi qonax di encama şer‹ hêriş û sîyaseta dagîrkirin‹ mêtingerî û tunekirinê de ji holê hatine rakirin. Temet ku dihête dîtin‹ îro‹ di gorepana jîyana me ya hevçerx de‹ bi saya hebûna pergala dewletbûnê hindek ziman gelekî derkeftine pêş û di jiyana rojane ya mirovahîyê de bi berfirehî dihêne bikaranîn. Piranîya van zimanan jî wekû Latînî dihêne binavkirin.

Xwedîyên evan zimanan‹ ji ber ku her ji serdemên dêrîn de ji bo nasîna gerdûna me tevgerîyane‹ siyaseta dagîrkirin û mêtingerîyê jî bi wan re bêwext bi pêş dikeve. Ev yek jî dibe sedemekî sereke ku evan zimanan nekarîn qonaxên sruştî yên afirandina peyvên sruştî û durisbûna ziman ya li ser bingeha sruştîya xwe mezin bibin û qonax bi qonax bijîn.

Digel berfirehbûna gorepana şer‹ teknîka şer jî dihête guhertin û digel pêşdeçûna teknîka şer teknolojîya amûrên şer jî bi pêş de diçe. Aha di vir de alîyên dagîrker ji bo destnîşankirina navên tektîk‹ teknîk û amûran pêdivî bi peyvan dibînin û her wisa zimanên xwe bi têkelkirina peyvên xwecihî yên mêtingehan zengîn û çareser dikin.

Belê hindek ziman hene ku pêvajoya jîyana sruştî qonax bi qonax jîyane‹ li dûv pêdivîyên her serdemê peyv afirandine‹ di jiyana rojane de bikaranîne û bi rêya pîşe‹ wêje û şaxên dîtirî jîyanê ji serdemekê bo serdemên dahatû tomarkirine‹ veguheztine.

Yek ji van zimanan jî Kurdî bi xwe ye. Zimanê Kurdî di hemî qonaxên jîyanê re bi şêweyekî herî sruştî derbas bûye. Li dûv pêdivî û helûmercên her serdemekê afirandîye‹ bikaranîye‹ tomarkirîye û veguheztîye. Zimanê Kurdî li dûv hemî beşên jîyanê hatîye

Medreseya me ya Kurdî jî hebû‹ salane bêhtir ji 60-70 feqîyan li gundê me dibanîyan. Her wisa fêrgeha seretayî ya dewleta tirk jî li gundê me hebû. Bi kurtayî ez jî yek ji ew derçûyên ji medreseya kurdî me.

Piştî têkçûna şoreşa Êlûnê ya li Başûr‹ li Bakûrê welêt yekser tevgereke nuh ya Kurdî dest pê kir. Wekû her gencekî Kurd her di destpêkê de di vê tevgera nuh de min jî cihê xwe girt. Di 7'ê Rêbendana 1980'an de ji alîyê hêzên dewletê ve digel kekê xwe yê biçûk (Memo) hatim girtin. Piştî 27 mehan‹ ango di 19'ê Adara 1982'an de ji girtîxaneya Amedê tahliye bûm û her di vê mehê de min karî xwe bigehînim Başûrê welêt û wekû pêşmergeyekî beşdarî şoreşa Gulanê bûm.

Pêşmergetîya min ya di nav rêzên PDK'ê de heta bi sala 1995'an domand. Ji ber rûdana şerê navxweyî ya di sala 1995'an de min dev ji karûbarê rêxistinî berda. Niha‹ wekû pêşmergeyekî dêrîn li ser mêlakê YNK'ê xanenişîn im.

-Ji ber ku tu hem di warê ziman de hem jî di warê wêjeyê de dixebitî‹ gelo di navbera van her du alîyan de girêdaneke çawa heye û berhemên ku derdikevin‹ ji ber çi di alîyê ziman de qels in?

Di destpêk‹ di geşbûn û di pêşdeçûna mirovahîyê de ziman û wêje du hêmanên sereke û xwedî rolên herî bingehîn in. Civak‹ li dûv pêdivîyên xwe‹ her wisa li dûv pêdivîyên teknîkî yên zeman û mekan peyvan diafirîne û bi rêya hindek mijar û têkilîyên pîşeyî‹ dilênî‹ hestyarî wekû evîna yektayî‹ evîna dutayî şayîk dike û di warê jîyana rojane de bi kar dihêne.

Ji ber ku jiyan gorepana pîşe ye‹ bi jiyana rojane ya civakê ve girêdayî hêmaneke jîyanewerî ya bi navê `Huner` jî heye. Li hember her rûdaneke -çi sruştî‹ çi nasruştî‹ çi civakî‹ çi jî netewî- ev hêmana bi navê `Huner` bi şêweyekî herî sruştî yekser derdikeve holê û li dûv helûmercên heyî -çi devkî‹ çi nivîskî- bi karûbarê xwe yê darijtin û tomarkirinê radibe.

Aha di vir de huner rola pirdeke mayînde ya mêjûyî di navbera ziman û wêje de dilîze û her wisa ev her du hêman‹ ango ziman û wêje di warê pêşdeçûn‹ tomarkirin û veguheztinê de hev xwedî dikin û ji bo zayîndeyeke berdewam hevdu avis dikin.

Her ku zeman bi pêş dikeve wêje jî‹ ji bo bersivdayîna arîşeyên zeman li peyvên nuh û li afirandinên taze digere. Her ku pêdiviya wêje bi peyvan çê dibe‹ di encama tevgera civakê ya afirandina peyvan de ziman jî‹ ji bo tomarkirin û veguheztina berhemên serdemekê bo serdemên dahatû xurt û berhev dibe. Belê girêdaneke wisa sruştî‹ yan jî xwerîstî di nav van her du hêmanan de bi vî rengê me gotî‹ heye.

Vêca em bihêne ser qelsbûna berheman ji aliyê ziman de

Ev rewş‹ li tevaya welatên mêtingeh asayî ye‹ sruştî ye. Ji ber ku zimanê serdest di jiyana rojane ya civakê de berdewam li kar e û zimanê xwecihî qedexekirî ye‹ tiştekî zor asayî ye ku berhemên bi zimanê xwecihî dê qels bin. Çunke; zimanê resen yê civakê di jiyana rojane de nahête bi-

zimanzan û lêkolîner Dildar Şeko:

ziman û wêje di warê pêşdeçûn‹ tomarkirin û veguheztinê de hev xwedî dikin û ji bo zayîndeyeke berdewam hevdu avis dikin

Hevpeyvîner: Aram Hesen

-Birêz Dildar Şeko‹ ji ber veqetandina dema xwe bo me em spasîya te dikin. Di serî de em dixwazin bi çend hevokan xwe bi xînerên kovara Şermola bidî nasîn.

Jiyaneke hemareng ku piştî 65 salan jî‹ bo hîç wardemeke ji jiyana xwe ne poşman im. Di sala 1955'an de li Tilêlûna Derbêsîya Binxetê hatim dinê. Ez du salî bûm dê û bavê min vedigerin gundê xwe û her ji temenekî pir biçûk de li cem Mele Evdirehmanê Kinik min dest bi xwendina xwe ya ayînî kir. Hêjayî gotinêye ku Mele Evdirehmanê Kinik li gundê me rola fêrgeha seretayî didît û tevaya zarokên gund di bin destên wî yên pîroz re derbas dibûn. Bi destûra we‹ dixwazim bi rêya kovara we re yekemîn mamostayê xwe Mele Evdirehmanê Kinik bi bîr bihênim û malavayîya vî xweş mirovê welatperwer bikim.

Navê gundê min Tizyan e‹ yek ji 33 gundê Surgiciyan e. Li vî gundî‹ bi serperiştîya Mala Seydayê Mele Abid

Jêder û çavkanî:

(1)- Naveroka vê gotar bi zarê Soranî di govara Raman de، Jimar 28، sala 1998، çirya yekem، bi navûnîşana Deq û Xwêner le Rexney Edebîy Hawçerxî Rojawada hatiye belav kirin. Lê gotar ji rengê Soranî derketiye ji ber ku hin zanyariyên nû û bi ser ve zêde bûn.
(2)- Z. Reşîd Zîlo (2011): Fî Alqîraa we Nezzeriyet Alteleqî، https://www.academia.edu/.
(3)- Raman Selden: A Reader's Guide to contemporary literary theory، 1985[page:4].
(4)- Binêre li heman serekaniya jimara (1) [rûpel 3].
(5)- Dr Abdê Hacî (2008): Çend Tiyorekên Rexna Edebî ، çapxana Xanî، Dihok. rup105.
(6)- Binêre li govara Yekgirtin[jimar 12، sala 1990 [rûpel 118].
(7)- Binêre li govara El- Areb wel fikr El-Alemî العرب والفكر العالمي، jimar 12، Payîz 1990 [rûpel 66].
(8)- Binêre li govara El-kerkil: 1985 ، الكرمل[jimar 17، rûpel 158].
(9)- Roland Barthes، the death of the author، translated by Richard Howard، UbuWeb | UbuWeb Papers.
www.tbook.constantvzw.org/wp-content/death_authorbarthes.pdf.
(10)- Roland Barthes، the death of the author .
artsites.ucsc.edu/faculty/Gustafson/FILM%20162.../barthes.death.pdf
(11)- Binêre li serekaniya jimara 3 [rûpel 117].
(12)- Binêre li heman serekaniya jimara (1) [rûpel 59].
(13)- Binêre li heman serekaniya jimara (3) [rûpel 113].
(14)- Binêre li pertûka: El-luxe El-saniye[ya nivîser Fadil samir، Beyrût 1994 [rûpel 129].
(15)- Roland Barthes (1964): Elements of Semiology، 1964، publ. Hill and Wang، 1968. The first half of the book is reproduced here.
https://pdfs.semanticscholar.org/.../b85a43033826bb00292d76f6b6e...
(16)- Binêre li heman serekaniya jimara (1) [rûpel 108-109].
(17)- Raman Selden: The theory of cridicism، Longman، London، 1988[page 187-188].
(18)- Binêre li heman serekaniya jimara (1) [rûpel 108].
(19)- Binêre li heman serekaniya jimara (1) [rûpel 108].
(20)- Binêre li heman serekaniya jimara (1) [rûpel 108].
(21)- Robert Simahol: Tiyoriya El-Istiqbal (نظرية الاستقبال - Reception theory)، wergêrana: Re'id Cewad، Laziqiyê [1992].
(22)- Wiliam Ray: "El-le'na El-Edebî-المعنى الأدبي"، wergêrana: Yûsif E'zîz، Bexda، 1987 [rûpel 44].
(23)- Binêre li govara (Alem El-fikr : عالم الفكر)، jimara yekê û duwê، sala 1994، Kuwêt [rûpel 483].
(24)- Binêre li serekaniya jimara (3) [rûpel 112].
(25)- Binêre li serekaniya jimara (1) [rûpel 125].
(26)- Binêre li serekaniya jimara (15) [rûpel 179-180].
(27)- Raman Selden: serekaniya jimara (1) [rûpel 125].

- Jonathan Culler، Saussure (London: Fontana، 1976; rev. edn.: Ithaca، NY: Cornell University Press، 1986)، an introduction to his thought and influence.
- Roger Fowler، Linguistic Criticism (Oxford: Oxford University Press، 1996)، a valuable introduction to language and the linguistic dimensions of literature.
- William Ray، Literary Meaning: From Phenomenology to Deconstruction (Oxford: Blackwell، 1984) develops a convincing narrative about different critical schools' approaches to meaning in literature.
- Jonathan Culler، 'Poetics of the Novel'، Structuralist Poetics: Structuralism،Linguistics، and the Study of Literature (London: Routledge & Kegan Paul، Furt 1975.
- M. A. K. Halliday، Explorations in the Functions of Language (London: Arnold، 1973)، essays relevant to literary studies. Verlaine، Paul 59
- Jean Genet، Paul Ricoeur، Roland Barthes.

petence».

2- Stanly Fish wa dibîne ku xwêner bersiva bêjeyên rastê dide‹ û divê bizanê aya ev riste wêjeyî ye yan ne? Ev tiyorî jê re tê gotin «The reader's experience» ango ezmûnkariya xwêner.

3- Iser and Jauss dû nivîserên Elmanî‹ ku pişt bi felsefa diyardenasî الظاهراتية girê didin û hewl didin ji bo wesfkirina kirdara xwendinê bi riya hişyarîya xwêner‹ her wiha Jauss (Yawus) nirx û bihayekî bilind dide xwêner‹ weku dibêje: (26) "xwêner navbij e di dîroka wêjeya nû de".

4- Jakubson Kuler hewl dide bo damezrandina tiyorîya bunyadgerane buwara ravekirinê‹ ku kar dike bo vedozîna peyrewan di nav stiratîcîyên xwêner de‹ her ew jî dizane ku ev stiratîcîyên han bi xwe dikarin şîrovekirina ciyawaz bênin.

5- Norman Holland and David Bleich du nivîserên Emrîkîne‹ wa dibînin ku xwendin wek piroseyek ya kirdarek pêtivî û daxwazîyên xwêner razî dike‹ ku her ev jî li ser saykolocîya xwêner terkîz dike.

6- Roland Barthes ku şahîyê bi kotahîkirina bunyadgerîyê dike‹ wa dibîne ku deselata dahênanê watayan dide xwêner ji bo vekirina têkist li ser yarîkirin û lîstineke bêdawî ji şîfreyan.

Bawerîya mirov derbara tiyorîyên xwendin û xwêner çi be‹ bêguman‹ her ew bi xwe êrîşeke rasteqîne ye beramber zalbûna tiyorîyên têkistnasî (the text-oriented theories of new criticism) û rexneya nû û formexwazî (formalism)‹ ku em nema dikarin axaftinê buwara wataya têkist bikin bê beşdarbûna xwêner‹ ango "we can no longer talk about the meaning of a text without considering the reader's contribution to it.". (27)

Encam

Mebesta min a dawî ji vê gotarê‹ dixwazim wê rastîyê bêjim ku xwênerê Kurd rola xwe di nirxandina têkista Kurdî de di hemî buwaran de (wêjeyî‹ dîrokî‹ zanistî‹ zimannasî‹ ..) nabîne‹ lewra jî nivîserên bê-armanc pênûsa xwe di têkistên xeyalbazane de tûj dikin. kovarên me jî di nav komek têkistên bê-armanc û bêserûber de noq dibin. Çi nivîsîna heyî‹ eger rola xwe‹ bi peyvekê jî‹ di guhartin û pêşketina zanyarî de‹ yan bîrmendî de‹ yan zimanvanî de yan di her buwarekî de nebînê‹ çarenûsa wiha nivîsar bê-ayinde ye. Em bihêvî ne ku xwênerê rewşenbîr ji nû ve diyar bibe û rola xwe bi rexnesazîyeke dûrbîn bibîne‹ û têkistên saxlem ji yên seqet vewejêre‹ rastî ji nerastîyan derbixe‹ dizên peyvê ji xizmetkarên peyva rewa cuda bikê. Rexnesazîya wiha zanistyane dibe hokarê pêşketina wêje û têkista Kurdî ji gelek alîyan ve. Lê ne ku rexnegir kêmasiyên biçûk mezin bikê‹ û çavê xwe ji başîyan miç bikê‹ ev jî bêwujdanî ye.

dibêjin Wolfgag Iser ji vê re dibêje: diyalîktîka afirandina berhest (22) (جدلية الخلق الملموس). Iser û Engordin‹ herdû zana‹ wa dibînin ku têkist ji birrekî komek pilandanan pêkhatîye û divê xwêner van planan bindestê xwe bike.

Rol û erka van planan bibine handerê xwêner ji bo destnîşankirina rastîyan. Bêguman rola zanîn û zanyarîya pêşîne ya xwêner tiştekî bingehîn e bo vî kirdarî "wek çawa ev plan şêweyekî vale ye‹ divê xwêner bi zanyarîyên xwe van valebûna dagire. Xwêner di vê biwarê de li ser dû astan kar dike‹ ew jî ev in:

1 -Hîç cure aşnayîyek ji alî xwêner ve peyda nabe‹ eger şarezabûnek û zanyarîyeke wî ya temam di ziman û form û naveroka vê têkistê de nebe‹ ji ber ku nêzîkayîya xwêner li gel têkist her bi rêya têgeyandina zimanê taybetî yê vê têkistê.

2 -Divê xwêner bi şêweyekî taybet vê têkistê bixwîne‹ ji ber ku her xwendinek hewldaneke ji bo gihandina wate û ravekirina wê. Ev jî her ew e ku xwêner bi şêweya bîr û bawerîya xwe têkist ji nû ve dinivîse‹ li gor asta rewşenbîrî‹ zimanvanî û temen‹ bo wategihandin û ravekirinê. Gerek em vê yekê jî bêjin ku ev bîrûra ji alî Valîrî û Jakobson û Gerard Genette diyar e. Ew jî ew e ku xwendina têkist nivîsîneke nû ye ku her ev jî kar dike ji bo damezrandina rewanbêjîya xwendinê. (23)

Eger her xwênerek bi awayekî taybet rexnegir e‹ weha jî divê ferelayenî di vê rexnê de bête peydakirin‹ wata gelek dibistanên hemelayen û hemereng û ciyawaz di rexneya edebî de diyar dibin‹ wek rexna dîrokî û rexneya riyalîstî û rexneya klasîkî‹ û bunyadgerî û paşbunyadgerî‹ formalîzim û rexneya nû li Brîtanya. Belê di nav salên dawî de rexna xwêner û rexnesaziya jinê (Feminist criticism) jî hat meydanê.

Li vê derê‹ em wê yekê ji bîr nekin ku têgeya xwendinê di gotar û axaftina rexneya wêjeyî de giringiyeke taybet wergirtîye û divê ciyawazî li navbera kirdara xwendinê û xwêner bête kirin‹ ji ber ku her xwendinek şêwazkarîyeke taybet werdigire û "ne ku her ji xwênerekî ta xwênerekî dîtir ciyawaz e‹ lê belê ji alî heman xwênerî ve û li heman têkist de tête guhartin.

Bo nimûne‹ dibe heman têkist bi çend car xwendin ji alîyê yek xwênerî ve‹ her car û ji xwendinekê ta yeke dîtir‹ komek têbînîyên nû û ciyawaz berçav bikeve‹ ku reng e di qûnaxa yekem ya xwendina heman têkist de hest pê nehatibe.". (24)

Îcar‹ xwêner‹ di nav lêkolînên wêjeyî yên van salên dawî de‹ cihekî giring û binirx wergirtîye. Bîrdozên tiyorîya rexneya xwêner‹ herçen de ciyawazîyek di nav wan de heye‹ belê hemû li ser yek bîrûra wa dibînin ku xwêner hêzeke rûnake û sereçavîya dawî ye bo wate û dîroka wêje.

Her yek ji van bîrdozan cure xwênerekî taybet‹ li pêka bîr û bawerîyên xwe‹ pêşnîyar dike: (25)

1- Michael Riffaterre bawerî bi wî xwênerî têne‹ yê ku hêz û taqeteke wî ya taybet di biwara wêje de heye û jê re bi Ingilîzî dibêje: «literary com-

niha. Xwendin «niha»ye‹ belê têgeh û têbînîyên rewşenbîrîya me di bîra mede ne. Em di vê çarçoveya dîrokî de dikarin li wê têgehiştinê bigerin ku ronahîyeke nû ser têkiſteke kevin bavêje. Yawus (Jauss) core dîrokeke nû pêşxiſt ku li ser bingeha tiyoriya Gadamer druſt kir. herweha bayex û guhdana xwe dananê ser têkiſt‹ yan jî nivîser‹ belê li ser xwêner.(17)

Ev bayexdan û qîmetdan bi dewra xwêner di axaftina rexneya hevçerx ya Rojava de bû hoya druſtkirina rêreweke nû di meydana rexnesaziya wêjeyî de‹ ku jêre dibêjin: "rexneya xwêner- tiyoriya xwêner- tiyoriya bersivdana xwêner: Reader-oriented theories)‹ herweha (tiyoriya wergirtinê: Reception theory).

Hêjayî amaje pêkirinê ye ku berî geşbûna tiyorîyên xwendinê‹ sîmyotîkzana gaveke pêşketî di vî warî de dan. Embirto Îko kitêbek bi navê «Rola xwêner- 1979» danî‹ ku nivîsîna gotarên vê kitêbê vedigerine sala 1959. Îko weha dibîne ku hindek têkiſt vekirîne‹ wek: (Hişyarbûna Fînegan) ku têde dozê ji xwêneran dike ji bo beşdar bibin di watahênanê de‹ hind têkiſtên dîtir hene‹ girtî ne wek (çîroka polîsî) ku pêwîſtî bi bersiva xwêner heye. (18)

Rexna xwêner wiha dibîne ku "wataya têkiſt xwebixwe nayê druſtkirin".(19)

Lewra pêwîſtî bi hebûna xwêner heye ku bibe hokarekî karîger di nav têkiſt de‹ ji bo geyandina wata.

Pirsyareke dîtir heye‹ ew jî dibêje: Tu kîjan xwênerî dixwaze‹ yan jî xwêner kî ye.

Gerald Prince bersiva vê pirsyarê dide û weha dibîne ku du core xwêner hene:

1- Xwênerê sava û tembel.

2- Xwênerê serpişk (ideal) ku gelekî hûrbîn e‹ û dikare li her tevgereke nivîser bigihê.

Rexnesazê bunyadger‹ Jonathan Culler bi xebateke gelek rabû ji bo giringîyê ji têkiſtê raguhêze bi ser xwêner de‹ û di wê bawerîyê de ye ku em dikarin deſtûr û yasayên ravekirina têkiſt deſtnîşan bikin. Eger em deſt bi damezrandina qewareya ravekirinê bikin‹ ya ku di çarçoveya taqeta xwênerê şareza de ye‹ di vî barî de‹ em dikarin wan pîver û kirdarane jê re danin‹ ku dibine rêxweşkerê van ravekarîyan‹ ango: xwênerê şareza dizane çawa di nav têkiſtê de biçe‹ û çawa li watayên wê bigihe ji bo biryara xwe di ravekirina şiyaw û neşîyaw de bidê. Lewra Jonathan Culler.. wa dizanê ku bunyad ne di sîſtima têkiſt de ye‹ lê belê di sîſtima proseya ravekirina xwêner de ye. (20)

Ev jî wa didê ku paşbunyadger giringîya xwe didine "têkiſtkirina xwêner (21)- تنصيص القارئ".

Xwêner‹ li dema xwendinê‹ bi çalakîyeke bîrî û zimanvanî diçe nav tîp û bêje û riſte û rêzên têkiſtê de‹ ji bo hind akam (encam) bi deſt bênê. Ev kêşeya han wa dide xuyanîkirin ku her çeşin têkiſt ya her core û nifşek ji têkiſtên diyar (wêjeyî‹ zaniſtî‹ siyasî‹ abûrî.... h.t.d) core xwênerekî taybetî jêre divê‹ bi mebeſta pêkhatina lêbanînek navber xwêner û têkiſt de. Ev core pêwendî bi awakî cedelî xwe diyar dike‹ ku zanayekî Elmanî‹ jêre

Li nik wergêrekî dîtir weha hatiye: ‘’dayikbûna xwêner pêwîst e li ser hisabê mirina nivîser be’’ ((The birth of the reader must be at the cost of the death of the Author’’ (10)

Di vê bawariyê de rexnesazê Îtalî‹ Umberto Eko dibêjê: “xwêner di xwendina têkisteke diyar de‹ careke dîtir wê têkistê dadirêjê (drustdikê‹ ava dike)”.(11)

Jacque Derrida pêşrewê rexna hilweşêngeriyê wa dibîne ku “têkist divê ku ji hev bête vekirin û bête xwendin‹ ji bo ku ew bunyada wê yî bêhevta diyar û xuyanî bibe”.(12)

Ev wa dide ku rave û tefsîrkirina her têkistek pêwîstî bi xwênerkî xweyî taybetî heye ku bikarê di astekî zimanvanî û zanyarî de hinek armanc ji têkista xwendî bidest bênê. Ev ast ji xwênerekî ta xwênerekî dîtir ciyawaz e‹ ji ber ew pêwendîya navbera xwêner û têkist de heye‹ her weke Roland Barthes dibêjê:

“Divê ku xwêner di têkist de xweşîyekê vedozê (13)- يكشف عن لذّة”، wate: xwêner li gor çêj û zewqa xwe wan têkistane hildibijêre. Roland Barthes giringiyeke zor dide rola xwêner li ser hisabê nivîser‹ lewra dibêjê:

“Lidayikbûna xwêner bi mirina nivîser ve girêdayî ye”.(14)

Xwênerê Bartheshes di çûna xweyî nav têkist de azad e‹ herweha serbest e di girtin-إغلاق û vekirina têkist de ligor guhdarkirin li mebesta nivîser‹ Barthes hîç bayexek nadê hokarên dervî têkist‹ wek: (serçawe‹ daner yan nivîser‹ siyaq û çarçêweya dîrokî û civakî). Herweha hewldide ku pîver (المعيار) û amrazên rêbazkarîyê yên zimanvanî û sîmyolojî bikar bênê. Di pertûka ((Regezên Sîmyolojî)) de Barth rola ziman wek tiştekî navbij navbera deng û bîrmendiyê de‹ ku di yekîtîya herdûkan de pêktê‹ her di heman dem de wan ji hev vedikê‹ ango ((The language is an intermediate object between sound and thought: it consists in uniting both while simultaneously decomposing them. (15)

Di rexnesazîyê de em wa dibînin‹ ku têkist bersivdana xwêner bi tevayî kontrol dike‹ belê ji alîkî dîtir ve “çalakîya xwêner serekî ye” . (16)

Rexnesazê Ingilîzî‹ I.A.Richards wek rexnesazekî payebilind di “rexnesazîya nû (new criticism)”de wa dibîne helbest (şi’ir- poetry) dikare deskarîyeke berdewam bi ser mejîyê xwêner de bixe‹ Jonathan Culler serinc (têbînî)ya xwe derbarê pêkarîna wêjeyî ya xwêner didê. Di vê serdemê de Hanz Robert Yawus wa dibîne ku temenê berhemê wêjeyî dirêj dibe bi merca ku ravekirina koxwazî ya gelek nifşên xwêneran di bi wan re vê berhemê de li holê hebin.

Her xwêner li gor asoyên xwe yî pêşbînî (Horizons of expectations) temaşe li berhema wêjeyî dike. Hêja ye em bêjin jî‹ ku kartêkirina mezin ya felsefa hirmontîk (hermeneutics) bi ser Yawus de hate sepandin‹ bi taybetî‹ ya Hanz Georg Gadamer ku tiyorîya istatîkî li ser bineçeya felsefa Heidegger pêşxist. Heidegger danayî di hebûna mirov de dibîne‹ wata em nikarin siruşta dîrokî ya barê mirov li pişt xwe bihêlin. Gadamer wa dibîne xwendin hewldaneke bo dagirtina wan valayîyên navbera berê û

Bo pênasekirina têkist û ravekirina wê‹ gelek bîr û rayên cuda li meydanê hene: Aya têkist tenê wutara zimanî ye? yan ji têkisteke dîtir hatîye? Belê her pênaseyek ji wan li gor pêkarîna ebistîmî û bîr û bawrîyên xudan pênase tête danîn. Lewra‹ zaraveya têkist alozîyek di nav rexna nû de peyda kir‹ ji ber ku ji wataya xwe ya ferhengî derketîye û hindek watayên nû wergirtîye‹ ku ew bi xwe bayexekî felsefî û zimanvanî û rexneyî heye. Şêwexwazên Rûs (formolîstên Rûs) û Bazina Prague ya zimanevanî (The Prague Linguistic Circle (Roman Jakobson in cooperation with Nicholay Serghey Trubetzkoy and Serghey Karcévsky‹ B. Tomaşfiskî û Bokarîf) karîn koda têkist ji hemû astên ciyawaz ve diyar bikin û bingeha têkistan danin‹ bo vê yekê‹ zanayê Sovyêtî‹ Mikhail Bakhtin dibêje: "Li pişt her têkistekê‹ sîstimeke zimanvanî heye". (6)

Pol Rîko di pênaseya têkist de dibêjê: "Têkist peyvek e bo her wutarekê yan axaftinekê ku di rêya nivîsînê de cêgîr dibê".(7)

Belê Gerard Genette wa dibîne ku "her têkistek di himbêza têkisteke dîtir de tê nivîsîn‹ ango her têkistek‹ têkisteke dîtir ligel xwe hildigire. Ev jî çemkê navtêkistayetî (intertextuality) têne meydanê. Belê têkist bi şêweyekî taybetî wutareke ne asayî ye‹ dikarê gelek nîşanan û ravekirinan bi xwe re rahêjê‹ ku ev jî bihayekî hunerî û cuwankarî dirust dike‹ her ev e jî têkist ji natêkist cuda dike.

Kêşeya xwendina têkist cihekî gewre di rêbazên rexne de wergirtîye‹ bigire ji rexnesazîya nû (new criticism) li Brîtanya ta dighîjê (dighê) rêbaza bunyadgerî (qonaxa yekem û duwem: structuralism and post-structuralism)‹ ku li herdu arasteyên twêkarî (التشريحية) û hilveweşandinê (deconstruction (التفكيكية)) diyar dibê.

Di vî barî de Jacque Derrida rêberê rêrewa hilweşêngerî‹ wiha dibînê ku "her têkistek dikeve ber çendayetîya xwendin û şîkirinê de" (8) (القراءةوالتحليل). Jacque Derrida‹ ji bilî vê rêrewê‹ rêrewa gumankarîyê jî (الشكّية) bikar tîne‹ bi mebesta gumankirin li hindek têkistên klasîkî‹ her weha şikandina pîrozîya wan. Rêreweke dîtir heye‹ ku pirtir li ser destê Michael Riffaterre geş bûye‹ ew jî rêrewa hirmontîk e (ravekarî - التأويل)‹ Riffaterre karî bingeha sîmyolojî bo xwendina hirmontîkîya helbestê dane.

Dîsan têne ser ew pirsyara serekî‹ ku di rexna nû de ser hildide. Aya têkist yan xwêner birryara piroseya ravekirinê dide?.

Weke hatîye zanîn bunyadgerên qûnaxa yekem bayexekî serekî didine têkist wek bunyadeke zimanvanî û deselata têkist bi ser deselata xwêner de zalbû‹ ku çi paşbunyadgeran‹ bo nimûne‹ Roland Barthes‹ fermana kuştina nûser derdixe û pêwendîyên nivîser bi têkist re dibirre û giringiyeke gewre dide têkist‹ herweha rola xwêner di ravekirina têkist de bilind dike û dibêjê: Pêwîst e dayikbûna xwêner li encama fîdakariya nivîser werê'' ango: 'The birth of the reader must be ransomed by the death of the Author''. (9)

rêbazên bunyadgerîyê‹ yên ku têkiſt wek komek ji nîşanên zimanî didîtin‹ yên ku bi rêya jihevvekirin û levsiwarkirinê saz dibê.(2)

Bêguman tiyoriyên wêjeyî ji kevin de gelek pirsên hemecor derbarî wêje dikirin‹ reng e em wê pirsê bikin: Aya ji kîjan alî em dikarin wataya wêjeyî diyar bikin‹ ji alîyê nivîser‹ yan ji yê berhemê ve‹ yan ji yê xwêner ve? Di vê biwarê de Raman Selden rexnenivîsê Inglîzî ye‹ bo cudakirina van ruwangeyên curbecur nexşeyekî zimanvanî dadinê:(3)

nivîser	nivîsîn	xwêner

Ev nexşeya Raman Selden danîye‹ li ber nexşeya Yakubsun nivîsîye‹ ku ew jî bi şêweya jêrîn tê: (4)



Di vê gotarê de em nikarin li ser nexşeya Jakobson raweſtin‹ bo me ya baş ew e li nexşeya Raman Selden raweſtin‹ ku her ew jî sê têgehên bingehîn di rexneya Rojava de di van salên dawî de hatine meydanê‹ ku her ew jî bi vî awayî derdikevin:

nivîser	têkiſt	xwêner

Eger em li helwêſta tiyorîyên wêjeyî meyze kin‹ em ê wan bibînin ku nivîser‹ ji ruwangeya rexneya kevin a lasayî (traditional–teqlîdî) ve dibê serekanîya ravekirina wataya wêjeyî‹ lewra pêwîſtî bi biyografîya nivîser heye bo nasîna mebeſta wî di têkiſt de. Bo vê yekê Romansiyan jî biha û qîmet didane hişmendî û zimanê nivîser. Belê di seretaya sedê bîſtan de formelîſtên Rûsî (الشكلانيين الروس) ketine meydanê‹ wek tewjimeke تيار wêjeyî hêza xwe dane ser şêweya nivîsînê‹ dûr ji tiştên dîtir.

Di rexnesazîya Markisî de wiha derket‹ ku kêşeya siyaqa dîrokî û civakî wek tiştekî binçîneyî dupat dikin. Bi dû van re bunyadgerîyê serê xwe hilda‹ ku bihadarî bi şîfrê (kodê) didin‹ wek druſtkerê wateya di berhema wêjeyî de. Bunyadgerî hîç bayex nedane nivîser‹ her ew e ku têkiſt bunyadeke zimanvanî sergirtî ye‹ û ji hemî hokarên derve dûr e.

Di van salên dawî de‹ bihakî pir hate ser çemkê xwendinê û rola xwêner‹ ku pirtir giringîya xwe wergirt bi dû wan rêrewên ku li paş bunyadgerî serê xwe hildan. Tiyorîya wergirtinê derfet bo xwendevan terxan kirîye ku biçîte nav seqaya şîrovekirinê de. Vê tiyorîyê cext (tekeze) li ser rola karîger ya xwendevan dikir‹ çunkî bi dîtina vê tiyorîyê xwêner kartêkirineke mezin heye ji bo deſtnîşankirina ramana têkiſta wêjeyî.(5)

Dahênana wêjeyî li nav lêkolînên rexnesazîyê yên vê serdemê‹ bayexekî zor ſtandîye‹ ji ber giringîya wê di vedozîna xweriska têkiſt de ye‹ ku ev jî her ji seretaya peydabûna handerên babetekî û xoyetî yên dahênanê‹ û dayikbûna bîr û têriwanîna berceſtebûna wê‹ ta têkiſta wêjeyî druſt dibe.

Xwêner û Têkist di Rexnesazîya Hevçerxa Rojava de (Ewrupa) (1)

Berzo Mehmûd

xwênerê Kurd rola xwe di nirxandina têksta Kurdî de di hemî buwaran de (wêjeyî، dîrokî، zanistî، zimannasî، ..) nabîne، lewre jî nivîserên bê–armanc pênûsa xwe di tekstên xiyalbaz de tûj dikin.

Lêkolîn

Bi nerîneke bilez li gotar û axaftina rexnesazîya serdema hevçerx li Ewrupa، li ber me diyar dibe ku guhartineke mezin، ji salên şêstî ve ta niha، bi ser rêrew û pirinsîpên tiyorîya rexne de hatîye. Rêbazên dema berê çi dîrokî û çi civakî، çi derûnnasî guhdan pirtir li wan kawdan û delavên derveyî têkista wêjeyî de bû، ango têkist di pêvajoya civakî yan dîrokî yan saykolojî de dihate şîrovekirin. Lê ji salên şêstî û vir de، nemaze bi hatina bunyadgerî û paşbunyadgerî nerîneke nû di nav rêbazên rexnê de diyar bû ku cext li ser têkist bi tenê dûr ji kêşeyên nivîserê wê، û ev bû sedema diyarbûna tiyorîya wergirtina huner û xwendina têkist û kêşeya xwêner û pêwendîyên wî bi têkistê ve، ku bayexekî gelek di lêkolînên Roland Barthes û Goldman û Todorof û (dibistana Konstans) a Elmanî ku di bin navê tiyoriya wergirtinê û bersivdana xwêner (Reception Theory and Reader-Response) ku herdû rexnesazên Elmanî: Hans-Robert Jauss، û Wolfgang Iser، and the School of Konstanz، roleke giring di tiyoriya xwendinê de leyistin. Ji bilî van، rexnesazine dîtir jî beşdarî di pêşketina vê tiyoriyê de kirin. Inca ev tiyorî şoreşek bû li ser têvajoyên kevin (dervî têkist)، yên ku me berî niha anîne ziman. Xwendina têkista wêjeyî bi rêya vê tiyoriyê têgeheke nû wergirt bi awakî ku xwêner dakevê hundurê têkist de bo ku kod û şîfreyên wê ji nû vekê. Ji alîkî dî ve، tiyoriya xwendinê şoreşek bû li ser

bike. Berhemên wêjeyî û pîvanên rexnegirîyê:

Di seranserî Kurdistanê de û bi taybet li Rojava‹ babeta rexneya wêjeyî û hunerî nayê dîtin‹ ji encama ku sazîyên çavdêrîya çapkirina berheman peyda nabin û rexnevanan bi xwe hîna xwe diyar nekirine‹ heta radeyekê ev rewşa beredayî tête pejrandin‹ ji ber ku qedexeya li ser çanda Kurdî hîna berdewam e‹ lewra heta radeyekê ez dibînim ku ev rewş rewa ye û her nivîs pêwiste werin çapkirin û weşandin‹ dawî wê bIryar a xwêner be‹ lê ev rewş bi vê tevlîhevîya bê serûber wê berdewam neke‹ helbete pêwîstî bi afrandina berhemên hêja û bi pîvanên şaristanî û pisporî heye di çapkirinê de.

Ev ne tenê erke‹ belê ew stûbariyek sincî ye di ber parastina çand û wêjeya kurdî de‹ delamet dikeve ser piyê saziyên rêveberiya çand û wêjevaniyê‹ di encamê de wê nivîskarên rasteqîne û berhemdêr derkevin pêş û berhema ne di asta weşanê de be wê biçilmise û nikaribe serê xwe rake.

Ji ber ku armanca me ew e ku em karibin çandeke rewşenbîrî û zanistîyeke pijayî ji çand û wêjeya Kurdî raberî cîhana wêjevanîyê bikin.

Jêder:

1-Elqîraya û elhedase‹ Hebîb Mûsa‹ R.101.
2-Eltfkîr elneqdî inde elereb‹ Îsa Alagûp‹ Sûriya‹ R.21.
3-Delîl elnaqid eledebî‹ Mîgan Elrobilî‹ Beyrût‹R.122.

3- Berê derûnî:

Giringî bi naskirina rewşa wêjevan- hunermendan a derûnî heye‹ gelo di bin çi fişar û bandora darayî‹ civakî‹ oldarî û serdestîyê de berhema wî hatîye afrandin?.

4- Berê hevdûdanî:

Ev bere bêtir bicî ye û rasteqîne ye‹ terazûyek dirust ji xwendina berheman re çê dike û hemû kartêkirin û hokarên bi bandor li ber çavan digre û di dawî de bê sil û serlepî derbirîna xwe nîşan dide û rexê şaristanîya berheman dide pêş.

Dîyardeya zimanê rexnegerîyê:

Dibe ku rexne sê rûyên wê hebin (rexneya devkî- rexneya moralî – rexneya heyberî “ danînkî – mewdûî”). Babeta ziman û bilêvkirina devokî û rêzimanî û yan diravî be‹ her tiştê bi sawîr û samanan ve girêdayî li ber çavan têne dîtin.

Dibe ku ev pîvanên îroyîn di serdema niha de hatibin derbas kirin û bi piranî li ser du astan rawestîya be.

Yek jê pileya sivik: Ya ku hemû pêmayên wêjeyî û hunerî di nava rojname û Kovaran de digre nava xwe‹ bi têbînîyên lezok xwêner ji xwe re babetan hildibijêre.

Pileya duyem: Giranîya vê astê heye û dikare bibe hokarek ji hokarên pêşxistin û pêşvebirina çand û wêjevanîyê di seranserî civakê de.

Mercên rexnevanîyê:

Ji bo rexne û rexnedarîyê‹ pêwîstî bi hinek pirensîpan heye‹ dema ew li gel rexnevanan peyda nebe‹ tu wateya rexnê bi xwe namîne‹ di vê babtê de em dikarin çend xalan destnîşan bikin:

1- Zîrekî û ezmûngêrî : Dema berhemek wêjeyî yan hunerî bikeve ber rexnedayînê‹ pêwîstî bi rexnegirekî têgihiştî di warê wêje û hunerê de heye‹ ji ber ku rexneya wêjeyê pêwîstî bi rexnevanekî xwedan asteke berfereh ji zanîn û pîşe‹ her wisa ji hemû babetên girêdayî pîvanên rexnegeriyê re heye.

2- Hevparîya banok: Zîrekîya rexnevan di vê babetê de girîng e‹ ji ber ku rexnevanê banok dikare xwe berde nava hest û gîyanê xwedanê berhema hunerî yan wêjeyî‹ ango bi hestên xwe dikare xwe berde nava pêlpêlokê damarê nivîskar û dikare bi çavê wî bibîne û bi hestên wî re rabe û rûne‹ wê demê em dikarin bêjin ku rexnevan bûye başdarê xwedanê berhemê û bi gîyanê wî re bûye banok.

Girîng e ku rexnevan kesayeta xwe bîr û boçûnên xwe yên kesane ji bîr bike‹ ji bin bandora têkilî‹ mirovantî‹ hizrî‹ oldarî‹ rêgezî û partîyan xwe bişû‹ karibe xwe ji vîn û bivînan dûr bike‹ di encamê de wê bi hêsanî karibe biherike nava gîyanê xwedanê berhema li ber rexneyê.

3- Takekesî û xoyîtî: Ev babet jî gelek girîng e di kesayeta rexnevan de peyda bibe‹ mebesta min jê ew e ku‹ dema wêjevan xwe rexnevan bibîne‹ pêwîste kirasê wêjevanîyê ji xwe bike û kirasê rexnegirîyê wergire‹ di dema xwendina berhemeke wêjeyî de ew dikare pîvanên bi hişmend û bi ezmûna xwe ya wêjeyî hinek xalên girêdayî babtê û têkildarî rexneya berheman

destpêkirina nûjenkirinê re firsendeyeke nû li rû da û nema pêşîya wê tê rawestandin.

Armanca rexneyê:

Rexne bi xwe babetek ji babetên hunerî û wêjeyî ye‹ ji bo avakirina şaristanîyeke serdem û li darxistina şêwazekî nûjen di terzê jîyana mirovan de‹ rexne xwe dide pêş û sûdeyê ji derbirînên têvel digre‹ di encamê de ev babet sûdemend e û bandoreke wê ya erênî li tavaya jîyanê dike‹ hem di warê teyorî de ku babetên (civak‹ ekonomî‹ pîtolî‹ olî‹ siyasî‹ hunerî‹ wêjeyî û ….hwd) daye ber xwe û bi vê hişmendîyê karîye civakeke têgihiştî û şaristaneyek bedew derxîne pêş.

Piştî rûyê nûjen di rexneyê de xwe da pêş û di salên 70 ji çerxa 20an‹ têgeha rexne li ser destê rexnevan "Fredrik Gemson" hate veguherîn‹ navê globalîzmê li xwe kir‹ "armanc ew e ku çandeka cîhanî li rû bide û çandên bîyanî di nava xwe de aloze bike û dabelîn e 3" .

Bê guman ev pêngava nûjenîyê di mêjûya şaristanîyê de û veguherînên ekonomî‹ siyasî û zanistî de‹ wê çanda netewî bi bandor bibe û hişmendîya civakê di du astan de biguhere:

- Veguherîna pergala çanda gelerî‹ ji cil û berg‹ xwarin û vexwarin‹ rabûn û rûniştin.
- Veguherîna wêjeyî‹ ji ziman‹ nivîs‹ terzên hişmendîyê‹ afrênerî û pîtolîya civakê.

Dema em berê xwe bidin rexneya wêjeyî‹ wê diyar be ku hinek stûn hene û pêdivî bi pabendîya wan xalan heye‹ ev jî ji berhemên du tiştan xwe dide pêş:

1- Xwendina rasteqîne ji babetên wêje û pêşxistina alav û derfetan.

2- Derbirînên têvel ên kesa ne bi hişmendîya pijayî û hestên bîrewer.

Berên rexnedayînê

Rexne di dema niha de gelek bi beş û çilîqin‹ bi şax û baxên wê pir in û rengreng in‹ nemaze heger em berê xwe bidin rexnedarîya wêjeyî‹ wê gelek derî li ber me vebin û kêş û kaşok li rû bidin‹ em dikarin wekî mînak çend derîyên rexnegerîya wêjeyî bi van xalan destnîşan bikin.

1- Berê hunerî (şêwekarî):

Di hûnandina wêjeyê de ev babet gelek pêwîst e‹ xweşikbûn û nazbûnê dide berhema wêjeyî‹ bi alîkarîya hêmanên din re ji nû ve metnê babetê tekûz dibe û dîmenê xwe qeşeng dike‹ çi berhema ji huner û şêwekarîyê ne dagirtî be‹ dibe berhemek zuha û wekî berhemeke afrêner nayête niyasîn‹ lê dema nivîskar berê xwe bide pirbûna wêneyên sembolîk û hunerî‹ wê demê metnê berhemê bê wate dimîne û xwêner ber bi baskê xwe ve naçesipîne.

2- Berê dîrokî:

Di dema ravekirina her berhemek wêjeyî de pêwîste serdema nivîsînê û hokarên civakî û çandî li ber çavan werin dîtin‹ ango nabe em bi nerîna îroyîn li berhemên Baba Tahir yan Cizerî binerin‹ ji ber ku her berhemek di nava civaka xwe de û di serdema qunaxa xwe de jîyaye‹ bi pîvanên wê serdemê têtin helsengandin.

ji lewre wêjeya Kurdî xwe negihandîye cîhangerîyê‹ ji ber ku hişmendîya nivîskarên Kurd di warê seretayî de ma ye û derfetên pêşvebirina çand û wêjeya Kurdî bi biryara qedexeya dagirkerên Kurdistanê rûbirû ma ye.

Ji hêla din ve‹ hejmarek berferih ji wêjevanên Kurd pênaseya rexnegerîyê wekî sûcekî mezin dibînin û fişarek ber biçav ji du rûyan ve rave dikin‹ yek jê wekî pêla Modernîte bi nav dikin‹ û beşê din nola nûjenîya globalîzmê bi nav dikin.

Di asta Kurdistanê de hejmarek fedyok ji wêjevanan navê wan derdikeve pêş‹ ji lewre nebûne bersiva nûjenîya rêbazên rist û afrênerîya wêjeya hemdem‹ helbesta nûjen bûye mînakek ji rûxandina pîv û pîvanên rista têr wêne re‹ ji pergala wateya gotine derketiye û bi sembolîzmê re mijûl bûye.

Li seranserî cîhanê tenê qunaxa xwendinê bibû armanca pêşengan‹ hin bi hin ew pêşengên rexnevanîyê veguherîn û wekî pîtolvan xwe dane nasîn‹ rexnevan (Cak Dareda) yeke ji wan wiha xwe dabû nasîn‹ qonaxa xwendin û nivîsandina nûjen di hişmendîya rexneyê de derbas kiribûn û metirsîna bidawîhatina şaristanîyê bi pêla wêrekîya rasterast a nûjenîya zanistîya mirovan bi nav kirin.

Her wisa jî di vê derbarê de hejmarek ramangêrên cîhanî nola “Foko Yama- Osfeld Stenger” ne tenê amaje bi qonaxa dawîkirina şaristanîyê anîn‹lê belê ew dûrtir çûn û “pêjna dawiya dîroka mirovahîyê û bi hilweşîna şaristanîya bawer bûn1”.

Dîroka rexnegerîyê:

Bi qasî tê dîtin ku rexne ji berî zayînê bi pênc çerxan di toreya Yonanîyan de diyar bûye û bi taybet di destana Elyaza û Odîsa de‹ hin bi hin xwe berdaya nav tevaya berhemên wêjeyî û vewajrtin ketiye hemû babetên berhemdayînê.

Peyva rexne (criticism) di zimanê latînî de ji rahê zimanê Agrîkî wateya xwe digre (kiritiko)‹ ango dadwer2.

Ji vê çendê diyar dibe ku rexne tê wateya terazû û pîvan di hêla kuwalîteya nirxdar û palosbûna berhemê de.

Têgeha rexneyê di seranserî Ewropa de ber biçav e. di qunaxa îroyîn de bêhtir xwe li pêş xistîye û karîye xwe ji dûzana Aydiyoljî û mîtafîzîkîyê azad bike‹ palpêdana xwe bi ser rêgezên rasteqîne û bi bingeh ve li pêş xistîye‹ qunaxa gotin û derbirînên teyorîk derbas kirîye‹ ew jî mîna hemû beşên zanyarîya civakî û derûnî‹ bi bedewîya reng û dîmenan xemilandîye‹ ev helwesta rexnegerî ya li pêş‹ di berhemên “Rolan Part” de‹ cara pêşîn xwe dîyar kirîye û bûye pêngava qûnaxeke nuh di ezmûna afrînerîyê de.

Ev ê diyardeyê hêla ku hemî bîr û boçûn ji liv û xebata mirovan bikevin bin çavdêriyê û rexnedayînê de‹ em dikarin bêjin ku şêwazek nû hate afrandin û her tişt xiste ber kêş û pîvanê‹ çi di warê pîtolî de yan olî û ramangêrî de ‹ heta huner û şêwekarî jî kete bin mêkutê rexnegiran de.

Em dikarin bêjin ku bi pêngava

Rexneya wêjeyî

Hejmarek wêjevanên Kurd heta bi pîvanê rexneyê jî ne bawer in û rexneya li berhemên xwe napejirînin، ji lewre wêjeya Kurdî xwe negihandîye cîhangerîyê.

Melevan Resûl

Wekî peyv ji wateya cawê dezî û avdayên wî ji hev ketî der tê (rexin- rexinî) tu dikare bêje: şerwalê min rexinî ye، ango ber bi palosiyê û pertaliyê ve çû ye.

Bi wateya ku nema avdayên wî hev digrin û gewdeyê min na nixumîne.

Ji ber vê çendê babeta rexne li tevaya berhemên dest û heta şêwaz û kiryarên raman û berheman tê، bi wateya ji hev veçirîna hûrikên berheman û naskirina kêm û kêmasiyên berhema derçûyî.

Her çendî bêjeya (rexn û nirx) bi veristina tîpan wekî hev hejmarin û nêzwate ne، hevsengîyek di navbera herdu wateyan de heye، ango tişta nirxdar dikeve bin rexneyê de ji kijbûn û ginciryê temîz û şaik be، bi dîmenekî nazik û bedew diyar bibe.

Her wisa jî di zimanê Erebî de (neqid) ji wateya dirav hatiye û her wisa pêde pêde di hemû zimanan de wateyek bi nirx digre nava xwe.

Di vê derbarê de pêwîste em zanibin ku rexne wekî mijara bi navkirî di çanda Kurdî ya kevneşop de peyda nedibû، li şûna pîvana rexneyî di kultûra kurdî de، bikaranîna ziman û hunera vegotinê dihate bikaranîn، mîna kêmasîyek zimanî di ristina hevokê de dihate dîtin، her wisa jî zîrekîya bikaranîna wêneyên xweristî ji xwezaya Kurdistanê dibû mijara pêşbirkê di navbera wêjevan û hunermendan de.

Lê dema şêweyên rist û nivîsandina biyanî derbasî Kurdistanê bû، ji nû ve xwêner û berhemdêran berê xwe dan vî rengê çalak di avakirina rist û helbestan de، tevî ku hîna piranîya nivîskarên Kurd serderî vî şêweyê pîvanê di ravekirina wêjeya Kurdî de nebûne.

Hejmarek wêjevanên Kurd heta bi pîvanê rexneyê jî ne bawer in û rexneya li berhemên xwe napejirînin،

çalakîyeke mirovahî ye girêdayî gelek karvedanên mirovahî yên din e‹ lewma ji bo nêzîkatîyeke rast û durist ji wêjeyê re divê rexne xwe bi gelek zanistan têr û tije bike‹ ta ku karibe deqa wêjeyî şîrove‹ analîz bike û binirxîne.

Rêbaz û rêbaza rexneyî:

Rêbaz: Ew plana ku bi komek gavên birêkûpêk û bi armancên diyar û zelal‹ te digihîne encamên berbiçav û piştrastkirî.

Di derbarê xwendina wêjeyê de ango (Rêbaza rexneyî): Ew şopa ku rexnevan li ser dimeşe ji bo xwendin‹ têgihiştin‹ şîrovekirin‹ ravekirin û nirxandina berhema wêjeyî.

Rexne ji bo ku li ser wêjeyê bixebite komek tewrîyên wêjeyî‹ felsefî‹ rexneyî û zanistî diyar dike‹ paşê bi rêya pratîkê dixwaze bigihe encamine bi ewle.

Gelek rêbazên rexneyî hene‹ her yek ji wan dixwaze bi aweyekî cuda bigihe têgihiştinekê derbarê afirînerîya wêjeyî de û veşartîyên deqa wêjeyî derxe holê.

Her rêbazeke rexneyî bi nêrînekê nêzî wêjeyê dibe û dixwaze koşeyekê ji wêjeyê ronî bike û parçeyê veşartî û nenaskirî bibîne û ji xwîner re zelal bike.

Rêbazên rexneyî li gor lêkolîneran du alî ne:

Rêbazên derveyî deqê: Ew rexneya ku ji zanistên mirovahî sûd digire‹ ji wir berê xwe dide deqa wêjeyî ji bo şîrove û analîzekirina wê‹ lê belê tiştên derveyî deqê mîna civak‹ dîrok û kesayeta nivîskar bingeh digire û deqa wêjeyî paşguh dike.

Rêbazên hundirîn: Berê xwe didin deqê û ji deqê dest pê dikin‹ deqa wêjeyî li cem wan binyadeke bi serê xwe ye. Hêmanên pêkanîna deqê lêkolîn dikin‹ ango ziman. Lewma berê lêkolînên xwe dan zimanê deqê ji ber ew e yê ku wêjeyê ji hunerên din cuda dike‹ li vir hemû bandorîyên der-

Jêder û çavkanî:

1- Itîcahat neqdiye hedîse . Wail Berekat-Xesan El Seyyid ‹şam . 2004
2- Muhaderat fil edeb el ewropî. Husam El Xetîb şam 1982.
3- Heman jêder .
4- El mucem el wesît .komek lêkolîner.Qahîre ‹ 1972.
5- Rînêh Wêlêk . mefahîm neqdiye‹ werger:Cabir Usfûr‹Kiwêt 1978
6- Muhaderat file deb el ewropî. Husam El Xetîb şam 1982.
7- Heman jêder.
8- Rînêh Wêlêk – Ostin Warin .nezeriyet el edeb‹werger :Adil selame‹Riyad‹ 1992.

wêjeyî re.

Rexne û felsefe(7)

Peywendîya rexneyê bi felsefeyê re kevin e‹ yekemîn ê ku zagonên rexneya wêjeyî danîne fîlosofê Yûnanî /Eristo/ bû.

Eristo danerê yekem tewrîya rexneyî di dîroka wêjeya Ewropî de ye. Di pirtûka xwe ya bi navê "Hunera Helbestê" de ku di navbera salên (322-335)an de nivîsiye‹ tewrîya xwe şîrove dike.

Di pirtûka xwe de mijarên mîna jêderên helbest‹ komîdya‹ hevgarî (tracîdya) û destaneyê lêkolîn dike û bi taybetî bi awayekî berfireh li ser tracîdya radiweste û rê û rêbazên wê datîne‹ her wiha behsa avakirina karekteran(kesayet) û zimanê wê yê hunerî dike û di navbera tracîdya‹ comîdya û destaneyê de hevrûkirinê çêdike.

Di serdema nû de peywendîya rexne bi felsefê re xurtir bûye û her fîlosofekî nêrînên xwe yên estetîkî derbarê wêjeyê de pêş xistine.

Fîlosofê Elmanî /Kent/ tewrîya bedewîyê li ser bingeha teşeyê pêş xist‹ dibêje: Tişta bedew a ku keyfa te tîne bê ku tu sûd tê de hebe‹ ango ew teşeyê ji mebestê vala ye.

Gelek fîlosofên din hene ku nêrînên rexneyî derbarê wêjeyê de dan mîna (Şîler – Krotşê)‹ her wiha wêjevanên gewre xwedî nêrînên kûr di jiyan û mirovahîyê de ne‹ mîna(Dantî - Can Pol Sarter - şîler). Îcar dema rexne berhemên wan bigire dest‹ divê ramanên wan yên felsefî jî lêkolîn bike.

Rexne û derûnnasî:

Afirînerîya wêjeyî her tim cihê mijûlbûn û ramankirina ramyaran bû‹ bi şiroveyên cihêreng şîrove dikirin; carinan bi dînbûnê ve girê didan‹ carinan jî afirîner mîna mirovekî nexweş dihat dîtin‹ derûnîya wî nexweş e ji rasteqînê dûr dikeve‹ ji bo wan arezûyên ku di jiyana civakî de nikarî pêk bîne û têr bike‹ di sawîr û nîgaşê de wan arezûyan têr bike‹ lê paşê vedigere jiyana rasteqînî piştî ku derûnîya xwe gihande hevsengiyê(8).

Derûnasî yek ji zanistên nêzî wêjeyê ye û ji bo rexneyê sûdar e.

Wêje û derûnnasî her du derûnîya mirovan bingeh digirin. Wêjeyê berî derûnasîyê derûnîya mirov vekola ye û vedîtinên girîng derbarê wê de kirine.

Di vê rêzê de‹ derûnnasî dikare gelek sûdê bide rexneyê di rêya şîrovekirin û analîzkirinê re‹ ji ber derûnnasî rewşa wêjevan a derûnî di kêlîya afirandinê de dikare bide diyarkirin û bi taybetî rewşa wêjevanên ku diyarde û ramanên ciyawaz li gel wan peyda dibin mîna /Kafka/ ku rewşa wî ya derûnî bandoreke mezin û kûr li berhemdarîya wî kirîye.

Her wiha em dikarin wek mînak bêjin: Lêkolîna Ebas Eleqad a derûnî derbarê helbestvan (Ibin Elrûmî) de gelek alîkarî da ji bo têgihiştina helbestên wî ku sedema bedbînîya wî diyar kir. lêkolîna (Xirîsto Necim) jî derbarê (Nîzar Qebanî) de bêtir helbestên wî nêzî têgihiştinê kirin.

Di encamê de tê xuyakirin ku wêje

pêşkêş dikin. Ev jî rastîya cihêrengîya jêderên pêwîst ji bo rexneyê tekez dike.

Ji bo ku sînorê rexneyê diyar bibe divê têkilîya wê bi beşên zanînê yên din re bê diyarkirin.

Rexne û wêje:

Têkilîya rexneyê bi wêjeyê re xwezayî ye; ango bê wêje rexne tune ye. Her wiha wêje berî rexneyê tê der‹ lê belê ev peywendî ne yek alî ye‹ ji ber rexne bi wêjeyê bandor dibe û lê bandor dike.

Ev peywendîya rexne û wêjeyê kevin e‹ her çiqas dereng rexne bûye çalakîyeke serbixwe lê belê têkilîya wê bi berhemdarîya wêjeyê re ji kevin de hebû‹ ango çi wêjeyek hebe‹ divê xwe bispêre hinek pîvanên rexneyî.

Mînaka wê ji wêjeya Erebî‹ Helbestvan (Nabîxa Zubyanî) helbestvanek î navdar bû‹ bi karê rexneyê(nirixandina helbestan) radibû‹ helbestvanan helbestên xwe jê re dixwendin‹ ji bo nêrînên xwe bêje û wan binirixîne . Her wiha ji dîroka wêjeya yonanî nivîskar û şanoger(Erîstovan) û bi taybet şanoya wî ya bi navê (beq) ku di berhemeke wêjeyî de nêrînên rexneyî peya dike dema hevrûkirineke rexneyî di navbera du nivîskaran (Esxîlos û Yorbîds) de çêdike.

Ev herdu mînak pevgirêdana wêje û rexneyê tekez dikin.

Dibistanên wêjeyî yên nûjen mîna Rialîzim‹ Romantîk û sembolîzm.. hwd‹ du alîyên xwe hene: yek xuluqkarî û afrînerî ye û yê din jî pîvanên ku li ser dimeşin û xwe radigrin.

Wêjevanên gewre jî nêrînên xwe yên rexneyî yên taybet hene mîna (T.S.Êlyot‹ Matiyo Arnold‹ Kolrêc‹ Ebas el Eqad û Ibrahîm Elmazinî).

Rexneya wêjeyî û dîroka wêjeyê:

Tevî ku ev her du çalakî di nav hev de ne‹ lê her yek ji wan xwedî rêbazeke cuda ye. Dîroka wêjeyê rêbazên xwe ji dîrokê werdigire ku mijar û belgeyan ji xwe re bingeh digire.

Lê rexne bêtir girêdayî kesayeta rexnevan‹ serpêhatî‹ ronakbîrî û mezdariya wî ye.

Rexne nikare bê dîroka wêjeyê xwe piştrast bike û bigihe encamine bi ewle. Armanca dîroka wêjeyê guhdana bi nivîskaran (wêjevanan) û rêzkirina wan li gor her serdemekê yan jî li gor cureya wêjeyê ya ku tê de pispor in û vekolandina jîngeha ku tê de jiyan kirine‹ çi civakî‹ ramyarî û çi xaknîgarî be‹ paşê dîyarkirina bandora wê jîngehê di berhemên wan de û dabeşkirina serdeman li gor taybetîyên wan.

Li vir dîroka wêjeyî cêwazîya di navbera deqên wêjeyî de û nirxên hunerî di wan berheman de paşguh dike.

Bi vî awayî rexneya wêjeyî ji dîroka wêjeyê vediqete‹ ango rexne berê xwe dide deqa wêjeyî û wê li gor taybetîyên wê dinirxîne‹ xalên bedewîyê diyar dike û şêwazên deqan ji hev cuda dike.

Lewma li ser bingeha agahîyên ku dîroka wêjeyê pêşkêş dike rexne dest pê dike û ji van agahîyan sûd digre‹ ji bo nirxandineke rast û durist ji deqên

-Dema wêjeyê şîrove dike‹ ne tenê deqên serdemekê dide naskirin‹ ji wê zêdetir wêjeyê dike zanisteke mirovahî.

-Tişta di hundirê deqê de ji xwîner re derdixe ber çavan. asoyekê li dora deqê ava dike û deqa bêdeng dide axaftin.

Ev jî yek ji sedemên bingehîn ên divêtîya hebûna rexneyê ye.

Rast e rexne piştî afrandina wêjeyê der tê‹ lê wêje bê rexne jî kor e û bêdebg e‹ berê wê bi ku derê de ye ne diyar e.

Rexne huner e yan zaniest e?

Mijara lêkolênê ya rexneyê‹ wêje ye. Wêje jî beşek ji hunerê ye; ango hunera axaftin an nivîsînê ye‹ wê çaxê rexne lêkolîneke li ser hunerekê tê avakirin.

-Rexne avakirina deqekê derbarê deqeke wêjeyî de ye‹ lewma ji wêjeyê dest pê dike û lê vedigere; ango wêjeyê dinirixîne‹ kêmasî û başîyan diyar dike ji bo domandina başîyan û derbaskirina kêmasîyan. Bi vî awayî wêje pêş dikeve.

Divê qederek ji hestyarîya hunerî di rexneyê de peyda bibe‹ ji ber gelek cureyên rexneyê pêdivîya xwe bi kêrhatinên hunerî‹ şêwaz û nîgaşê heye. Belam ev tenê têrê nake‹ ji ber ku armanca rexneyê avakirina zanisteke wêjeyî ye‹ armanca rexneyê xwegihandina zanistekê derbarê wêjeyê de ye‹ an ku (avakirina tewrioyeke wêjeyî ye)(5).

Rexne ramanek‹ mezdariyek û xweşîyeke...xweşiya naskirin û vedîtina wan xalên nenas di wêjeyê de‹ ew vedêtina ku bêyî rexneyê ne gengaz e‹ lewma rexne ew ronahîya ku berhemên wêjeyê ronî dike û wan ji nû ve bi me dide naskirin.

Sînorên Rexneyê (6)
Têkilîya rexneyê bi zanist û hunerên din re.

- Rexneya wêjeyî‹ Dema berhemên wêjeyî şîrove‹ analîze û dinirxîne; Ew dibe navgîneke di navbera du çalakîyan de ye; çalakiya afirandina wêjeyî û çalakiya wegirtina wêjeyê.

Belam rexneya nuh di şîrovekirin û pêkanîna tewrîyên felsefî yên estetîk derbarê wêjeyê de roleke bingehîn û sereke dilîze‹ her wiha wêjeyê bi ereste rêgehên ramyarî yên hizir û jiyana hemdem ve girê dide.

- Rexne ji wêjeyê hêdî hêdî rizgar dibe û ber bi xweserîya xwe ve diçe‹ li hember wê têkiliya rexneyê bi şaxên zanistê yên din re zêde dibe‹ mîna derûnnasî‹ bedewnasî‹ felsefe‹ dîrok‹ civaknasî û…. hwd.

Lewma pênasekirina rexneyê di çarçoveya sînorekî de ne gengaz e‹ ji ber sînorê xwe bi gelek zanistên wêjeyî‹ mirovî û zanistên din re heye û peywira wê berfireh bûye ku cureyên wêjeyî‹ derketin û pêşketina wan digre dest‹ ango her tiştê dikeve bin sîwana (Tewrîya wêjeyî) de.

Êdî karê rexneyê ne tenê pisporên rexneyê pê radibin‹ lê belê helbestvan‹ filosof‹ dîroknas‹ derûnas û civaknasan jî destwerdana karê rexneyê kirine û nêrînên xwe derbarê wêjeyê de

nimûneyî(îdalîst) heye‹ ew bingeh e û ya rastî ye‹ em wê bi rêya zarîkirina wê ‹ ango bi rêya jiyana rasteqînî nas dikin ku hemû heyînên wê rengvedana jiyana nimûneyî ne‹ wêje jî zarîkirina jiyana rasteqînî ye‹ lewma wêje zarîkirineke di asta sêyem de ye‹ bi vî awayî kêm dimîne (1).

Eristo jî di derbarê bandora wêjeyê li temaşevanan lêkolîn kir‹ di encampê de tewrîya pakkirinê(2) (sîqalkirinê) derxist‹ ango bûyerên di hevgariyê (trajîdiya) de temaşevan beramberî hestên têvel û cêwaz mîna tirs û dilşewitînê rûbirû dihêlin‹ bi vî awayî temaşevan van hestan dijî û li cem wî têr dibin‹ tên şûştin û digihe pekkirinê.

Di serdema misilmantîyê de helwesta derbarê wêjevanan (helbestvanan) de nehat guhertin‹ dîsa helbestvan bi xapandina gel(ku aqilê gel ji rê dibin) hatin tewanbarkirin.

Tewriya exlaqî (sincî): Di wêjeyê de tê wateya ku hemû bikaranînên wêjeyê ji bo sinc‹ rawişt‹ bawerî û ayînekê bin; ango peywireke ji derveyî rastîya wêjeyê li wêjeyê bar dikin‹ tewrîya sincî bi vî awayî hemû tewrîyên Eristo ‹mebestên Dantî yên olî û bikaranîna wêjeyê ji bo xizmeta çînên kedkaran li cem rialîzman(3) ..van hemuyan dihewîne.

Tewriya teşeyî: di wêjeyê de nû ye‹ li ser destê fîlosof û bedewnasan derket.

Fîlosofê Almanî (Kent) pêşengê vê tewrîyê ye‹ dibêje: “ zagonên wêjeyî yên hundirîn di berhema wêjeyî de bi tenê bedewîya wê berhemê diyar dikin” û bedewî weha pênase kir “ew teşeyê bê mebest e”.

Piştî wî wêjevan û fîlosofê Almanî Şîller ramanên wî berdewam kirin û diyar kir ku armanca berhema hunerî bedewî ye.

Rexne û giringîya Rexneyê:

Peyva rexne di zimanê Kurdî de bi wateya peyva (criticism) bi kar tê. Ev peyv di bingeha xwe de (Girekî)ye‹ wateya wê şirovekirin‹ gengeşekirina tiştekî‹ diyardeyekê‹ karekî‹ tewriyekê‹ pirtûkekê yan jî berhemeke hunerî ye.

Di zimanê Erebî de peyva (neqid) (4)tê bikaranîn‹ di warê bikaranîn û pevguherîna diravî de tê wateya derxistina pûleyên rastîn ji yên sexte‹ her wiha bi wateya eşkerkirina kêmasiyên kesekî tê bikaranîn.

Rexneya wêjeyî: Wêje digre dest û lêkolîn dike‹ bi armanca şirovekirin‹ analîzkirin û nirxandina deqa wêjeyî.

Ev her sê çalakî ango (şîrovekirin‹ analîzekirin‹ nirxandin) armancên sereke û bingehîn ên rexneyê ne.

Di encamê de em dikarin rexneya wêjeyê wiha pênase bikin:

Ew çalakîya ku piştî afrandina berhema wêjeyî dest pê dike‹ bi armaca daxuyakirina başî û kêmasîyên wê‹ ravekirin û şîrovekirin‹ analîzkirin‹ vekolandin û nirxandina berhema wêjeyî.

Girîngîya Rexneyê:

-Dema em li peywira rexneyê binêrin û her sê çalakiyên wê raçav bikin tê xuyakirin çawa rexne pireke di navbera wêje û xwînerê wêjeyê de. Mebestên deqê eşkere dike‹ wateyên kûr derdixe û ji xwîner re pêşkêş dike.

Dergehek ji bo rexneya wêjeyî

Rast e rexne piştî afrandina wêjeyê der tê، lê wêje bê rexne jî kor e û bêdebg e، berê wê bi ku derê de ye ne diyar e.

Menhel Xelef

Berî ku em rexneyê binasin divê em zanibin ku Mijara lêkolîna rexneya wêjeyî Berhema wêjeyî ye‹ lewma axaftina li ser rexneyê me dikişîne axaftina ser wêjeyê bi xwe‹ ji ber ku diyarkirin û naskirina berhema wêjeyî‹ armanca wê‹ nirxên tê de û cureyên wê ..hwd‹ ev karê rexnê bi xwe ye .

Wêje ew berhema ku ezmûn û serpêhatiyên mirovahiyê vedibêje‹ bi şêwazekî bedew û lihevhatî tê hûnandin‹ azwerîya mirovahîyê bo her tiştê pak‹ çak‹ baş û tekûz di nimîne. Çawa ku bedena mirov pêwistîya xwe bi xwarin‹ vexwarin‹ raketin û vehesînê heye ..giyanê mirov jî pêwistîya wî bi têrkirinê heye‹ ew jî bi rêya huner û wêjeyê pêk tê‹ ango em dikarin weha bêjin: Bi rêya wêjeyê mirov dibe mirov‹ ne tenê laşekî ku pêdivîya wî bi têrkirineke madî heye‹ lê belê giyanekî ku jiyanê nas dike serpêhatîyên nifşê mirovahîyê dixwîne‹ bi wan bandor dibe û çavên wî li ser hemû tiştên bedew û xweşik di jiyanê de vedibin.

Lêkolînên di tewrîya wêjeyê de dixebitin ‹ ji demên kevin de du pirsên bingehîn dane pêş :

1-wêje çi ye ?

2- peywira wêjeyê çi ye ?

Ev her du pirs gelekî kevin in ji dema yonaniyan ve tên kirin û heta îro bûne bingeha cêwazîyên di navbera şepêlên wêjeyî de .

Fîlosofên yonanî derbarê peywira wêjeyê de xebitîn û rola wê di civakê de dan diyarkirin . Ev jî rêgeha exlaqî sincî li cem wan nîşan dide ‹ Plato derbarê peywira wêjevanan di bajarê xwe de pirsî û di encamê de ew ji bajarê xwe qewitandin‹ ji ber ku li gorî wî helbestvan ne berpirsyarê gotinên xwe ye ji aliyekî ve û ji aliyê din ve wêje li cem Plato zarîkirineke di payeya sêyemîn de ye; li gorî Plato jiyana

de derdikeve pêşîya me‹ di têkilîyên sîyasî‹ çandî‹ cîvakî‹ hunerî û edebî de jî her wekî xwe ye. Îro gelek pirtûk‹ kovar‹ rojname û tora çapemenîya cîvakî‹ ji mînakên taybetmendîya me li jor anî ziman tije ye.

Rexne‹ kêmasî‹ neyînî û şaşitîya xebatên edebî zelal dike. lê belê‹ ne karê rexneyê ye ku kêmasîyan temam bike‹ bejna berhemekê‹ nîvîskarekê/nîvîskarekî yan jî hunermendan bilind bike yan jî rê ji wan re nîşan bide.

Rexne li gor ferhengê tê wateya "sinarîn‹ ji hev derxistin‹ hûrnêrîn û dahûrandinê" û rexne di xwe de çi wateyeke neyînî nahewîne. Her çiqas rexne pir caran di peyam û nirxandina xwe de encamên neyînî raber bike jî‹ lê di rastîyê de armanca rexneyê her dem pêşvebirin û guncawkirin e. Ji ber ku armanca rexnegir a sereke mijar an jî berhemekê bi dorfirehî li ber çavan girtin û destnîşankirina çewtî‹ şaşî û kêmasiyan e‹ da ku berhem an jî mijar baştir bê fêhmkirin û di dawîyê de ev xebat an jî berhem wateya ku ji xwe re kirîye armanc werbigre.

Erka rexnegir ya sereke jî ji xwe ev e. Mijar an jî xebata ku daye ber xwe ji gelek alîyan ve dinirxîne‹ taybetmendîyên ku tê de pêwîst-nepêwîst‹ bihêz an jî lawaz in derdixe pêş û bi vî hawî jî‹ rê li ber vedike ku him mijar-berhem baştir bê fêhmkirin û him jî xwendevan baş tê bigihin.

Rexnegir di heman demê de rênîşandêr e. Mijar an jî berhema ku li ser radiweste ber bi rastîyê ve dibe‹ di warê bawerîya gîştî de‹ wergirtina heman tahmê de rêzan û rêber e. Lewma erka rexnegirên ku li ser berhemeke hunerî yan jî hunermendan radiweştin gelek girîng û mezin e.

Di rexneyên vî warî de rexnegir him ji bo cîvakê û him jî ji bo hunermend û nîvîskaran pîştbazên mezin in‹ lewra ji hêlekê de di derbarê kêmasî û şaşîyan de rê didin ber hunermed û nîvîskaran û ji hêla din ve di warê bedewî û narînîya huner û wêjeyê de zanyarî didin cîvakê û wê agahdar dikin. Cîvakê di warê hezkirina xwendin û hunerê de agahdar dikin û di navbera hunermend-nîvîskar û cîvakê de dibin pirên gelek girîng.

Di cîhana rexnegerîya wêjeyî de mijarên herî sereke‹ rexneya li ser huner‹ hunermend û ya li ser berheman e. Lewma meriv dikare bibêje ku rexnegir jî di heman demê de hunermend e‹ ji ber ku nirxandinên wan jî dibin mijarên xwendinê ji hêla xwendevanan ve. Ji ber wê di navbera rexnegir‹ berhem û nivîskaran de girêdaneke gelek bi hêz heye.

Lê belê‹ ji nuh ve afirandina berhemekê ne karê rexnegir e‹ karê rexnegir berhema ku heye ji her alî ve nirxandin e û pê re jî ji bo xwendevanan nasandina him berhemê û him jî nivîskar e. Lewma him erk û him jî berpirsîyarîya rexnegir gelekî girîng e.

Divê rexnegir berî her tiştî ne alîgir be û di xebata xwe de gelekî zelal be. Rexnegirên ku bi pîvanên şexsî tevdigerin‹ yên pîşkar û xwedî pêşdarazî tu carî nikarin xebateke zelal û bê teref bafirînin. Ji xwe xebateke di bin sîya terefgîrî û pêşdarazî û biçûkxistinê de bê meşandin‹ dê tu caran nebe xebateke xwedî nirx û qîmeteke wêjeyî.

Rexnegerîya wêjeyê

Rexne, kêmasî, neyînî û şaşitîya xebatên edebî zelal dike. lê belê, ne karê rexneyê ye ku kêmasîyan temam bike, bejna berhemekê, nîvîskarekê/nîvîskarekî yan jî hunermendan bilind bike yan jî rê ji wan re nîşan bide.



Kadîr Çelîk

Rexnegerîya wêjeyê, nirxandinên berfireh in ku lêhûrbûn û lêkolîna pirs û pirsgirêkên wêjeyê ji xwe re dike armanc. Di xebat û tevgerîna xwe de felsefe, şayesandin (teswîr kirin) û nirxandinê weke bingêh hildigre. Rexneya felsefî di çerçoveya teoriya estetîzmê de li berhemên wêjeyî dinêre û li çawabûn û li taybetmendiyên edebî û hunerî ku berhemekê dikin "berhemeke wêjeyî" digere. Rexnegerîya wêjeyî her wiha form û taybetmendîyên wateyî jî weke pîvanên esasî li ber çavan digre û li gor wan pîvanan berheman dinirxîne.

Li Roma û Yûnana kevin, di diyalogên Platon de, meriv pêrgî dîtinên felsefî yên di derbarê seng û şayana û taybetmendîyên edebî de tê. Li gor Platon cîhana maddî ne rastîyeke, li gor wî cîhan tenê wêne û xuyaneke. Dîsa li gor Platon hunermend tenê bi cîhana hestan û îdealên xwe re mijûl dibin. Platon hunerê weke teqlîdkirina cîhanê dipejêrîne û helbestvanan jî weke kesên kopîkêş bi nav dike û bi ya wî helbestvan mirovan ji rastîyê bidûr dixin, lewma Platon di cîhana xwe ya îdeal de cih nade helbestvanan.

Dema peyva "rexne" tê ser zimanan di serê gelek mirovan de yekser wêneyên di derbarî "biçûkkirin" "biçûkxistin" "bêrumetkirin" "dujminatî-hesûdî" de dafirin. Dibe ku gelek kes rexneyê ji bo van armancên neyînî bikar tînin, lewma jî gelek kes rexneyê weke taybetmendiyeke êşandinê fêhm dikin. Û bê guman pir caran em hemî jî bûne şahid ku rexne him şaş hatiye bikar anîn û jî şaş hatiye fêhm kirin.

Em dikarin bêjin ji ber van taybetmendîyan jî gelek kes ji objektîfbûnê û ji rastgotinê direxîyane û hewl dane ku dilê kesî neşikênin, lê belê, pê re jî bejna rexnegerîyê daxistine. Ev rastî gelek caran di jîyana me ya rojane

Roja ronesansa Kurd hatîye

Li gor min Vebêja (mit) Kurdî‹ çîrokên Kurdî‹ serpêhatîyên Kurdî mijarên herî girîng ên wêjeyê ne û zindîbûna xwe jî hîna diparêzin. Ez qanehim ku‹ ji serdemên herî kevin ên dîrokê ve xwedî naverokeke wêjeyî ya bihêz in. Di roja me de jî‹ rexmî mêtîngerîya tirsnak‹ xweparastina wan û xwe domandina wan gelekî girîng e. Bi taybet klambêj‹ dengbêj û çîrokbêj dikevin mijara wêjeyê. Pirsgirêka wan a nûjenkirinê heye. Yek jî pirsgirêka wan teşekirina bi teknîkê heye. Mesela niha televîzyon gelekî girîng e. Divê em cih bidin‹ çîrokbêjan‹ helbestvanan‹ dengbêjan û klambêjan. Di Kurdan de ev yek pir bihêz e. Divê em ji bo van sazîyên lêkolînê damezrînin. Ev di wergirîya xebatên wêjeyê yên rastîn de ne. Divê em misoger nirx bidin van şêweyên klasîk.

Esas divê mirov bi nepixîna şoreşgerîya Kurd û serûbinbûna wê re girêdana vê yekê çêbike. Misoger evîna bi şêwazên kevin nabe‹ bi şêwazên kevin strîna klaman û vebêjîya çîrokan jî nabe. Divê êdî ev îfadeyên xwe yên rojane‹ bi îfadeyên klasîk ve bikin yek. Hemû netewan ev yek pêk anîye‹ divê êdî em jî wêrekîya pêkanîna vê raber bikin. Divê em naveroka wê jî nû bikin. Naveroka wê veguherîneke hewlnak dijî. Divê em şêweyê kevin ê berê jî bi vê naverokê ve bikin yek. Ev peywireke pir girîng e û li pêşîya wêjevanan ji bo serxistinê rawestîyaye. Qet hewce nake xwe ji ber bidin alî.

Divê misoger em şêweyên klasîk berdin‹ lê divê em naveroka nû jî tu caran li paş çavan nehêlin. Ger naveroka nû dil e‹ şêweyê kevin zimanê vebêjê ye. Ger mirov herduyan neke yek‹ yekgirtin nabe. Ger em bikaribin vebêjê bi naveroka nû re bikin yek‹ ez bawer im dê ev bibe ronesanseke wêjeyê jî. Hemû van tiştên me vegotin‹ esas tên wateya Ronesanseke Kurd a dereng ketî. Tevahîya Ewrûpayiyan vê yekê jîyîn. Mînak Kemalîstî jî dibêjin‹ “li Tirkîyê Ronesansa Anatoliyê.” Dereng be jî‹ em ji salên 1970’an şûn ve ev ronesans û vejîna Kurd dest pê kir. Li gor min bi şêweyeke semyan jî didome. Ji bo vê Ronesansê jî barên giran dikevin ser milên rewşenbîran. Çawa ku ev yek di rewşênbîrên Ewrupayî de gihiştîye îfadeyeke semyan‹ êdî di Kurdan de jî ev roj hatîye. Divê em vê yekê him weke şenseke mezin bibînin û him jî weke peywireke ku divê misoger were biserxistin li ser rawestin.

Banga min ew e ku‹ rewşênbîrên me tiştên vê gavê diqewimin bikaribin bi feraseteke rast binirxînin. Ez ê di bin xizmeta wan de bim. Kesê ku herî zêde ji me re dide xeberan jî di nav de‹ ez ê li hember hemûyan zimanekî medenî esas bigrim. Bila werin televîzyonê bi kar bînin‹ bila rojnameyan bi kar bînin. Herêmên ku ji alîyê gerîla ve rizgar kirine hene‹ bila werin wan deran. Bila werin gel me xweşikîyan bibînin‹ bila werin semyanîya gerîla bibînin. Herêmên rizgarkirî gelekî semyan û rewneq in‹ bila hêdî hêdî vê yekê bipejrînin. Bila herî kêm bi qandî rewşenbîrên ji neteweyên din bi

Kurdînîyê ye. Ev yek ji bo gelê Kurd a herî baş e. Mînak hindek rêberên Kurdan cilên Kurdî li ber xwe dikin‹ lê koleyên herî mezin ê dijmin in. Her dem bi Kurdî diaxivin‹ lê xizmeta ku ew ji nîjada Tirkan û faşîzma Tirk re dikin‹ Tirk bi xwe jî ji xwe re nakin. Vaye di vê derê de mesele tenê li ber kirina cilên Kurdî û axaftina peyvên Kurdî nîne. Pirsgirêk rêzdarîya ji biratîyê û mezinahîyê re ye. Rêzdarîya ku me hetanî niha ji biratîyê re raber kirîye hetanî niha tu rêberan raber nekirîye û em dixwazin vê yekê bi vî awayî jî bidomînin. Li hember Tirkan misoger ez xwe biçûk nabînim. Li hember paşe û serokên wan xwedî rêzdarîyeke mezin im. Ez şivanek im‹ gundîyekî ji rêzê me. Lê zanîna netewî ya ku min bi dirustî wergirtîye difermîne ku‹ Kurd jî miletek in‹ Kurd jî miletekî xwedî şeref in û misoger divê werin pejirandin.

Hindek serokeşîran şêwazek afirandin. Cil û bergên Kurdî li ber xwe kirin‹ bi zimanê Kurdî axivîn‹ lê mala Kurdan wêran kirin. Ev waneyeke (ders) mezin e. Divê rewşenbîrên me bi giranî li ser van mijaran rawestin. Bila tiştekî xelet nekin. Dibistanên Kurdî çêdibin‹ mirov dikare hetanî bi zanîngehan jî ava bike‹ lê ji bo vê yekê hewceyî bi demê heye‹ bi amadekarîyan heye. Ev meseleyeke zanistî ye‹ lêkolîneke zanistî hewce ye‹ derfet hewce ne. Bi qedexe yan jî bi cilan ve nabe‹ tenê bi çend peyvên sivik ên Kurdî nabe. Ev yek hatîye peyitandin. Hindek ji bo min dibêjin "çima bi Kurdî naxive?" Naxêr! Ez dikarim xebatên bi Kurdî bidim meşandin. Min di serî de jî anî ser ziman‹ min ji bo klameke Kurdî dest bi şoreşê nekir. Ev nêzîkatîyên şaş in. Bila tu kes xwe nexapîne‹ bila tu kes li ser me bi erzanî neaxive. Nirxa xebatên ku min li ser çand û zimanê Kurdî kirine gelekî mezin in. Ez van ji hev cuda dikim. Mirov çawa dikare bi çanda gel û dilê gel re be‹ dîsa mirov çawa dikare bi dijminên gel re be? Van her du xalan ez baş ji hev nasdikim û pêk tînim.

Tenê nivîskarîya bi zimanê Kurdî têr nake

Ez dixwazim li vir bala we bikşînim ser xaleke girîng. Ev yek bi qandî ku girîng e‹ her wiha xwedî nirxeke mezin e jî. Rabûna kesekî ya bi xebata nivîsandina romaneke wêjeyî û berhemeke din a bi zimanê Kurdî‹ tenê xebateke bidestgirtina karekî wêjeyî nîne. Ji ber ku kesayeta Kurd di nava zîhnîyeta serdestîyê de helîya ye. Lewra zû bi zû nakeve ser çanda Kurdî. Divê mirov misoger li hember vê bûyerê şîyar û agahdar be. Ev yek dê rê li pêşîya bêgîyanîya wêjeyê vebike. Ji lewra wê demê her xebata nivîskî ya wêjeya Kurdî ji şikil wêdetir tu tiştekî îfade nake û di hundirê xwe de jî tu wateyekê naderbirîne.

Li hember vê rastîyê tenê nivîskarîya bi zimanê Kurdî têr nake‹ gelek alîyên ku hewceyê dest girtinê peydane‹ ji derunîya civakê bigre hetanî bi rastîya rojane ya civakê hemû di hundirê vê rastîyê de peyda ne.

heman astê û di nava hevsengekê de werin meşandin. Bi demekê şûn ve jî êdî dê zimanê Kurdî yê bilind serdest be. Ji berya her tiştî ger em bikaribin di sîyaseta xwe de serxwebûnê bi dest bixin‹ dê çand jî bi yekê re bi pêş bikeve û serdest be. Divê mirov ji bo vê yekê dijminahîya zimanan neke. Ger mirov dijminahîya zimanan bike‹ nikare tu tiştî jî bi dest bixe.

Lê divê mirov bi hêz û kûr jî li ser zimanê xwe raweste. Bi qandî ku mirov ne xwedî nêzîkatîyeke weke "min bi zimanê dijmin dest pê kir hetanî dawîyê jî ez ê wisa bidomînim" be‹ her wiha divê mirov di vê mijarê de nêzîkatîyeke pir teng jî raber neke. Nêzîkatîyeke weke "ez ji zimanê xwe pê ve hînî tu zimanan nabim" jî nêzîkatîyeke pir di cihê xwe de nîne. Esas her du nêzîkatî jî yek in. Her du jî zererê didin. Divê mirov di vê derê de hevsengîyê bi dest bixe. Ez dibêjim ku lehce jî pê re‹ her kî çi dixwaze bila wisa bike‹ lê zimanekî xwedî hêz jî hewce ye. Divê mirov çend zarokan ji dibistana seretayî hetanî bi zanîngehê rêxistin bike. Eger bi vî şêwazê bi rê ve biçe ez bawer nakim ku dê tu pirsgirêk derbikevin holê. Derfet tên afirandin‹ her ku diçe qadên xebatê jî zêde dibin. Mirov dikare mamosteyan li hev bicivîne û li ser hindek plan û bernameyan bixebite. Mirov dikare xebatên ziman bi şêweyeke wergirî bi vê azîneyê bi rê ve bibe.

Di cîhanê de hatîye peyitandin ku nêzîkatîya nîjadî nêzîkatîyeke herî paşverû ye. Nîjadperestî temsîlîya paşverûtîyê dike. Tu nirxekî çand û zimanê nîjadeke paşverû nabe‹ tune ye‹ ev yek şaş e û dê hêdî hêdî ji holê rabe. Ev nêzîkatî li dij mirovahîyê ye. Rast e‹ dijmin te ji zimanê te qut dike‹ jîyana xwe û zimanê xwe li ser te serdest dike‹ wê bi te dide hezkirin û dihêle ku ji zimanê xwe nefret bikî. Di vê derê de texrîbateke mezin heye. Lê tiştekî dîtirê jî heye. Ez bêhtir hînî tirkîyê dibim‹ heta ji Serokomarê dewletê zêdetir ez hez ji taybetmendiyên tirkiyê dikim. Lê ev li pêşîya hezkarîya min a kurdîtîyê ne asteng in. Berovajiyê vê Kurdîtîya herî mezin jî min kir û dikim. Vaye ev meseleya enternasyonalîzm‹ hûmanîzm û biratîyê ye. Ger van bi hev re nemeşînî tu yê bikevî nava xeletîyeke pir mezin. Nîjadperestîyeke teng sedema mirina gelên weke Ermenî û Sûryanîyan e.

Ji alîyê din xwe nedana helandin jî xaleke gelekî girîng e. Min xwe neda helandin. Ma hun dizanin şertê min ê yekem çi bû? Min ji zaroktîya xwe û vir ve helandin da rawestandin. Ez bûm fermanberekî (memur) mezin jî‹ min zanîngeh jî qedand‹ lê ji bo ku ez xwe nedim helandinê min tenezilê jiyana serdest jî nekir. Ez naxwazim we rexne bikim‹ hînbûna ziman jî gelekî girîng e. Lê niha hun serê min jî jêbikin‹ ez nikarim hînî zimanê kesekî bibim. Gelek ziman hene; hun tevahîya Ewrûpa jî bidin min‹ ez hînî zimanê wan û jîyana wan nabim. Ez nîjadperestekî teng nîn im‹ gelekî mirovhez im‹ lê bi zimanên din nikarim biaxivim‹ hez nakim. Çi xizmetî biratîyê û yekitîyê bike ez ji wê hez dikim. Di vê mijarê de min xwe terbîye kirîye.

Bingehê biratîyê mezinkirina

pêş de bibe ziman û wêjeyeke xurt a Rojhilatanavîn. Wêjeya bi zimanê Kurdî‹ dîsa xwendina helbeşt û stranan a bi zimanê Kurdî gelekî rewneq e‹ peroş e û xweş e. Esas hewceyî bi demê û hewlên mezin heye.

Divê ji bo zimanê Kurdî cihên azad werin afrandin

Ya ez dixwazim bikim him ji bo zimanê Kurdî‹ him jî ji bo lehceyên din afrandina qadên azad e. Ger ez niha zimanê Kurdî weke zimanê fermî îlan bikim‹ dê ziman bi xwe zerarê bibîne. Sedema yekem pir kes jê fêm nakin. Ya duyem ziman hîna xwe ava nekirîye. Gelek lehce têkilhev bûne. Ev yek dê bibe sedema parçebûn û cahilîyê. Ger mirov a rast bibêje‹ her kes dikare di zemîna me afirandî de biaxive‹ heta dikare zimanê eşîreta xwe jî biaxive. Divê mirov ne li dijî vê yekê be.

Ji bo zimanê bijartî jî divê hêdî hêdî komîteyek li ser kar bike û bixebite. Niha dema vê ya rast e û derfetên vê yekê jî hatine afirandin. Divê ji bo Kurdiya bilind komîteyek were damezrandin. Kî ji ziman fêm dike‹ dikare çawaniya pêşvehatina ziman a hetanî roja îro lêkolîn bike‹ wan zanînan berhev bike û bi rêya xebateke demdirêj a vê komîteyê ve dikare zimanekî bilind a kurdî ava bike. Yanî mirov dikare Soranî‹ Dimilkî‹ Kurmancî û Goranî ava bike. Piştre jî gel dikare vê yekê weke zimanê xwe bi kar bîne. Divê sîstema ziman wisa were meşandin. Hetanî ev yek pêk were jî divê her lehçe di qada xwe de xebatê bimeşîne‹ bi wî zimanî klaman bistrê‹ axaftinan bike û çawa dixwaze dikare wisa bi kar bîne. Azadîyeke bêsînor. Em li vê derê nikarin zagonên vê yekê ava bikin. Ev tiştekî xwezayî ye. Ji bo tiştên xwezayî him dem û him jî cih hewce ye.

Mînak berê jî digotin ku “ger tu dixwazî ji bo Kurdewarîyê hindek tiştan bikî‹ divê tu destpêkê rê bidî zimanê Kurdî”. Min tu caran li pêşîya xwe nekirin asteng. Hindek ev sed salin dixwazin ji bo ziman hindek tiştan bikin‹ lê nikarine ji bo Kurdîyatiyê hindek tiştan bikin. Min bi Kurdîyeke bihêz dest bi şoreşê nekir. Min bi zimanê Tirkî dest bi şoreşê kir‹ niha jî xizmeta herî mezin ez didim. Kurditîyê wisa ez bi kûrahî û dirêjahîyê ve dimeşînim. Ji gelek lehceyên cehêwaz pir pirtûk jî çap dibin. Min bi xwe ev nekirin‹ lê min rê li ber van vekir. Min derfetên siyasal û îdeolojîk afirandin. Tu yê çend salên din bi şûn ve jî bibînî ku di Kurdîtî jî cihê xwe yê herî mezin bigre. Ya tê meşandin û ya rast jî ev e. Yên din pir baş nakin‹ pirsgirêkê gelekî teng bi dest digrin‹ ger wisa bidomînin dê bidin wendakirin.

Di nava me de tu caran pirsgirêka zimanan dê dernekeve. Dibe ku di demên pêş de li dibistanên me zimanên Tirkî û yên Erebî jî werin bikaranîn‹ divê mirov misoger ji vê yekê netirse. Lê divê mirov hêdî hêdî dibistanên Kurdî bide avakirinê. Ev hetanî demekê jî dê bi hev re werin birêvebirin. Ger Kurdî qels be‹ dê zimanên gelên cîran hetanî demekê serdest be‹ piştre dê hêdî hêdî bigihên

bi soranî binivisînin‹ ên kurmanc tê nagihên. Lewra divê mirov li ser zimanê netewî biponije. Avakirina zimanê netewî jî xebateke pêvajoyê ye.

Mînak‹ zimanê Tirkî jî di nava tevahîya dîroka komarê de encax nû digihê asta zimanekî wêjeyî. Zimanê Tirkekî Anatoliyî‹ yekî Tirkmen û Ozbek qet tênagihên. Belkî Zazayek dikare di Soranî de nêzbûnekê peyda bike‹ lê di wan de ev yek jî nîne. Bi wê wateyêye ku di nava netewên din de jî heman pirsgirêk mijara gotinê ye. Di Farsan de‹ di Ereban de ev pirsgirêk heye. Bi qandî ku Erebekî ji Suriyê nikaribe ji Erebekî Fasî fêm bike‹ pir cewaz diaxive. Divê mirov vê yekê pir sosret pêşwazî neke. Di me de mêtîngerîyê ev yek xirabtir kirîye. Ez ji xebatên zimanê netewî re dibêjim erê‹ divê di zanîngehan de ev beş werin vekirin.

Bêguman divê di televîzyonan de bi giranî li ser vê mijarê were rawestîn. Dîsa divê mirov hêdî hêdî di dibistanên seretayî de derbasî perwerdeya bi zimanê Kurdî bibe. Lê wexta ku ev yek pêk neyê jî divê em xwe perîşan raber nekin. Dîroka me wisa bû. Îro Hindistan jî‹ pir zêde nikare bi zimanê Hindî biaxive‹ zêdetirî wan bi İngîlizî xeber didin. Cezayirî herî zêde karê xwe bi zimanê Fransî pêk tînin. Lê ji bo zimanê Kurdî bibe zimanekî netewî û ji bo ku em bikaribin ji zarokan hetanî mezinan di nava herkesî de bidin rûniştin‹ bikin zimanê rojane‹ em ê bi sebr û rik xebatên xwe bidomînin. Lewra divê mirov di vê çerçoveyê de nêzî pirsgirêka ziman a demê bibe.

Ger pêkan be‹ divê mirov hêdî hêdî bi zimanê Kurdî berheman biafrîne. Ya mijara gotinê‹ ne tenê karên nivîskarîyê ye. Mesela mirov dikare bi zimanekî Kurdî yê pak û zelal filmên sînema û rêze filman bikişîne‹ amade bike‹ dîsa belgewar dikarin werin amadekirin. Lê ji bo zimanê netewî û wêjeya netewî hîna gelek kar li pêşîya me hene. Ji ber ku ev yek wisa pêk nayê jî‹ divê em bi xwe‹ xwe vê pirsgirêkê pir mezin nekin û nekevin nava nîqaşên pir çors û sexte. Divê nîqaş di vê çerçoveyê de bin.

Divê xebatên zimanê netewî çawa çêbibin? Ger di vê mijarê de Kurdên şareza hebin‹ bila hetanî dawîyê pê re mijûl bibin. Divê em bigihînin sazîbûnê‹ divê em dibistanên Kurdî veikin‹ pêwîste nîqaş bi van alîyan de bin. Lê divê em nekevin nîqaşên seranser ên weke ka em ê bi Tirkî binivisînin an jî bi Kurdî. Li hember hev pêşxistina hindek tawanbarîyan jî ez xeter dibînim û ev nêzîkatî ne di cih de ne. Niha ez bi zimanê Tirkî bi navê Kurdan çalakîya herî mezin didim meşandin. Vê çalakîyê zimanê Kurdî jî bihêztir kir‹ gîyana Kurdî jî gelekî mezintir kir. Ji bo gelekî bikaranîna zimanekî din‹ bi qandî qonaxeke girîng ber bi şoreşê ve jî birîye. Ez dikarim gelek mînakan jî bidim.

Lewra pêşnexistina nîqaşên rûser pir girîng e. Em dikarin tirkî jî weke çekekê li dij şêwaza tunekirinê a dijmin bi kar bînin. Perwerdeyên ku îro em bi Tirkî dikin‹ pir erjeng milîtanên me didin şerkirin. Lê ev yek têr nake‹ bedewî û xwezatîya Kurdîya me jî heye. Ez bawer im ku‹ dê di dema

Zimanê Kurdî tevkujîyekê dijî

Ger naveroka nû dil e، şêweyê kevin zimanê vebêjê ye. Ger mirov herduyan neke yek، yekgirtin nabe. Ger em bikaribin vebêjê bi naveroka nû re bikin yek، ez bawer im dê ev bibe ronesanseke wêjeyê jî.



Abdullah Ocalan

Bêguman pirsgirêka ziman، pirsgirêkeke giran a nîqaşê ye. Kesên ku dibêjin، "divê wêje bi tevahî bi zimanê Kurdî be" hene; hin jî dibêjin، "girîng nîne، bi her zimanî dibe" hene. Ya min hindekî rêya navîn esas digre. Li gor min dê wêjeya Kurdî demeke dirêj bi zimanê serdeştan ve were meşandin. Bi qandî ku rizgarî pêk were، dê hêdî hêdî zimanê Kurdî bikeve dewrê û çalak pêk were. Em çiqas vê yekê nexwazin jî، êdî ev yek rasteqîneke pêkhatina avedanîya mêtîngerîya heyî ye. Ev rasteqîneke objektîf e. Ger em bixwazin jî em nikarin bi tu awayên din tevbigerin. Hînî nivîsandina bi zimanê Tirkî، Erebî û Farisî bûne. Weke din tu mijarên wan nînin. Lê ne pêkane ku mirov hema li ser wan "nivîsandina Kurdî" bisepîne. Ji ber ku di asta karîna nivîsandinê de nînin. Lewra، zimanê Kurdî jî hîna negihiştîye zimanê wejêyeke bihêz.

Ez eşkere bibêjim; nivîskarekî herî jîr ê di zimanê Kurdî de şareza، çiqas li xwe bide zorê jî، çiqas bikaribe binivisîne jî، nikare zêde xwendevanan peyda bike. Ji ber ku zimanê Kurdî bi xwe tevkujiyekê dijî. Zimanê Kurdî bi xwe negihandine zimanê wêjeyeke bihêz، zemîneke wî ya netewî nehatîye pêşxistin، nehatîye pejirandin. Ji sedî pêncî zêdetir bi zimanê netewa serdest diaxivin. Ev rasteqîniyeke. Kurdî bi xwe hîna negihiştîye rewşa zimanekî netewî، ev jî rasteqînek e. Ger em bi lehceya kurmancî binivisînin، ên soran û zaza tênagihên، ger em

Pêşekî

Çima rexneya wêjeyî?

Desteya sernivîskariyê

Xwînerên hêja û delal

Kovara Şermola bi hejmara xwe ya sêyemîn pêşberî we ye‹ kovara Şermola ya ku dixweze û hewil dide roleke baş di pêşveçûna ziman‹ çand û wêjeya Kurdî de bilîze‹ her wiha ji alîyê naverokê ve jî dixwaze mijarên nû û dewlemend bi we re par ve bike.

Wekî hûn dizanin kovara Şermola di her hejmarekê de‹ dosyayekê amade dike‹ mijara dosyaya me ya vê hejmarê jî di derbarê rexneya wêjeyî de ye. Sedemên bijartina vê mijarê jî ev in: Ji ber ku rexneya wêjeyî stûnekî bingehîn û sereke ye‹ her wisa roleke mezin di pêşxistina wêjeyê de dilîze‹ lê heta niha hîn rexneya wêjeyî ya Kurdî ngihîştîye asteke berz‹ xebata di vî warî de tê kirin jî hîna qels û lawaz e‹ hewlidanên tên kirin pir kêm û şermok in. Wekî din jî kêmasîyên di rexneya wêjeya Kurdî de ne‹ ji ber ku ta niha rexneyeke rasteqîn di wêjeya Kurdî de derneketîye holê‹ xebata heyî jî di milê têgeh û norman de gelek kêm û kurtîyan digre nava xwe‹ her wiha ji alîyê zanistî ve jî pir kêm e‹ lê tevî vê jî çi kesê ku dixwaze û hewil dide di vî warî de pêşxistinekê çêbike rêzdarî û spasîyên xwe jê re pêşkêş dikin. Lewma me xwest di vê hejmarê de(heger kêm be jî) em balê bikşînin ser mijara rexneya wêjeyî û girîngîya wê. Ji bo ku wêjeye Kurdî bi pêş bikeve û bighêje asta wêjeya gelên din‹ pêwîstî bi vê zanistê heye. Bêguman pêdivî bi kar û xebateke mezin jî heye‹ ev erk jî dikve ser milê rexnegir û kesên ku di warê wêjeyê de dixebitin.

Xwînerên hêja..

Her wekî hejmarên borî di vê hejmarê de jî‹ gelek mijarên wêjeyî‹ kultûrî û çandî yên bijare hene‹ bi hêvîya xwendineke xweş û bisûd.

Desteya sernivîskarîya kovarê‹ çi kesê ku bi nivîs û berhemên xwe beşdarî vê hejmarê bû‹ spas dike.

Kovara şermola wê her li gor derfet û îmkanên heyî ji bo pêşvebirina ziman‹ wêje‹ çand û kultûra Kurdî di xizmetê de be.

Heta hejmareke din her di nava xêr û xweşîyê de bin.

• Pirtûkên derketî.. (Desteya sernivîskariyê) 47

• werger .....
• Baz.. (Zekeriya Tamir‹Wergera ji Erebî: Aram Hesen) 51
• Dîroka Nexweşîyekê.. (Mîxayîl Jvanêtskîy‹Wergera ji rûsî: Şalîko bêkes)....53
• Du Zarok..(Cibran Xelîl Cibran‹Wergera ji zimanê Erebî: Evdo Şêxo)..... 56

• Huner .....
• Wêje Koka Hunerê Ye.. (Delîl Mîrsaz) 58

• Çîrok .....
• Sêwîyê Heftêsalî.. (Merwan Berekat) 61

• Helbest .....
• Ji Jina Kurd re.. (Boniye Cegerxwîn) 65
• Pêxwas bûn.. (Nûh Silêman) 66
• Banga Rojava.. (Ednan Dogan) 67
• Der dibe bi xwînê.. (Evdilrehman Çadircî) 69
• Destê Êvarê.. (Nezehat Dogan) 71
• Welato.. (Nayîf çolo) 72
• Simbilên Rojava.. (Kerem Yûsiv) 73

• Serbest .....
• Hawar Hawara Mîr Celadet Alî Bedirxan Ji Kezebê Bû.. (Konê Reş)... 76
• Miletê xwe binase .. (Salihê Heydo) 79
• Gundê Bîr-Reş.. (Şerîf Mihemed - Welîd Bekir) 82
• EW KÎ NE? .. (Ednan Hesen)....85
• Însan!! .. (Fatma Sîdo) 87

Naveroka Hejmarê

• **Pêşekî** .....
- Çima rexneya wêjeyî?... (Deśteya sernivîskariyê) 4

• **Analîzên hizrî** .....
- Zimanê Kurdî tevkujîyekê dijî ... (Abdullah Ocalan) 5

• **Dosyaya hejmarê** .....
- Rexnegerîya wêjeyê.. (Kadîr Çelîk)..... 11
- Dergehek ji bo rexneya wêjeyî.. (Menhel Xelef) 13
- Rexneya wêjeyî.. (Melevan Resûl) 19

.

• **Lêkolîn** .....
- Xwêner û Têkiśt di Rexnesazîya Hevçerxa Rojava de (Ewrupa)... (Berzo Mehmûd) 24

• **Hevpeyvîna hejmarê** .....
- li gel zimanzan û lêkolîner Dildar Şeko ye (Aram Hesen) 32

• **Jin û çand** .....
- Jina hozan û Şoreş .. (Evîn Hesen) 38
- Jin û Folklor .. (Sîlva Elî) 41

• **Pirtûkên derketî** .....
- Romana Mehmed Uzun “Ronî mîna evînê، tarî mîna mirinê”..(Ciwanê Dêrikê) 43

ŞERMOLA

شـــرمولا

-Kovareke Wêjeyî‹ Çandî‹ Werzane û serbixwe ye‹ bi zimanên Kurdî û Erebî li Bakur û rojhilatê sûriyê tê weşandin.
-Di 24 Êlûna 2018›an hatîye damezrandin û Hejmara yekemîn di roja 7›ê Sibata 2019›an de derket.
-Kovarê rêdana xwe Ji Encûmena Bilind a Ragihandinê ya Rêveberiya Xweserîya Demoqratîk a Herêma Cizîrê girtîye‹ li gor belgeya NO 3 a ku di dîroka 29.1.2019›an Hatiye Dayîn.

Rêgezên weşanê

-Kovar bi dilxweşî pêşwaziya hemû berhemên wêjeyî û rewşenbîrî dike.
-Hemû berhemên ku digihêjin kovarê; di nirxandina desteya nivîskariyê re derbas dibin.
-Derbarê berhemên ku têne weşandin; nayê wateya ku ev berhem nêrîn û polîtîkayên kovarê derbirîn dikin.
-Pêwîst e ku hemû lêkolînên ji kovarê re tên şandin‹ ji aliyê zanistî ve bi belge bin‹ ku qasa gotarê di navbera 700 ta 1.200 peyvan de be û ya lêkolînê di navbera 2.500 ta 3.000 peyv de be.
-Ji bo jêgirtinên ji jêderan; pêwîst e bi vî awayî werin belgekirin:
Navê nivîskar-navê pirtûkê-navê wergêr‹ eger pirtûk wergerandî be-cih û dîroka çapkirinê. Ji bo dezgehên ragihandinê ku weşaneke wê weke çavkanî û belge hatibe bikaranîn bi vî awayî tê rêzkirin: Navê nivîskar-serenavê berhema hatiye weşandin-navê dezgeha ragihandirê (rojname‹ kovar‹ malpera elektironîk) - hejmara weşanê (ya rojname û kovaran) - dîroka weşanê.
-Berhemên ku tên şandin ji bo kovarê heger desteya nivîskariyê bibîne ku ev berhem ji aliyê wêjeyî û çandî ve bênirx e‹ berê hatiye weşandin‹ ji dezgehine din re yên ragihandinê hatiye şandin‹ ji derveyî rêgezên giştî yên civakê be yan jî devavêtin ji ol û gelan re hebe; kovar lêborînê dixwaze derbarê weşana van berheman de.

Rêveber û Sernivîskarê giştî:
Dilşad Murad

Sernivîskarî û sererastkirina beşê Kurdî:
Aram Hesen

Derhêner:
Dîlan Ehmed

Arşîv:
Şêrîn Heso

Desteya sernivîskariyê:

Aram Hesen
Ehmed Alyûsiv
Xebat Findî
Zozan mihemed

-Malpera kovarê:
www.shermola.net
-E-MAIL:
shermola2018@gmail.com
-Telefon û whatsapp:
0998149668

-Kovar li çapxaneya Sîmav – qamişlo tê çapkirin.
-Belavkirin û firotin li bakur û rojhilatê surî beşgeha Alşemal – qamişlo 0998234958.
-Pirtûkxaneya Amara ya navendî (Qamişlo‹ Bazara navendî) 0937812709.
- Nirxê kovarê (100 L.S).

Baxçeyê Xwendinê Li bajarê Qamişlo –Wêne Îsa Ferhan

ŞERMOLA

شـــــرمولا

Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane ye Hejmar: 3 Havîna 2019

Dosyaya hejmarê

Rexneya wêjeyî



Tabloya Qapê: Ehmed Iko

Hevpîvîna hejmarê ligel zimanzan û lêkolîner Dildar şeko ye

Xwêner û Têkst di Rexnesazî ya Hevçerxa Rojava de -Ewrupa

Wêje Koka Hunerê Ye